K.T
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YÎLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSA BILIND

# KOVARGERIYA ZAROKAN LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ
# (MINAK:KEPIR)

Nadhim Saleh Hussein HUSSEIN
14950001073

ŞÊWIRMEND:

Dr. Nesîm SÖNMEZ

VAN – 2018

T.C.

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

YÜKSEK LİSANSTEZİ

# KUZEY IRAK’TA ÇOCUK GAZETECILĞI

# (ÖRNEK- KEPIR)

NADHIM SALIH HUSSEIN HUSSEIN

14950001073

DANIŞMAN

Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN-2018

## KURTE

Ev vekolîne bi navê (Kovargeriya Zarokan Li Başûrê Kurdistanê (Minak:Kepir) )e. babetekê gelekê giringe çunkî yê gêrêdaye bi hunerkê jêhatî û bihave ku rojnamevanîy, dîsan çunkî peywendî bi zaroyanve heye ku paşeroja miletane û rojnamevanîya zaroyan jî êk ji wan core rêkane yên di hêne bi karînan ji bo perwerdekirin û avakirina zaroyan ji alîyê: (Leşî, Hzirî, Civakî, Rewşitîû...).

Lewa di vê vekolînêde bizav hatîye kirin rojnamevanîya zaroyan û pêkhate û giringîya wê bi deyne dîyarkirin.

Vekolîyina me ji berahîyek û sê pişkan û giringtirîn encamên vekolênê pêkhatîye û bi vî rengî:

Beşa Êkê: Rojnamevanîya zaroyan têde hatîye pênasekirin û ji alîyê mêjûyîve beḧsê derkevtina wê li cîhanê û derdorên kurdistanê û li kurdistanê bi xwe hatîye beḧskirin, di gel giringîya wê di bwarê perwerdeyî û rewşenbîrîde û armanc û mebestên wê.

Beşa Dwê: Corên rojnamevanîya zaroyan ji alîyê roxsar û naverokêve hatîye beḧskirin, herwesa heşt ji hunerên rojnamevanîya zaroyan di gel taybetmendîyên wî corê rojnamevanîyê û hinek ji arîşeyên wan hatîne xweyakirin.

Beşa Sêyê: Ji alîyê piraktîkîve kovara Kepir ku êk ji kovarên zaroyane li dihukê derdikevt ji alîyê roxsar û naverokêve hatîye şilovekirin û li dawîyê encamên vekolînê jî hatîne dîyarkirin.

**Peyvên Serekî:** Rojnamevaniya zaroyan, Roxsar, Naverok,Honerên rojnamevanî, Derhênana Honarî.

# ÖZET

Bu araştırma:( Kuzey Irak'ta Çocuk Gazetecilği (Örnek- Kepir)) Bu çok önemli bir konudur, çünkü gazetecilik büyük bir hüner ve çalışkanlık gerektirir. Hele ki çocuklarla alakalı ise önemi daha da artar. Çünkü çocuklar bir milletin geleceğidir. Gazetecilik çocukları bedensel, düşünce, toplumsal, davranış gibi yönlerden eğitmek ve yetiştirmek için kullanılabilecek önemli yollardan birisidir. Dolayısıyla bu araştırmada çocuk gazete ve dergilerinde yer alan konuların ortaya çıkarılması amaçlanmıştır.

Araştırmamızda, incelemeler neticesinde öncelikle üç önemli bölüm şu şekilde saptanmıştır:

Birinci Bölüm: Çocuk gazeteciliğinin, Dünya'da, Kürdistan çevresinde ve Kürdistan'da çıkarılmaya başlama tarihi , tarihsel gelişimi anlatılmış ve eğitim ve kültürel açılardan önem ve amacından bahsedilmiştir.

İkinci Bölüm: Şekil ve içerik bakımından çocuk gazete ve dergilerinin çeşitlerinden bahsedilmiş, yine çocuk gazete ve dergilerinin sekiz özelliğinden anlatılmış ve bazı sıkıntıları ortaya konmuştur.

Üçüncü Bölüm: Kepir dergisi ve Duhok'ta çıkarılan çocuk dergileri şekil ve içerik bakımından değerlendirilmiş ve araştırma bir sonuca bağlanmıştır.



**Anahtar Kelimeler:** Çocuk Gazeteciliği, Içerik, Şekil, Gazetecilik sanatı, Aditör

## ABSTRACT

This research is about : (Child Journalism In North Kurdistan (sample: Kepir)) This is very crucial topic because journalism requires dexterity and hard-working. Even more, if it is about children, the importance increases because children are the future of a nation. Press is an important means to educate children's minds and develop a sound base for their behaviors. It even helps them with their corporal development and integration to the society. All these considered, it is aimed to investigate these topics in the newspapers and magazines for children.

In our study, the three important topics were determined as follows:

Chapter one: the dates were investigated when the press for children started to develop in the World, around Kurdistan and in Kurdistan itself. The history of this kind of press was mentioned and the importance and the aim was illuminated as far as the aspects of culture and education were concerned.

Chapter two: The types of children's newspapers and magazines are mentioned in terms of form and content. Eight features of children's newspapers and magazines were described and some problems were revealed.

Chapter three: The Kepir magazine and the children's magazines published in Duhok have been evaluated in terms of form and content and the research has been concluded.


**Key words**: Children's Press, From, Content, Arts of the Press, Direkting the Press

## NAVEROK

KURTE..........................................................................................

ÖZET..........................................................................................

ABSTRACT..........................................................................................

NAVEROK..........................................................................................

KURTEBÊJE..........................................................................................

PÊŞGOTIN.......................................................................................... 1

BEŞA ÊKEM:

1 .TÊGEHA ROJNAMEVANIYA ZAROYAN.................................... 4

2. MÊJWA PEYDABÛNA ROJNAMEVANIYA ZAROYAN.............. 7

2.1. Cîhanî.......................................................................................... 8

2.2. Herêmî ( Derdoran) ............................................................. 11

2.3. Kurdistanê.......................................................................... 15

2.3.1.Rojnamevaniya Zaroyan Berî Serhildanê..................16

2.3.2. Rojnamevaniya Zaroyan Piçtî Serhildanê................19

2.3.2.1. Bajêrê Silêmaniyê ...............................................20

2.3.2.2. Bajêrê Duhokê ..................................................... 21

2.3.2.3. Bajêrê Kerkukê û Dervey Wilatî ............................... 21

2.3.2.4. Bajêrê Hewlêrê........................................................ 22

3. Giringiya Rojnamevaniya Zaroyiyan....................................... 25

3.1.Di Bwarê Perwerdêde ………………………………………………… 25
3.2.Di Bwarê Rewşenbîriya Gşitîde ………………………………….. 31
4. Taybetmendiyên Rojnamevaniya Zaroyan ……………………… 35
5. Armancên Rojnamevaniya Zaroyan ………………………………… 38
BEŞA DWEM:
1. CORÊN ROJNAMEVANIYA ZAROYAN ........................ 41
1.1. Ji Aliyê Roxsar û Şêwazîve: …………………………………... 41
1.2.Ji Aliyê Naverokêve: ……………………………...…………….. 43
2. HONERÊ ROJNAMEVANIYA ZAROYAN……………………………… 48
2.1. Çîrok ……………………………...……………………………….. 48
2.2. Gotar ……………………………...………………………………. 54
2.3. Berîkane ……………………………...……………………………. 56
2.4. Helbest ……………………………...……………………………. 56
2.5. Dan û Standinên Rojnamevanî …………………………………. 60
2.6. Alugorî Di Gel Xwandevanan…………………………………… 62
2.7. Wêne û Resim ……………………………...……………………… 64
2.8. Duvçûna Rojnamevanî …………………………………………….. 65
3. Asteng û Aloziyên Rojnamevaniya Zaroyan …………………….. 66
4. DERHÊNANA HONERÎ DI ROJNAMEVANIYA ZAROYANDE .. 67
TÊGEH û PÊNASEYA DRHÊNANA HONERÎ ............................. 68
ARMANC Û MEBESTÊN DERHÊNANA HONERÎ.......... 69
BINEMA Û ŞENGISTEYÊN DRHÊNANA HONERÎ ................ 70

BEŞA SËYEM:

1.KOVARA KEPIR DI ÇEND PIRSEKANDE .........................72
1.1.Boçî Kovara Kepir? ……………………………………………………. 72
1.2.Daneniyasîna Kovara kepr ……………………………………………. 73
1.3.Armanc û Felsefeya Derkevtina Kovara Kepr………………… 75
1.4.Girift û Aloziyê Kovara Kepir ………………………………………… 78
2. GIRINGIYA KOVARA KEPIR JI ALIYÊ………………………………… 80
2.1. Netewiy …………………………..……………………………….. 80
2.2.Perwerdeyî û Fêrkirinê ………………………………………………. 82
2.3.Rewşenbîriya Gşitîve …………………………………..……………. 84
3. HUNERÊN ROJNAMEVANÎYÊN KOVARA KEPIR ……………….. 87
3.1. Goter ……………………………..…………………………………… 87
3.2. Helbest u Sirod ……………………………..…………………….. 91
3.3. Dîdar û Dan û Standin ………………………………………………. 93
3.4. Alogurî digel Xwandevanan ……………………………………… 94
3.5. Berîkane û Pêşbazî …………………………….………………. 98
3.6. Çîrok ……………………………..………………………………….. 100
3.7. Pêkenîn û Mujulahiyên Keprê …………………….…………… 103
ÇEND KOVAREKÊN ZAROYAN LI KURDISTANÊ.......... 103-108
ENCAM ……………………………..…………………………............ 109
LÎSTA JÊDERAN ........................................................ 111- 118

KURTEBÊJE

B : Berg

Ç : Çap

J : Jimar

S : Sehîfe

Ko : Kovar

Ro: Rojname

R : Rûpel

Wer : Werger

Tr: Terceme

ÇP : Çapxane

Z:ZINCÎRE

## Pêşgotin

Bikarînana peyvê pişkeka serekiye ji jiyana mirovayetiyê, û bi rêka peyvê mirov dikarît rastiya xwe bo xwe û bo kesên dîtir jî bidete naskirin, bi şêweyekê karîger û ektîv xwe di gel civakê biguncînît û bîr û rayên xwe di gel wan alogur biket û bi vê çendê giringiya zimanî bo zaroyan jî diyar dibît. Her zimane cîhanê bi şêweyekê rêkxistî û lêkdayî bo zaroyan didete naskirin, belê giringiya vî zimanî li wî demî pitir diyar dibit dema bi hinek şêweyên hunerî û edebîyên ciwan û karîger û balkêş bo zaroyan dihête nîşandan mîna hunerên cuda yên Rojnamevaniya Zaroyan her ji: Çîrok,

Helbest, Wêne, Werziş, Wêneyê Karîkaturî, Tirane û gelekên din). Eve hemî ji bo hindê ku bikarîn bi şêwekê zanistî zaroyên xwe avabikeyn.

Giringiya vê vekolînê di wê çendê daye ku bizaveke ji hinek bizavên din yên kêm ku li herêma kurdistanê hatîne havêtin, jibo hindê ku Edeb û Hunerê Rojnamevaniya Zaroyan li Herêma kurdistanê jî wekî welatên din li jêr hinek binema û pirensîbên zanistî û bisporî derbikevît û zaroyên kurdistanê bikarin bi durstî mifayî jê werbigrin. Çunkî ya diyare Rojnamevaniya Zaroyan kartêkirneka rastewxo li perwerde û rewşenbîrî û fêrkirin û avakirina wan ya leşî û netewayetî û hemî layenî diket, lewa eger me bivêt zaroyên xwe durst û saxlem avabikeyin divêt giringiyê bi şêwaz û rêk û hunerên perwerdekirina wan jî bideyn ku Rojnamevaniya Zaroyan jî êk ji giringtirîn wan rêkane. Dîsan me hezkiriye pişkdariyê di dewlemendkirna pertûkxaneya kurdîde bikeyn bi taybetî di vî bwarê giringde.

Her ji navê vekolînê diyare (kovargeriya Zarokan li başûrê Kurdistanê (Kepir:Mînak) )sinûrên wê başûrê kurdistanêye û wekî piraktîkî bajêrê Duhokê bi tanê hatiye diyarkirin

Kêmî û nebûna çavkaniyên kurdî liser vî babetî, çunkî babetê Rojnamevaniya Zaroyan gelekê kevin nîne di mêjûya edebiyatên kurdîde. Dîsan bi zehmet dest kevtina wan kovarên zaroyan evên derkevtîn û piştî hingî rawestyayn.

Di pişka êkê ya vekolînêde me rêbaza mêjûyî bikarînaye, çunkî babetê wê pişkê pitir bi mêjûya Rojnamevaniyêve girêdayî bû, belê di pişka duwê û sêyêda rêbaza wesfî û şîkarî hatiye bikarînan .

Vekolîna me ji sê pişkên serekî pêkhatiye:

Pişka Êkê: Têgehê Rojnamevaniya Zaroyan bi şêweyekê giştî di tewerê êkêde hatiye nivîsîn. Di tewerê dwêda mêjûa peydabûna wê li cîhanê û derdurên herêma kurdistanê û li kurdistanê bi xwe jî hatiye behiskirin. Dîsan di heman pişkde û di tewerekê dîtirda armanc û mebestên rojnamevaniya zaroyan û taybetmendiyên wan hatîne berçavkirin. Di vê pişkêde ew kovarên zaroyan evên li Kurdistanê derkevtîn me dabeşkirîne liser wan kovarên berî serhildana sala 1991 derkevtîn û yên piştî serhildanê derkevtîn.

Pişka Dwê: Tewerê êkê yê vê pişkê me taybet kiriye bi corên Rojnamevaniya Zaroyan û liser Roxsar û Naverokê hatîne dabeşkirin û bi hûrî hatîne şilovekirin. Di tewerê dwêda giringtirîn hunerên Rojnamevaniya Zaroyan hatîne şilovekirin û her corek ji wan bi çend nimûneyekan hatiye diyarkirin. Di tewerê sêyêde Taybetmendiyên Rojnamevaniya Zaroyan û diyartirîn giriftên wê û derhênana hunerî ya rojnamevaniya zaroyan di çend xalekanda hatîne diyarkirin.

Pişka Sêyê: Di vê pişkêde me kovara Kepir ji aliyê piraktîkîve wek mînak ji Rojnamevaniya Zaroyan wergirtiye eva li piştî serhildana sala 1991 derkevtî, ku êk ji wan kovaran bû yên li parêzgeha Duhokê rolekê berçav hey. Armanc û mebestên vê kovarê û giringiya wê hatîne diyarkirn û ji aliyê roxsar û naverokêve bi hûrî hatiye şilovekirin digel diyartirîn giriftên wê.

Li dawiya vekolînê diyartirîn encamên vekolînê di çend sere dêrekande hatîne nîşandan.

Ji bo berhvkirna vê tezk sipasiya xwe arastey mamosta û serok beş û şêwirmendê xwe Doçentê alîkar Nesim SÖNMEZ dikem jibo wan şîretên giring yên pêşkêşî min kirîn. Dîsan sipasiya mamosta (D.r Muhsin Arif) serokê beşa Zimanê Kurdi li Kulîja Edebiyatan li Zankoya Duhokê ji bo alikariya wî ya berdewam bo min. Herwiha sipasiya mamostayê Zankoya Duhokê ( Remezan Hecî QADIR) ji bo alîkariya wi bo min di beware

teknîkîde. Dîsan sipasiya mamosta (Salim Elî BADÎ) û mamosta ( Heyam Salih) dikem ji bo berdestkirna cavkaniyan bo teza min. Sipasiya malbata xwe ya hêja (Babê xwe, Hevjîn û zaroyên xwe) dikem ku herdem piştevan û alîkarên min bûyne.

Nadhim Saleh Hussein HUSSEIN
Van- 2018

**BEŞA YEKEM**:

## 1 .TÊGEHA ROJNAMEVANIYA ZAROYAN

Pênaseyên cuda bo Rojnamevaniya Zaroyan hatîne nivîsîn, lê her nivîserekî pênaseyek dayê û ji rûyekîve daye naskirin, lewa hebûna pênaseyeka êkgirtî û êkane geleka bi zehmete hebît û jîwarê kirdarî yê Rojnamevaniya Zaroyan baştirîn belgeye liser vê çendê, çunkî piştî karê Rojnamevanî geşekrî û vekolîn û xwandinên zêdetir liser hatîne kirin têgehê

Rojnamevaniya Zaroyan jî rehendên nû û taze bi xweve girtin, û her vê çendê jî wekriye ku têgeh û pênaseka diyarkirî bo Rojnamevaniya Zaroyan nebît.[1]

Ew pêkolên hatîne kirin jibo pênaseya rojnameya zaroyan wesa diyarkiriye ku ji çavkaniyên pêzanînane bo zaroyan bi taybet li qunaxên berahiyê yên jiyê wan, yan wesa daye diyarkirin ku rojnamevaniya zaroyan rêkeke ji bo zaroyî ku derbirînê ji xwe biket, û alaveke ji bo diyarkirina ewan hez û şiyanên li dev zaroyan heyn, anku bi rengekê dîtir bêjîn di van pênaseyanda hinek ji taybetmendî û saxletên Rojnamevaniya Zaroyan hatîne behskirin. Herwesa cihê amajepêkirinêye ev pênaseyên hatîne berçavkirin diyardiken ku Rojnamevaniya Zaroyan herdû roxsarên pertûk û kovaran bi xweve di girin, yan bêjîn Rojnamevaniya Zaroyan naverok û kûratiya Pertûkan û roxisar û şêweyê derkevtina kovaran bi xweve girtiye.[2]

Rojnamevaniya zaroyan: (Ew Rojnamevaniye eva bi şêweyekê taybet û li pey qunaxên jiyê zaroyan ji aliyê meznanve bo zaroyan hatiye nivîsîn, û di bit zaro bi xwe jî pişikdariyê di nivîsina hinek goşeyên wêde biken.)[3]

Her çende bi rêjeyeka kêm ji zaroyan pişikdariyê di derêxistina Rojnamevaniya Zaroyande diken, lê dê her mînît ku ev corê rojnamevaniyê ji aliyê mezinanve derbiçît, çunkî mebest pê ewe mezin hinek binema û hizr û armancên perwerdeyî û fêrkirin û neteweyî bi gehîne wan zaroyan û bikene parçek ji kesatiya wan.

Dîsan (DR. 'Ebidltewab Yûsif) Rojnamevaniya Zaroyan bi vî rengî pênase diket û di bêjît: ( Ew rojnamevaniye eva dihête arastekirin bo zaroyan, û ji layê mezinanve dihête berhevkirin û nivîsîn jibo

---

1 - Şu'eyb xebaşî, Sehafetul-Etfal fîl Wetenul 'Erebî, ÇP. Al'alem El'Erebî, Al-Qahîre, 2002., S 29. 2 - Mêrvet Kamil Eterabîşî, Medxel Îla Sehafetul-Etfal, Ç.1, Darul-Fikr El-'Erebî, qahîre, Misir 2003, S 37.
3- Malpera: Masress.com,27-11-2011.

rewşenbîrkirina zaroyan. Ev corê ojnamevaniyê berbelavtire ji Rojnamevaniya Qutabxaneyan.)[4]

Ji bilî Rojnamevaniya Zaroyan ya giştî hinek corên dîtir jî yên Rojnamevaniyê hene û her taybetin bi zaroyanve, lê wekî rojnamevaniya giştî ya zaroyan gelek di berbelav nînin, mîna Rojnamevaniya Qutabixaneyan, Rojnamevaniya Zaroyan ya Tirane û Pêkenînan û Rojnamevaniya Zaroyan ya Werzişî. Egerê vê jî bo hindê vedgerît ku ev corê rojnamevaniyê babetên heme cor ji bo zaroyan belavediket mîna: (Pêzanîn, Tirane û Pêkenîn Wêne û Çîrok û Helbest û Berîkane û Deng û Bas û Werziş) û gelek suhbetên dîtir yên dilê zaroyan xweş diken.[5]

Nivîser (Heme Salih Ferhadî) bivî şêweyê kurt pênaseya kovarên zaroyan - kovar bixwe jî di çîte di bin perdeya rojnamevaniya zaroyandae diket :( Komele babetêkî heme corî taybet be mindalane be zincîre le kat û şiwênî diyarkirawda derdeçêt.)[6]

(Semer Ruhî Feysel) ji layê xweve pênaseyeka dîtir di detê û di bêjît: ( Ew Rojname û Kovarin yên mezin serperiştiya wan diken û bi rêjeyên cuda cuda zaro pişikdariyê têde diken, alavekê perwerdeyiye û timamkerê rolê qutabixanêye.)[7]

(Usame 'Ebidlrehîm) pênaseya rojnamevaniya zaroyan di ket û di bêjît: (Ew kiriyara civakiye eva radibît bi belavkirina pêzanînên şilovekrî û bihayên

---

4 -Ebdulrezzaq 'Elî Hîtî, Essehafel Mutexesîse, Dar Usame Lîneşir Wetewzî'a, 'Uman, Urdin,2011,S.119.
5 -Hadî Nu'man Hîtî, Edebul Etfal-Felsefetuhu-Finunuhu-Wesaîtuhu, ÇP.Dar Al-Huriye lîltîbae, bexda, 1977, S 233.
6 -Heme Salih Ferhadî, Le Barey Rojnamenûsî Kurdiyewe, Ç.êkê, ÇP rojhelat, Hewlêr,2011, R27.
7 -Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011, S.119.

perwerdeyî bo zaroyan bi rêka rojname û kovarên çapkirî ji bo binecihkirina hinek armancên diyarkirî.)[8]

Eger li naveroka evan hemî pênaseyên hatînekirin binêrîn çend xalek diyardibin ku ewan nivîseran dakukî lêkiriye û ji wana:

1- Ew kîne Rojnameyên Zaroyan derdêxin û çu babetan bo belave diken. 2- Ew rojname ji aliyê mezinan ve bo zaroyan di hêne arastekirin.

3- Ew rojnamevanî ya taybete bi edeb û rewşenbîriya zaroyan ve.

4- Rojnamevaniya Zaroyan li demekê diyarkirî derdikevît û pertûk û kovarê di êk qalbida kom di ket.

Ji sercemê van pênaseyan eger pênaseyeka tevgir û giştî bi deyne Rojnamevaniya Zaroyan dê bêjîn: (Rojnamevaniya Zaroyan ew rojname û kovarin yên li hinek demên diyarkirî ji aliyê texeka kesên şareza û rewşenbîrve di hêne berhevkirin û bo qunaxên cuda cuda yên jiyê zaroyî di hêne arastekirin ji bo têrkirina hinek pêdviyên perwerdeyî û pêzanîn û fêrkirinê û mijulî û hez û arezûyên zaroyan.

Li dûmahiya vî tewerî dîsan me divêt amajeyê bi xaleka giring bikeyn ew jî ewe ya li berahiyê me diyarkirî ku çu pênaseyên êkgirtî bo zaravê Rojnamevaniya Zaroyan nînin û egerê wê jî bo çend xalekan vedgerît mîna:

1- Jiber ewan qunaxan yên zaro têre derbazdibit, eve bo wan kesên derdêxin dibîte asteng ku hinek babetan bo zaroyan pêşkêş biken ku hemî li serrêkbikevin.
2- Ew kesên pênaseya Rojnamevaniya Zaroyan diken, lidov taybetmendî û hizr û bîr û boçûn û aydulojyayên xwe yên taybet pênase diken.

---

8 -Şu'eyb xebaşî, Sehafetul-Etfal fîl Wetenul'Erebî, ÇP. Al'alem El'Erebî, Qahîre, 2002., S.32.

3- Cudahiya taybetmendiya, meydana Rojnamevaniya Zaroyan ya berifehe û gelek zanist rolê xwe têde dibînin mîna: (Zanista Derûnî, Civakî, Perwerdeyî, Ragehandinê).(9)

## 2. MÊJWA PEYDABÛNA ROJNAMEVANIYA ZAROYAN

Dema behsa mêjûya Rojnamevaniya giştî yan Rojnamevaniya Zaroyan dikeyn, li her cihekî li demekê cuda peydabûye çunkî kawdanên her welat û deverekê cudane ji yên dîtir, û di bit ew delîveya siyasî yan hizrî û rewşenbîrî yan ya azadî û serbestiyê yan ya aborî eva bo wlatekî peydabûy di bit bi çu rengan bo welatek din peydanebibit. Mîna ew kawdan û rê xoşkirinên li welatekê wekî firensa peydabûyn mîna kawdanên aborî, siyasî, hizrî, pîşesazî û .... bi çu rengan li welatekê herêmî yê 'Arebî yan Farisî yan Turkî yan Kurdî peydanebûye. Her ji ber vê êkê dema behsa peydabûna Rojnamevaniya Zaroyan di van hersê tewerên me diyarkirîn dihêtekirin, dê cudahiyeka mezin ya demî di navbera wan cih û deverandE bînîn ku liser sê teweran hatîne belavkirin:-

### Cîhanî

Her wekî berî niha me amajepêkrî li welatên biyanî delîve pitir peydabûye ku ev corê rojnamevaniyê lê peydabibît, lewa dê bînîn ku li welatekê wekî Firensa bi sed yan dû sed salan berî wlatekê 'Erebî Rojnamevaniya Zaroyan derkevtiye.

Di pitiriya çavkaniyanda hatiye diyarkirin ku êkem kovara zaroyan li cîhanê derkevtî li Firensa bû di navbera salên (1747-1791) da, Kesekî bi navekê xwastî ku navê xwe kirbû (Dostê Zaroyan) kovarek her bi wî navê (

9- Mêrvet Kamil Terabîşî, Medxel Îla Sehafetul Etfal, darul Fikir El-'Erebî, Ç.1.- Misir, Qahîre, 2003, S.39

Dostê Zaroyan) derêxist. kovara navbirî şêwazekê sivik û dilveker û bi sanahî hebû, û ya dûrbû ji şêwazê (Can Cak Rosu) yê şîretkirin û rasterêkirinê.(10)

Bi rêka vê kovarê çendîn Çîrokên Zaroyan ji welatên dîtir û ji zimanên cuda cuda gehandine zaroyên Firensa, bi vê çendê ev kovare şiya hezên zaroyan ji xwandina dilxoşker têrbiket û dûr ji şîret û rasterêkirina rewiştî û fêrkirinê, ev kovare wekî vejînerekî bû ji bo bizava nivîsînê bo zaroyan.(11)

Lê di hinek çavkaniyên din de wesa hatiye berçavkirin ku Rojnamevaniya Zaroyan bo cara êkê li çerxê 19 serhildaye li Firensa li sala 1830 û xwandevanên vê kovarê bi tenê malên burciwazî bûn û evên xwe bi rewşenbîriyê diyar dikir.(12) Dîsan ji ber giraniya bihayê kovarê ya bi zehmet bû hemî kesan şiyan heban kirîba.

Li sala 1832 (Emîl Dur Cîrardan) (Rojnameya Zaroyan) derêxist û ev rojnameye ya pirî wêne bû ku ji aliyê şarezatirîn wênekêşve di hatine kêşan. Her li Firensa karwanê derkevtina rojname û kovarên taybet bi zaroyanve ya berdewam bû û heta sala 1996 hijmara wan çapemeniyên taybet bi zaroyanve derdikevtin gehişitibû 46 kovaran.(13)

Welatê dûyê ku piştî Firensa giringî daye vî corê rojnamegeriyê Emrîka bû, destpêka wê jî li sala 1896 demê nivîser (Bultîzir) ku xudanê Rojnameya (Cîhan – World) bû paşbendeka taybet bi zaroyanve derêxistî,di wî paşbendîde hijmareka wêneyên qaremaniya zaroyekê cadeyên niyoyorkê belavekrbûn.(14)

---

10 - Huda Ne'met Hemed, Wesaêt Edebul Etfal, Ko.(Edabul Ferahîdî),J(11), xizîrana 2012., S 283. 11 - Hadî Nu'man Hîtî, Edebul Etfal-Felsefetuhu- Finunuhu -Wesaîtuhu, ÇP.Dar Al-Huriye lîltîbae, bexda, 1977,S.229.

12 - Malpera: Muntedeyat Star Tims,12-1-2010.

13- Tariq Bikrî, Mucelatul Etfal We Dewruha fî Bîna EŞexsiyel Îslamiye, Nameya dikturayê, Naşirî, 2003, S.197.

14 - Muhemed 'Ebdilrezaq Îbrahîm, - Hanî Muhemed Yunis - Wehîd Elseyd hafiz, Seqafetul tifil,Ç êkê ÇP.Dar El-Fîkir,Urdin, 2004.,S.231.

Her çende berî vê rojnameyê jî hinek rojname û kovarên taybet li qutabixaneyan derdikevtin, belê babetên wan taybet bûn bi kiryara perwerde û fêrkirinê û gehandina çend pêzanînan bû ji bo xûndikaran, lewa di vî bwarîde amaje bi navê çu ji wan rojnameyan nehatiye kirin.

Lipey hinek çavkaniyan wesa diyardibit ku nêzîkiyek dinavbera mêjûya derkevtina rojnamevaniya zaroyan li Ewropa û Emrîkade heye, belku hinek çavkaniyên Emrîkî di bêjn destpêka derkevatina wê li Emirîka bû û belgeyê wan jî li ser vê gotinê ewe ku li meha êk ya sala 1789 êkem Kovara Zaroyan bi navê (Kovara Zaroyan – The Children's Magazine) û ji aliyê zelamekî bi navê (Hudisun) û hevalê wî (Curc Gud Win) hatiye derêxistin, lê ev kovare piştî sê mehan hatiye rawestandin.(15)

Belê tementirîn kovara zaroyan bi jiyê xwe ku di navbera sala (1827 – 1929) li wîlayeta (Bustin) derkevtiye kovara (The Yow Oh's Companion) bû û ji aliyê (Nasaniyal Wiliz)ve bû.

Dîsan eger carek din vegerîne ewropa û bi taybet li welatê Elmaniya dê diyarbît ku êkem kovara zaroyan derkevtibît kovara (Academia) ye, kovareka ekadîmî û fêrkirinê bû û êkem jimara wê li sala 1888 zayînî derkevtiye û heta sala 2011 jî her ya berdewam bû.

Her wesa li Elmaniya hinek kovar derkevtîne taybet bûyne bi aliyê ayînîve û armanc jê perwerdekirina zaroyên Mesîhî bû liser ayînê wan mîna kovara (ABC Zei Tung) ku êkem jimara wê li sala 1946 derkevtiye û ya arastekrî bû ji bo wan zaroyên jiyê wan di navbera (14 ta 18) saliyê de. Her li Ewrupa û bi taybet li Birîtaniya kevintirîn kovara zaroyan derkevtî kovareka ayînî bû bi navê (Look) li sala 1845 û ji bilî kovarên ayînî kovar hebûyne taybetbûyne bi veguhastina deng û basên zaroyan mîna kovara (Contirophinikt) eva li sala 1925 derkevtî li Elmaniya.(16) Duvda û li sala 1881

15 - Heman Çavkanî, S.195.

16 - Tariq Bikrî, Mucelatul Etfal we dewruha fî bîna Eşexsiyel Îslamiye, Ç.b.n, S.197-198.

kovarek dinya zaroyan bi navê (Yowng Soldier – Serbazê Biçûk) derkevt û (50) hizar dane jê di hatine belavkirin.

Li Ingiltira kevintirîn kovara zaroyan derkevtî bi navê ( Baxçeya Qutabxaneyê) bû ji aliyê xanim (brî) li sala 1915 û eve êkem kovar bû ku zaroyên Ingiltira tam û xoşiyê ji xwandina wê werbigirin ku berî hingî ji xwandina qutabixaneyê wer nedigirt.[17]

Hêjayî gotinêye ku welatên Rojhelata Naverast û bi taybet Asya ya bê behir nebû ji evî hunerê giring û bi biha, lewa ewan jî behra xwe hebûye di derêxistina rojname û kovarandE û bi taybet rojnamevaniya taybet bi zaroyanve. Çunkî bo hemiyan ya diyare ku mezntirîn imbartoriyet û şarstaniyet li kîşwerê Asya hatîne avakirin û xudanên paşmayekê dewlemendin ji hemî aliyên jiyanêve.

Ji welatên Asya me dû welat wek mînak wergirtin, welatê êkê (Hindistan)e, çunkî ya pirî ziman û aydulojiyên cuda cudaye û ji wan kovarên li wêrê derkevtîn kovara (Balivan) bû û bi zimanê hindî bi xwe li sala 1948 derkevt. Dîsan kovara (Anamdamela) bi zimanê bengalî derkevt û li sala 1967 û bi zimanê Inglîzî kovara (Barbarity) derkevtiye.[18]

Dîsan welatê dûê ji Asiya me wergirtî (Êketiya Sovêt)a berê bû ku serkêşiya welatên rojhelata navîn û bereyê suşiyalîzmî di kir, li wêrê jî rojnameyeka taybet bi zaroyên jiyê wan di navbera (10-15) saliyê bi navê (Piyunêrskaya Piravda) derdikevt û 13 melyûn dane jê dihatine belavkirin.[19]

## Herêmî ( Derdoran)

Ji berku Rojnamevaniya Zaroyan rolekê pir biha di bînît ji bo rewşenbîrkirin û pêgehandina zaroyan û avakirina kesatiya wan û ya

---

17 - Malpera: Muntedel-Î'lam Eterbewî,13-9-2011

18 - Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011, S.115 .

19 - Musedeq Tovî, Çend Berperek ji Dîroka Rojnamevaniya Kurdî, Ç.P.kulîja Şerî'ê, Duhok,1999, R.72.

harîkare ji bo rasterêkirina wan û pêşxistina hezên wan, û radibît bi peydakirina rewişt û tîtal û biha û tiştên bi rumet li dev zaroyan û pêzanînên pir biha li dev wan peydadiket û hezên wan bo xwandinê têrdiket û berê wan radikêşîte xwandinê û zimanê wan dewlemend diket, Welatên derdurên me ku pitiriya wan musilmanin ev corê rewşenbîrî û pêgehandina zaroyan pişt guhve nehavêtiye.

Çunkî pitiriya van wlatên derdurên me muslmanin û îslamê giringiyeka êkcar mezin daye avakirina zaroyan ji hemî aliyekîve û ji berku rojnamevanî jî êk ji wan rêk û alavane yên kesatiya zaroyî avadiken, lewa van welatan jî çendîn kovarên taybet bi zaroyanve derêxistîne çi kovarên giştî yên zaroyan bin yan ew bin yên li qutabixaneyan derkevtîn.

Lê digel vê êkê jî li welatên îslamî bi taybet yên 'Erebî wekî pêdivî giringî bi layê rewşenbîrî û edebî û kesatî yê zaroyî nehatiye dan û her wekî di hinek dîrase û vekolînên Neteweyên Êkgirtîde hatî ku sercemê mezaxtiyê welatên 'Erebî yê salane li ser zaroyan ji 03% derbaz nabit û eger vê hijmarê hevberbikeyn digel rêja zaroyan ji sercemê welatiyên 'Erebî 43% pêkdînît, iha li wî demî dê aşkera bît ku wekî pêdvî xem ji zaroyên 'Ereb nehatiye xwarin.[20]

Her çewa bît û derbarey hebûna Rojnamevaniya Zaroyan li welatên 'Ebereb û Islamî çu di mêjûya kevinda bît çu ya nûda welatê Misirê li serê wlatên 'Erebî û Islamî di hêt di vî bwarîda û Misrê çirayên serkêşiyê di vî bwarîda helkrîne.Êkem kovara zaroyan ya giştî û dûr ji xwandingehan li welatên 'Erebî bi navê (Sîndîbad) li sala 1952 ji aliyê (Dar Elme'arf ) ya Misirî li Qahîre derkevtiye.[21] Her çende berî vê kovarê gelek kovarên taybet l qutabixaneyan derkevtîne û mebest bi wan kovaran çandina binemayên

---

20 -Şu'eyb xebaşî, Sehafetul-Etfal fîl Wetenul 'Erebî, ÇP. Al'alem El'Erebî, Al-Qahîre, 2002., S.49. 21 - Huda Ne'met Hemed, Wesaît Edeb El-Etfal, Mecelet Edeb El-Ferahîdî, J.(11), Xizîrana 2012.

rewiştî û fêrkirinê bû li dev zaroyên qutabî û veguhastina wan deng û basên taybet bi qutabixane û mamosta û qutabiyanve.

Ji wan kovaran ku ji aliyê qutabixaneyanve li Msirê derkevtîn êkem kovar bi navê (Rewzet El-medars El-Msiriye- Baxçeya Xwandingehên Msirî) li sala 1870 li Qahîre derkevtibû û ji aliyê (Refa'e Raf' Tehtawî) serperiştiya wê di hatekirin û kurê wî ('Elî) serinvîserê wê bû. Li sala 1879 kovara (Semîr El- Sexîr) derkevt û sala duvda kovara (Enîs) derkevt, û li sala 1893 kovara (El- medrese - Xwandingeh) derkevt û bi mehekê piştî wê kovara (Tilmîz - Xûndikar) derkevt.. û li sala 1923 dezgeha (Dar Letayf) li qahîre kovar (Ewlad – Kuran) derêxist ku kovareka wênedarbû.(22)

Piştî Misrê û ji ber giringiya vî hunerî bo avakirina kesatiya zaroyan Îraqê jî dest bi derêxistina çendîn rojname û kovaran kir bo zaroyan, belê her wekî ji navê wan diyar ku ew kovarên li Îraqê derkevtîn û taybet bûn bi zaroyanve ew bûn yên li xwandingehan derkevtîn neku ji aliyê kertê taybetve bûn.

Êkem kovara zaroyan li Iraqê derkevtî li sala 1923 kovara (El-Tilmîz El- Iraqî – Xûndkarê Îraqî) û li jêr serperişitiya mamosta (Se'îd Fehîm) bû û êkem kovar bû ya taybetmend bi Edebê Zaroyan. Piştî wê bi taybet li sala 1924 kovara (El-Keşaf El-Îraqî) derkevt, û kovara (El-Tilmîz- xûndikar) li sala (1929) û kovara ( El-Telebe - Xûndikar) li sala (1932) û kovara (El Fituwe- Gencînî) li sala (1945) derkevt û gelek kovarên din yên taybet bi zaroyanve.(23)

Her ji wan kovarên zaroyan evên li Îraqê derkevtîn kovara (Dunya El- Etfal – Dunyaya Zaroyan) li sala 1945 ji aliyê (Zekî Husnî) ve derkevt bû, Kovara (Cenet El-Etfal – Beheşta Zaroyan) li sala 1960 dîsan her ji aliyê (Zekî

---

22 - Hemîd Tulist, Sehafetul Sîxar eletî yuherîruhal kîbar, Malperê Dîwan 'Ereb, 6-5-2010.
23 - Rafid Salim Serhan, Edeb Eletifal fî El-'Alem El-'Erebî- Mefhumehu- .Neşetehu- Enwa'ehu We Tetewirehu, Mecelet Elteqenî, J.6 ,sala 2013, R.26,.

Husnî)ve derkevt bû, û kovara (Sened û Hind) li 1959 û kovara (El-Cîl El- Cedîd – Berebabê Nû) li sala 1968 derkevt û kovara (Rewzet El-Etfal- Baxçeya Zaroyan) di navbera salên çilan û pênciyan li çerxê bîstê ji aliyê (Tewfîq Elî Serwet) ve derkevt. Paşî ji aliyê wezareta ragehandina Îraqêve kovara (Meceletî – Kovara Min) li sala 1969 derkevt, û kovara (El-Mîzimar) li sala 1970 derkevt û ji hemî aliyekîve (Cemal El-Îtabî) serperiştiya wê di kir.[(24)]

Ji berku rûdanên siyasî kartêkirneka êkser li kawdan û seruberê rewşenbîrî û edebî û hemî bwarên din yên jiyanê di ket, lewa karwanê rojnamevaniya zaroyan jî wekî bwarên din kevte bin kartêkirna kawdan û kêşeyên siyasî yên li Îraqê peydabûyn û bi taybet şerê Îraq û Îranê evê heşt salan vekêşayi di navbera (1980-1988)ê û şerên dîtir yên kendavî evên li salên nutan rûdayn.

Li destpêka çerxê bîstê diyardeya belavbûna Rojnamevaniya Zaroyan li welatên Erebî bi şêweyekê berfireh belavebû wekî Misir û Îraq û Lubnanê, lê beranberî vê çendê li gelek welatên dîtir yên Erebî Rojnamevaniya Zaroyan bi durstî ronahiya jiyanê nedît û eger dîtbît jî hinek tîrojkên kêm û lawazbûn û piştî salên şêstan bûn û eve jî kurtiyeke li ser hinek welatên Erebî yên amaje bi rewşa Rojnamevaniya wan nehatiyekirin û ji wana[(25)]:

1- Kovara (Usame) li sala 1969 ji aliyê (Wezareta Rewşenbîriya Suryayê) ve li Dîmeşqê derkevtiye.

2- Kovara (Se'd) li sala 1969 ji aliyê (Dar El-Reî El-'Am Lîlsehafe) ya kwêtî li kwêtê derkevtiye.

3- Kovar (Macd)li sala 1979 ji aliyê (Dezgeha Êkbûn) ya sehafê li Îmarat derkevtiye.

---

24- Cemîl Hemdawî, Edebul Etfal fîl 'Îraq, Malperê Dîwanul 'Ereb, 26/8/2009.

25- Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011, ,S.117-118.

4- Kovara (Samîr) li sala 1979 ji aliyê (Dar Ebî Zer El-Xefarî) li Lubnan derkevtiye.

5- Kovara (Bera'm El-Îman – Pişkojên Baweriyê) li sala 1980 ji aliyê (Kovara El-We'î El-Îslamî) li kwêtê derkevtiye.

6- Kovara (El-'Erebî El-Sexîr – Erebiyê Biçûk) li sala 1992 ji aliyê (Kovara El- Erebî) li kwêtê derkevtiye.

Gelek ji wan rojname û kovarên li welatên Erebî derkevtîn ji berku tûşî gelek asteng û kêmasiyan bûn, her zû rawestiyan û em dikarîn diyartirîn wan arîşeyan bi van çend xalan berçavbikeyn:

1- Gelek ji wan kesên bi derkevtina wan rojname û kovaran radibin bi çavekê bazirganî berê xo didene wî pirojey.
2- Gelek ji wan rojname û kovaran nikarîne hevrikî û milmilanê Di gel rojnamevaniya biyanî biken.
3- Ji egerê veqetiyana wan kovaran ji derkevtinê bo demekî, nikarîne girêdaneka berdewam di navbera zaroyan û kovaranda dursti biken.
4- Giraniya bihayê wan beranberî dahatê kêm yê zaroyan. 5- Kêmiya şiyanên madî û çapê û stafê karî.
6- Lawaziya sîstemê belavkirina wan kovara ku di bît gelek ji wan kovaran negehişitibine destê xwandevanan.
7- Bikarneînana zaravekê êkgirtî ku zaroyên wan hemî welatan bikarin bixûnin.[26]

## Kurdistanê

Her wekî berî nuke jî me amaje pêkirî ku herdem kawdanên siyasî çu bi başî çu bi xirabî rengvedana xwe liser rewşa Edebî û Rewşenbîrî jî diken, û herdema xweşî û aramî û tenahî û azadî li kurdistanê berqerarbûy her êkser

26-Tariq Bikirî, Mucelatul Etfal We Dewruha fî Bîna Eşexsiyel Îslamiye, nameya Dikturayê, S.207.

bwarên din yên jiyanê û bi taybetî Edebî û Rewşenbîrî û Hizrî guhorîn kevtiyê, mîna:

Hijmara ewan rojname û kovar û pertûkên li kurdistanê berî roxana rijêma diktator ya Seddamî û piştî roxana wî derdikevtin bi dûratiya Erd û Esmanan cudahî hebû, anku bizava rewşenbîrî û edebî ya piştî serhildanê gelek berfrehtir û pêşkevtîtire ji ya berî hingî. Eger tenê em bajêrê duhokê werbigirîn hijmara wan rojname û kovarên piştî serhldanê derkevtîn çend carî wan bû yên berî hingî derkevtîn, heta sala 1991 rojnameya (Bizav) bi kirmancî li duhokê derdikevt, belê piştî serhildana Buhara 1991 rojnameyên: ( Peyman, Resen, Evro, War, Çavdêr..) û ji bilî çendîn kovaran mîna :( Gazî, Peyv, Metîn, Zeng û Beng, Sivore, Şeyda û ..) derkevtin.

Bi rengekê dîtir bêjîn ku jiber kawdanên siyasî yên kurdistanê li çerxên 18 û 19 û 20 têra di borîn ku zulm û sitem û diktatoriyet bû, çu carekê ew delîve nedaye têgehişitî û şareza û zana û edîb û rewşenbîrên kurd ku bi şêweyekê kûr û berfireh hizrê di danana edebekê taybet bi texeka taybet ya miletîvh biken, belkî hindî şiyayn bi giştî xizmeta edebiyatan kiriye, her çende hinek pêngavên êkane hebûyne mîna (Nubihara Biçukan) ya (Ahmedê Xanî) ku bo zaroyên kurdan çêkirbû her wekî wî bi xwe diyarkirî û gotî:

**“Ne jibo sahîb rewacan belkî ji bo biçûkên Kirmancan”**(27)

Lewa ewa me divêt bêjîn eveye: Wekî hemî bwarên din yên Edebî û Rewşenbîrî bizava Rojnamevaniya Zaroyan jî li Kurdistanê direng serhildaye, her çende her dema delîvek peydabûye ji dest xwe nekriye lê di karîn bêjîn serhildana bizava Rojnamevaniya Zaroyan kevtiye di van heftê salên dûmahiyêde, dîsan derkevtina Rojnamevaniya Zaroyan me liser dû qunaxan dabeşkirîne:

---

27 - Nubihara Biçûkan, Ehmedê Xanî, heqeqehu we elleqe eleyhî weqeddeme lehu hemdî ebdilmecîd selefî, Ç.1, Çp Reşîd, Bexdad, 1990, R-11.

## Rojnamevaniya Zaroyan Berî Serhildanê

Berî hinek kovarên taybet bi zaroyanve derbikevin rojname û kovarên kurdî di berperên xweda berêxwedanek bo edeb û rojnamevaniya zaroyan kiriye, lê bi rengekê wesa berfireh nebû, mîna ( Rojnameyi Bangî Kurdistan le 4 Eylûlî 1922 le lapere dûda nusînêkî be nawî " Terbiyey Ewlad" ewe le layen "'Elî Kemal"ewe bilawkirdotewe, Herweha rojnameyi "Rojî Kurdistan" le 3 Şubatî 1923 da we le lapereyi 3 da be nawî " Terbiyey Tedrîsî Mindalan" ewe nûsînêkî dirêjî le layen " M-Qadrî Se'îd Zekî "yewe bilawkirdotewe, goşeyekî serbixoş be nawî" Beşî Minalan"ewe le govarî "Gelawêjd" a terxan kirabû bo mindalanî kurd.)[28]

Êkem Kovara Zaroyan ya kurdî li bajêrê Mihabadê li kurdistanê derkevtî kovara (Girûgalî Mindalanî Kurd) bû, li sala 1946 û bi tenê sê jimare jê derkevtibûn.[29]

Duroşmê kovarê xizmetkirina zaroyên kurd bû û liesr bergê wê hatibû nivîsîn: (Ew muceleye tenya bo rûnakkirdinî bîrî xwêndewaran û minalanî kurde.)[30] Her çende berî vê pêngavê jî û di navbera salên (1932-

1934) mîr celadet bedirxan di kovara (Hawar) de giringiyeka taybet di da Edebê Zaroyan û Rojnamevaniya wan û her jiber hindê di çend jimarekên wêda goşeyek bi navê (Stûna Zaroyan)[31] vekirbû û taybet kirbû bi zaroyan. (Hisên Huznî Mukiryanî) di kovara (Zarî Kurmancî) de li sala (1926- 1932, û sala (1926- 1928) (Pîremêrdî) di kovara (Jiyan)de gelek hozan û çîrokên taybet bi zaroyanve belavkirîne, lê wekî rojnameyek yan kovareka serbixwe nebû, belkî kovara (Girûgalî Mindalanî Kurd) di bîte derazînka

---

28 -Ehmed Seyîd'Elî Berizincî, Edebî Mindalan Le govarî Gelawêjda, Raman j.17, Dezgay Roşnbîrî û rageyandinî Gulan, Hewlêr, 1997, R.8-9.

29 -Heme Salih Ferhadî, le Barey Rojnamenûsî Kurdiyewe, ÇP.Rojhelat (Hewlêr),2011, R28. 30-Îdrîs Ebdulla, Girûgalî Minalanî kurd, Pêşenge Kovarî Dinyay Rojnamegerî Mindalan, Govarî

Rojnamenûs, j.11-12, Hewlêr 2003, R.346.

31-Îsma'îl Îbrahîm Se'îd, Edebî Rojnamenûsî Kurdî, Bexda 1970-1974, R.622-623.

Rojnamevaniya Zaroyan li kurdistanê her wekî diktor (Hîmdadî Hisên) dibêjît: (Govarî "Girûgallî Mindalanî Kurd" le mêjûy Rojnamenûsî Kurdîde, em govare yekemîn govarî Kurdiye bo mindalan terxankirawe...dekrê lêrewe derk be stiratîjî rageyandinî komarî dîmukratî kurdistan û siyasetî dûrbînaney ewan bikeyn.)[32]

Li meha Şubata 1946 êkem jimara kovara (Girûgalî Minalanî Kurd) derkevtiye û ji 13 berperan pêkhat bû, Jjmara dûê li meha Adarê derkevt û her 13 berperbûn û jimara sêyê li meha Nisanê derkevt û 14 berperbûn û ew dawî jimare bû. Qebareyê wê (21* 12sm) bû û rêveberê îdara wê (Qadrî Muderisî) bû li çapxana (Kurdistan) ji aliyê (Bîrî Kargeranî Çapxaney Kurdistan) derdikevt.[33]

Hijmara sêyê ji vê kovarê ji 14 berperan pêkdihat, Nîva binî ya bergî bi wênekê serkirdê kurd (Selahedidînê Eyubî) hatibû xemilandin û ev nîv malka helbestê li er hatibû nivîsîn:

**“ Tu Nemrudî ey Selaheddînê eyûbî neseb**

**her bijî fexrî qewmî kurd û sultanî 'ereb”**

Di wê jimarêde van nivîseran pişikdarî di nivîsîna babetên wêde kiriye ( Sedîq Bekrî, Wrdî, Mihemed Azerî, Mudersî, Hisên Feqh Zade) nivîserên meznin, belê babet bo zaroyan arastekrîne. Babetê wê yê berperê êkê û nîva berperê dûê jî ji aliyê (Sedîq Bekir)îve hatibû nivîsîn bi navê ( Hubu El- Weten mîn El-Îman).

Di perperê wê yê (6-7)êde babetekê Cugrafî hatiye belavkirin bi şêweyê pirsyar û bersvane di navbera mamosta û şagrdeyanda û bi

---

32 - Heme Kerîm Hewramî, Edebî Mindalanî Kurd diway raperîn – lêkolînewe - nirxandin- Mîkanîzimekan, Hewlêr, Ç.P.Dezgayi Aras,B.2,2007,R.244-245.

33 - Îdrîs Ebdulla, Girûgalî Minalanî kurd,Pêşenge kovarî Dinyay rojnamegerî mindalan,R.349- 350.

şêwazekê sivik û bi sanahî bo zaroyan hatiye nvîsîn.[34] Zimanê wê (Şewezarê Mukiryani) bû û bi rênivîsa Erebî bû.[35] Giringtirîn babetên vê kovarê pêkdihat ji: Çîrok (6), Gotar(12), Helbest(8), Ziman (3), Roşinbîrî Giştî(3), Agehdarî(2), Bo Zaxawî Mêşik(5) babet bûn:

Egerê rawestana vê kovarê jî egerekê siyasî bû, çunkî her lisala 1946 desthelata Îranî Komara Kurdistan li Mihabadê ji navbir, lewa bizava rewşenbîrî û edebî jî kevte di tarîstaniyekêda û kovara zaroyan jî rawesta.

Herwesa hêjayî gotinêye ku demê siyasî û desthelatdarên kurd li komara kurdistan giringiya bihayê zaroyan ji bo paşeroja kurdistanê zanî her êkser hizir di rêk û şêwazên avakirin û geşekirina wan ya rewiştî û hizirî û perwerdeyî û neteweyîda jî kir, lewa li 22-1-1946 komara kurdistan hate ragehandin û li meha duvda kovare navbirî derêxist.[36]

Li 'îraqê jî (Le Maysî salî 1972 da yekem jimareyi Kovarî (Estêre) de rçû, belam ewîş dîsanewe hersê jimarey lê derçû, diwatir hel û mercî siyasî Kurdistanî Îraq le destçû, şer destî pêkirdewe, paş eweş biwar bo, karî rojnamegerî Kurdî be giştî û, Rojnamegerî Mindalanî Kurd be taybetî le her parçeyekî Kurdistan rexsaw nebûe, bûye ta Azarî "1991" ke gelî kurdî Kurdistanî Îraq azadî xoy be dest hêna. Înca helî zêrîn bo mindalanî Kurd wedî hat û deyan govar û rojname rûnakiyan bînî.)[37]

Ew rojname û kovarên piştî kovara (Girugalî Mindalanî Kurd) derkevtîn û heta sala 1991 em di karîn bi vî rengî aşkera bikeyn[38]:

1- Estêre, li bexda li 1972 derkevt û 3 jimare jê derkevtîne. 2- Estêre, li çiyayî derkevt û bi tenê 2 jimare jê derkvtîne.

---

34 - Musedeq Tuvî, Çend Berperek ji Dîroka Rojnamevaniya Kurdî, Ç.P.şerî'ê, Duhok,1999,R.74- 75.
35- Refîq Salih Ehmed, , Raberî Rojnamenûsî Kurdî, Ko.Rojnamenûs, J.11-12, Hewlêr 2003, R,119. 36 - Musedeq Tuvî, çend berperek ji dîroka Rojnamevaniya Kurdî, Çavkaniya berê, R.73-74.
37 - Îdrîs 'Ebdula Mistefa, rojnamegerî mindalan be zimanî kurdî,Ç.1, Çp. Roşinbîrî,Hewlêr,2004, R.8-9.
38 - Heme Salih Ferhadî, Le Barey Rojnamenûsî Kurdiyewe, R.28-29.

3- Koçer, li swîd li 1988 drkevt û bi ten 2 jimare derkevtîne.

4- Karwanî Mindalan, li hewlêr li sala (1990) derkvtiye û bi tenê 2 jimare derkevtîne.

Di van xalande çend têbîniyek di hêne berçavên me û giringtirînê wan jî:

1- Pitiriya wan kovarên derkevtîn ji 3 hijmaran neborîne.
2- Navê kovara Estêre hatiye dûbarekirin, li Bexda û li çiyayî Ji derkevtiye, belê salên derkevtina wan jî cudane.
3- Hijmara wan kovaran bi hijmara tibilên destane û gelek di kêmin. 4- Li salên 50 û 60 da navê çu kovarekê berçav nakevît.
5- Pitiriya wan kovaran ewin evên bi Kirmanciya xwarê derkevtîn, anku di wan navberanda çu kovarên taybet bi zaroyanve li Duhokê û bi Kirmancî dernekevtîne.

## Rojnamevaniya Zaroyan Piştî Serhildanê

Piştî serhldana Buhara sala (1991) ê, karwanê ragehandin û rojnamevaniya kurdî bi giştî û ya zaroyan bi taybetî çû di qunaxeka tazede, dikarin bêjînê qunaxa zêrîn ya rojnamevanî û ragehandin û edebiyatan. Lê babetê me bi tenê bi rojnamevaniya zaroyanve yê girêdaye lewa dê pitir tîrojkên ronahiyê berdeyne ser vî alî.

Me pêxoşe rêzbendiya hinek ji wan rojname û kovarên zaroyan evên bi zimanê Kurdî derkevtîn li pey rêzbendiya bajêran rêzbikeyn û bi vî rengî [39]:

## Bajêrê Silêmaniyê

1- Estêre, Li sala 1992 derkevtIye û jimarek bi tenê bû.
2- Pepûple,li sala 1992 derkevtiye û heta niha berdewame, Komela Minalparêzên Kurdistanê - Sulêmanî derdêxît, Govareka heyvane ya

39 - Ko.Rojnamenûs, J.(2),Hewlêr,sala 2004.

rewşenbîrî û perwerdeyî ya zaroyane, xudana wê (Hîro Îbrahîm Ehmed)e .[40]

3- Perîstan, li sala 1992 derkevtiye,ta jimare 12 digel rojnameya (Kurdistanî Nwê) derkevtiye, û jimare (13-45) paşbenda rojnameya navbIrî bû û piştî hingî bû kovareka serbixwe ya heyvane.
4- Cigerkoşekan,li sala 1932 û heta niha ya berdewame,li berahiyê digel kovara (Peyamî Rastî) derdikevt, paşî bû paşbenda wê kovarê û li jimara 52 wekî kovareka perwerdeyî ya zaroyan ya serbixwe derkevt.[41]
5- Awat û Hîvî, Rêxrawa (MAG) ya taybet bi mînanve derdêxist, bi zarên kirmanciya xwarê û jûrî babet dinvîsîn.
6- Cirîwe, li sala 1998 derkevtiye û bi tenê çend jimarek jê derkevtîne, Wezaretî Rewşenbîrî di gel rêxrawa suşiyal dîmukrat a Mesîhî derêxistiye.
7- Tan Tan, li sala 2000 bo zaroyên jiyê wan (10-18) derdikevt.
8- Kolare, 1-1-2002 derkevtiye, Kovareka Ehliye bo zaroyên di ser (9) salyêda derdikevt.
9- Xende, li 1-2-2002 derkevtiye, Kovareka Perwerdeyî Rewşenbîrî bû, (Serdar Reza Mehemed) Sernivîserê wê bû, 16 berper bûn.[42]
10- Kenarî,kovareka Ehliy bû.
11- Nêrgiz, li 1-8-2003 dezgeha çap û belavkirina (Bedirxan) derdêxist.
12- Lane, li 2003 paşbenda kovara (Raber) bû û çend jimarek jê derkevtîne

## Bajêrê Duhokê

1- Xalxalok, li 1991 derkevtIye.

---

40 -Ko.Pepûle, J.(25), Çp.Ufêstî Dilêr, Silêmanî, çiriya duwê 1999.
41 - Ko Cigerkoşekan, J.41, silêmanî, kanûna dwê sala 1999.
42 - Ko.Xende, J.(2), Adara 2002.

2- Sivore, li 1998 derkevtIye û heta niha berdewame, li destpêkî dezgeha ragehandina Gazî derêxist, paşî çû bi ser Heftînameya Peymanve û nuke Dezgeha Xanî ya Rewşenbîrî û Ragehandinê derdêxît.

3- Zeng û Beng, li 1-9-2001 derkevtiye û heta niha ya berdewame û jimare 163 jî derkevtiye. Êkem kovara zaroyane bi merce'iyeka Îslamî li bajêrê Duhokê derdikevît, û Giringiyê didete zaroy û mafê wî û sexbêrkirin û perwerdekirina wî.(43)

4- Kepir, Tîrmeha 2003 dezgeha Spîrêz û bi harîkariya rêxrawa Diyakonya, Zêwe ya çareserkirina derûnî li Duhokê derdêxist.(44)

## Bajêrê Kerkukê û Dervey Welatî

1- Estêre, li Siwîd derkevtiye.

2- Sindîbadê Bexda,li bexda derkevtiye, babetên wê ji zimanê 'Erebî di hatine wergêran bo zimanê Kurdî.

3- Dinyayî Mindal, rojnameya (Kurdistan) ya parta Dîmukrta Kurdistana Îranê derdêxist.

4- Xalxaloke, li Elmaniya derdikevt ji aliyê (Ehmed Deştî).

5- Minalanî Bawe Gurgur, dezgeha rewşenbîrî (Şefeq) derdêxist.

## Bajêrê Hewlêrê

1- Peresêlke, li 1991 derkevtiye û heta 1995 ya berdewam bû û bi tenê 6 jimare derkevtîne.

2- Heng, li 25-3-1993 û heta niha berdewame, Wezareta Rewşenbîrî derdêxît.

3- Hêvî, li 1-9-1995, derkvtiye û 4 jimare jêderkevtîne, Rojnameya Kurdistan derdêxist.

---

43 - Ko. Zeng û Beng, J.(1)Çp Jîn, Hewlêr, îluna 2001.

44 - Beşa sêyem ji mijara tezame bi dirêjahî dê li ser Ko. kepir bît, lewa li vêrême bi kurtî behskiriye.

4- Gidîle, li 9-3-1998 Wezareta Rewşenbîrî derdêxist û 4 jimare derkevtîne. 5- Roj, komela Mindalanî Kirêkar derdêxist.

6- Nêrgiz, li 1999 Rêxrawa Mindalparêzên Kurdistanê derêxist.

7- Hêlaney Mindalan, li 19-8-2000 û heta niha berdewame, dezgeha rojnamenûsî Birayetî û Xebat derdêxist.

8- Peyamî Mindalan, li 2001 Komela Mindalparêzên Kurdistanê derdêxist.

9- Pelke Zêrîne, li 1-6-2001 ta 2011 berdwam bû, Rêxrawa Rewşenbîrî û Yasayî derdêxist.

10- Aga, li 2002 Rêxrawa (Koma) ya taybet bi (Mînan) derdêxist. 11- Zirîmok, li 1-12-2004 Senterê Rewşenbîrî Bilê derdêxist.

Eger nêrîneka pîçek hûr li ser van kovarên di van 5 cih û deverande hatîne belavkirin bikeyn dê şêyn destê xwe danîne ser hinek xalên hêz û lawaziyê yên wan kovaran, lê berahiyê dê behsê xalên hêzê keyn û dê hinek xalan berçavkeyin:

1- Hijmareka zor ya kovaran berçavdibît û hemî bajêrên Kurdistana başûr bi xweve girtîne.
2- Hinek kovar li derveyî welatî jî derkevtîne û eve jî nîşana pîtepêdanêye.
3- Kovar hebûyne mîna (Awat û Hêvî) bi herdû zarên Kirmanciya Xwarê û Jûrî babet belavkirîne.

Li her bajêrekî hinek kovar mayne ku heta nuke berdewam derdikevin û xizmeta zaroyan diken, mîna Kovara Sivore û Zeng û Beng li Duhokê û Cigerkoşekan û Hêlaneyi Minalan li Hewlêrê û Pepûle li Sulêmaniyê û Bawe Gurgur li Kerkûkê. Gelek ji wan kovarên derkevtîn ji aliyê rêxraw û senter û cihên hikumî derkevtîne dûr ji aliyên siyasî.

Her wesa çend xalekên lawaz jî berçavên mirovî dikevin û dibît hinek ji wan xalan bibûne egerê jinavçûna gelek ji wan kovarên rawestyayî û ji wan xalan:

1- Çend kovarek û bi navên cuda ji aliyê êk cihve derkevtîne, û li dawyê hemî rawestyayîne, mîna kovarên (Peyamî Minalan, Nêrgiz, Pepûle) ev her sê kovare ji aliyê rêxrawa Komela Minalparêzên Kurdistanê derkevtîne, eger kovar bi tinê derêxistiba û hemî hêz û şiyan di wêda mezaxtiban da baştirbît.
2- Pitiriya wan kovaran rawestyayne û gelek ji wan ji çar jimareyan derbaz nebûyne.
3- Gelek ji wan kovaran jiberku kêm jimare jê derkevtîne, û kesekî xwe lê nekiriye xudan, lewa her zû windabûyne û nehatiye zanîn ka çend jimare jê derkevtîne? û ka kengî derkevtîne? mîna kovarên: ( Xalxalok, Dunyay Minal, Estêre, Sindîbadê Bexda).
4- Eger hijmara kovarên zaroyan hevberbikeyn beranberî wan rojname û kovarên giştî yên li kurdistanê derdikevin dê diyarbît ku hijmara wan kovaran geleka kême.
5- Gelek xwandin û vekolîn li ser van kovaran nehatîne kirin, lewa pêzanîn jî li ser wan gelek liber destê xwandevanan nînin.

Piştî me ev pêdaçûna bilez di ser wan kovarande kirî evên li Kurdistanê û hinek ji dervey kurdistanê jî belavebûyn, bi fer dibînîn ku pîçek bi dirêjî li ser kovara (Zeng û Beng) ku li Bajêrê Duhokê heta nuke ya berdewame û bê rawestyan û veqetiyan bi merce'iyeteka Îslamî derdikevît binvîsîn:

Êkem hijmara kovar (Zeng û Beng) li Îlûna sala 2001, li parêzgeha Duhokê derkevtiye, ji (8) berperan pêkhatiye û li ser berperê êkê yê kovarê hatbû nivîsîn (Kovareka Heyvane ya Zarokane). xwedyê imtiyazê (Beyan Ehmed) û sernivîserê wê (Dîwalî Hacî) û desteka nivîsînê jî pêkhatibû ji (

Hekîm 'Ebdilrehman, Qasim Husên, Xedîce 'Ebdilxaliq, Îdrîs Xazî,Newzad 'Ebdlla). SernIvîserê kovarê (Dr.Dîwalî Hacî)(45) didete diyarkirin ku armanca kovara Zeng û Beng rewşenbîrî û perwerdeye, û pîtey di dete maf û çavdana zaroyan û sexbêrkirina wan.

Sernivîserên kovara navbirî her ji derkevtina wê û heta nuke ( Dîwalî Hacî, 'Ecîb 'Ebdulla, Îdrîs Xazî, Nêçîrvan 'Ebdulxaliq, Dilvîn 'Ebdulxaliq) bûn, ta nuke (163)(46) jimare jê derkevtîne û ji (16) berperan pêkdihêt. Qebareyê wê (29.5 .sm – 21 .sm) hemî renge.

Êkem kovara zaroyane li bajêrê Duhokê bi merce'iyeka Îslamî derbikevît û giringiyê bidete perwerdekirina zaroyan bi perwerdeka Îslamî û têgehiştineka hevçerx. Ji goşeyên berdewam yên kovara Zeng û Bengê: ( Peyva Kovarê, Baxê Baweriyê, Seredan, Saxlemî, Hunerî, Serhatî, Fulkulor, Çîrok, Baxçê Zarokan). Di (100) jimareyande Zeng û Beng şiyaye pitir ji (300) helbestên hemî cor û pitir ji (400) corên çîrokan hatîne belavkirin, sercemê wan hemî babetên di wan 100 jimareyande hatîne belavkirin nêzî (2300) babetên hemî rengin.(47) Niha Serinvîsera kovarê ( Dilvîn 'Ebdulxaliq)e û Sikirtêra nivîsînê (Şukurya Muhemed Salih)e û Desteya Nivîsînê jî ( Dêjîn Cum'e, Gulav Şevî', Emîn Muhemed, Rêjîn Emîn) peyamnêr (Hemrîn Hirorî) ye û rêveberê hunerî ( Emîr Muhemed)e. (48)

## 3. Giringiya Rojnamevaniya Zaroyiyan:

Rojnamevaniya Zaroyan rolekê karîger heye jibo avakirina kesatiya zaroy û parastin û berhevkirina wî jibo hindê ku bikarît dinav civakê xweda bi rolekê karîger û ektîv rabît, hest bi berpirsatiyê biket û serkeftyane erkê xwe binecihbiket, û bikarît xwe liber hemî asteng û nexoşiyan bigirît, lewa

---

45 - Dîdareka Taybet di gel (Dr.Diywalî Hacî) Êkem Sernivîserê Ko.Zeng û Beng li 5-6-2017. 46 - Ko.Zeng û Beng,J.(163)Çp. Hawar, Duhok,Aba 2017.

47 -Kovan Ehmed, Bîblografiya Ko.Zeng û Beng, J.(1-100), ÇP.Azadî, Duhok,2011.

48 - Dîdareka Taybet di gel (Dilvîn 'Ebdlixaliq) Serinvîsera niha ya Ko.Zeng û Beng li 15-6-2017.

geleka pêdivî bû ku dezgehên ragehandinê bi giştî û kovar bi taybetî rabibin bi avakirina kesatiya zaroyan bi taybet zaroyên welatên musulmanan. Pêdviye ew kovarên zaroyan evên li welatên musulmanan derdikevin pitir giringiyê bidene kesatiya zaroyê musulman, çunkî îslam bixwe rêk û rêbaz û peyrewekê temam yê avakirina mirovane her ji qunaxa zarokînyê heta mezinbûnê.

## Di Bwarê Perwerdêde

Berî her tiştekî pêdviye amajeyê bi xaleka gelek giring bikeyn, ew jî ewe ku pêdviye ew kesên bi derêxistin û serperiştiya rojnamevaniya zaroyan radibin kesên taybetmend û şareza bin ji gelek aliyanve mîna: Zanistê Civakî, Derûnî, Perwerdeyî, Ayînî û Rewştî û gelek bwarên dîtir, çunkî ew babetên dihêne belavkirin wekî: (Çîrok, Helbest, Gotar, Wêne û ...) mebest û armancên xo yên heyn jibo avakirina kesatiya zaroyan ji aliyên cudave. Li serdemên Îslamî ew Helbest û Çîrokên di rojnamevaniya zaroyande hatine belavkirin, di hatine bikarînan jibo perwerdekirina zaroyan, herwesa Çîrokên Ayînî evên serhatiya Qareman û Swarçakan têde wekî mînak hatîne bikarînan jibo fêrkirina zaroyan bo ayînê wan û perwerdekirina wan li ser rewişti û binemayên Îslamî û ji aliyê dîtirve bşên bo dunyaya xwe jî serhatî û serboran jê werbigirin.

Di Şarsitaniyetên kevinda Çîrok hatiye bikarînan jibo binecihkirina gelek armanc û mebestan di perwerdekirina zaroyanda û ji wan armancan: perwerdekirina ayînî, perwerdekirina rewşitî û me'rîfî. Misriyên kevin çîrokên ayînî û efsaneyî jibo perwerdekirina zaroyên xwe bikarînayine ji bo xizmetkirina hinek mebestên ayînî û rewştî. Hinek çîrok hebin li ser xudawendan û diyarkirina başî û xirabiyê û bo wan aşkera jî dikr ku hemî deman başî û xêr serdikevît.[49]

---

49 - Fethiye Hesen Silêman, Terbiyetul Tifil Beynel Mazî We-Lhazir, Dar Şiruq, El-Qahîre, 1979. S.218.

Ew perwerde û bihayên zaro bi rêka Rojnamevanya Zaroyanve bi destvedînin (komeka pîverane rihetî û tenahiyê bo pêdviyên mirovî dabîn diket, û xelk biryarê li ser wan pîveran didet ku di baş û çakin, û bizav û pêkolê diken wan pîveran pêşkêşî berebabê paşerojê jî biken, û dê li ser hindê hişyarbin ku wî berebabî li ser wan bihayan bi parêzîn. Biha û sîstemê rewiştî yê zaroyan stûneke ji stûnên rewşenbîriya zaroyan evên bi rêka civakê bo zarokî dihêne veguhastin.)[50]

Demê zaro van bihayên me amajepêkrî bi rêka xwandina Çîrok û Helbest û wan têkstên bimifa evên di wan kovarên zaroyande werdigrît, eve dê bîte egerekê harîkar bo wî ku layenê îradê di kesatiya wîda bi rengekê hevseng bi hêzbikevît û bikarît cudahiyê bêxîte di navbera ewan hezên xweristî yên lidev wî hey û ew jîwar û jîngeha ew têde dijît.[51]

Çîroka ( Kurya Gulkî)[52] ku dibêjît:

(Zelamekî kurek hebû gelekê neguhdar bû, rojekê hinarte ber garana çêla, gulkekê biçûk çû di Rûbarîde û ew kurik dovda çû heta ew jî kevêtiye di Rubarîde. Babê wî yê vî dîmenî bi çavên xo dibînît û di zanît eger şîretê li wî biket dê berovajî babê xwe ket, îna babê wî gotê: Huşyarbi kurê min bes dest neke kuriya Gulkî!! Kurkî got: Ji kerbên tede dê dest havêjmê, kurya Gulkî bi herdû destan girt. Gulik yê melevan bû, kurik digel xwe qurtalkir û bire layê dî yê Rûbarî, kurkî zanî babê wî çend hejê diket.)

Êk ji giringtirîn bihayên perwerdeyî di vê Çîroka kurtda ewe ku nivîsera çîrokê divêt bigehînîte zaroyan ewe, ne her axvtineka bab yan deyk dibêjîte zaroyê xwe mebest pê ferizkirina axivtina xweye li ser wan, nexêr!.. dibît gelek caran ew axvtinên deybaban jiyana wan zaroyan ji metirsiyan

---

50 - Hesen Şehate, Edebul Tifil Erebî – Dîrasat we Buhus, Dar Msiriye û Lubnaniye, Metbe'e El- Feniye, Qahîre, 1994, S.57.

51 - Zehra Xirnawt- Suret Etifil fîl Qîsel Qesîre Cezaîriyel Mu'asîre (1980-2010)- Nameya Masterê, 2012-2013, S.40.

52 - Leyla Hesen, Ko.Zeng û Beng, J.(138) Çp. Hawar, Duhok, Tîrmeha 2015, R.14.

rizgarbiken. Çîroka navbirî şîreta li zaroyan diket ku ew gotinên deybab di rasta zaroyên xweda dibêjin di berjewndiya wandane û mebest pê mifayeke bi gehîte wan û di paşerojêda tûşî çu nexoşiyan nebin. Zaroyan fêrî wê çendê di ket ku rik û 'înad rewiştekê ciwan û baş nîne, belku ruxsar û derûnê mirovî kirêt diket.

(Bi rêka çîrokên zaroyan mirov di şêt wêne û helwîstên rewiştkarî pêşkêşî zaroyan biket bi taybetî bi rêka wan kesan yên ku di nav çîrokêde rolekê perwerdeyî yan rewiştkarî digêrin, çunkî kesayetyên çîrokê bi şêweyekê wesa helwîst û boçûna bi berceste diken ku zaro li beranber helwîstekê dilênî werdigirît çi pêve bihête girêdan yan xo jê dûrbêxît, ev bercestekirina zaroyî ya wijdanî di gel kesayetiyên çîrokê di gehîte wê radê bi nexoşiyên wî xembar dibît û bi keyf xweşiya wî dilxweş dibît, herwesa di hinek çîrokanda biyavekî bo direxsînît ji bo derkirina arezûyên xwe yên kip kirîn.)[53]

Mîna di çîroka( Qelsiya mirovî dibîte bela Serê mirovî)[54] ku di kovara Sivure de hatiye belavkirin serhatiya dû zelaman vedigêrît:

(Êkê hejar û merd û yê dîtir yê dewlemend û qelis, herdû derdikevne nêçîrê û bi şevê di mîne şkevtekêve. Mirovê hejar xwarina wî xilas dibît û yê zengîn li pêş çavên wî xwarna xwe dixot bê ku bidete yê hejar, ji birsa yê hejar dimînîte huşyar û guh li suhbeta rûviyekî dibît digel hinek giyanewerên din ku wî guskekê tijî zêr di qulêra darekêra veşartiye. Spêdê evê hejar di çît wî kuskê zêrî bo xo dibet û pê zengîn dibît. Demê yê zengîn suhbeta wî dizanît di çîte her wê şkevtê, belê di encamda giyanewer wî dixon anku dibît egerê jinavçûna xwe.)

53 - Muhsin 'Arif Salih, Çîroka Zarokan li Devera Behdînan (1980-2004), Nameya Masterê, Kulîja Adabê, Zanîngeha Duhokê, 2007,R.139.
54 - 'Ebdî Muhemed 'Elî, Ko.Sivure, J.(30)Çp.Xanî ,Duhok, kanûna 2, sala 2001, R.3.

Di vê çîrokêde nivîserî bi şêweyekê jêhatî şiyaye rewiştekê ciwan yê perwerdeyî fêrî zaroyên me kurdan biket, ewjî harîkarî û merdiye. Çîrokinvîsî bi şêwazekê serincrakêş bo zaroyan diyarkir ka eger mirov yê merd û harîkar bît digel kesên din dê çarenivîs û encam çu bît, û eger mirov yê qelis û kesûkî bît dê çarenvîsê mirovî çu bît. Wergirtina vî bihayî bi rêka çîrokê di kovareka zaroyande bo zaroyan xweştir û bi tamtire eger kesekê mezin bi şêwazê şîretan vî rewiştê perwerdeyî nîşa wî bidet.

Bi heman şêweyê kartêkirina çîrokên zaroyan di kovarên zaroyande, hozan û helbestên zaroyan jî qasî wan çîrokan kartêkirina xwe li ser perwerdekirina zaroyan heye û bihayên perwerdeyî yên erênî li dev wan peydadiket. Her jiber hindê jî kovarên zaroyan di valanînin ji helbestên taybet bo zaroyan, çunkî her wekî dihête gotin: (Helbest zimaneke dinav zimanekê dîtir de)[55] û eve jî wê çendê digehînît ku helbestê ziman ûşêwazekê taybet heye. Her jiber giringiya helbestê jî bûye li ser guh û derûnên zaroyan wel deykan kiriye ku dema bivêt zaroyên wan di xew biçin bi ezmanê xwe yê nazik û şirîn peyvên ciwan û lêkdayî û tamdayî bi awaz û muzîkeka balkêş bo zaroyên xwe helbest gotîne û zaroyên wan di ber wan stiran û helbestanra nivstîne.

Zêdebarî kartêkirina helbestê ya têrkirin û xoşiya zewqî, êk ji mebestên din yên giring yên helbestên zaroyan binecihkirina saxkirina saxletên perwerdeye di kesatiya zaroyanda û berfirehkirina medarikên wane, û her ji kevinda helbestvanan giringiya erkê perwerdeyî di helbestêde zaniye û ka çende giringe di helbestên zaroyande hebît û her jiber hindê ( Çakyên Rewiştî û Derûnî, li serê van core zanîn û me'arifan derkevtin çunkî giringiyeka baş di avakirin û pêkînana take kesande heye, û

---

55 - Necîb Geylanî, Edebul Etfal fî Zeweul Îslam, Mewsuet Erîsale, Teb'e 3, , Beyrut 1991, S85.

bi vê çendê berebabekê nû û saxlem ji aliyê zanistî û rewiştî û leşîve avabît.)[56]

Helbesta (Dara)[57] ku di kovara (Zeng û Beng)êde belavbûye bi vî rengî şîretan li qutabî û zaroyan diket:

(Dara)

Dara le pulî yeke
Mindalêkî zîreke
Pak û xawên û ciwane
Ke dêt bo qutabixane
Zor bê deng û wiryaye
Qise le gel kes nakat
Qise bikat tî nagat
Êweş herweku dara
Cwan danîşin le pula
Gwê bigirin le mamosta
Heta ku zeng lê deda

Êk ji taybetmendiyên vê helbestê ewe ku bi şêwezarê kurmanciya Xwarê di Kovara (Zeng û Beng) da hatiye belavkirin, dîsan çend biha û rewiştekên perwerdeyî têdE diyardibin wekî : ( Zîrekî, Paqijî û Bijînî, Bê Dengî, Guhdariya Mamostayî). Helbestvan kariye van çend rewişt û bihayên perwerdeyî di qalibê helbestekêda û bi hinek peyvên jêgirtî û bi awazeka balkêş arastey zaroyan biket û bibîte pişkek ji kesatî û rewşitên wan.

(Rêbwar Alanî) dîsan di helbesta ( Defterekem)[58] de zaroyan - bi taybet yên diçine qutabxanê- fêrî rewiştekê perwerdeyî yê ciwan diket ku taybete

56 -'Eumer Ehmed Talib, Edebul Atfal fîl'Îraq, Darseqafetul Etfal, Sîlsîlet Dîrasat, Bexdad, 1989. 57 - Bawan 'Elî, Ko.Zeng û Beng, J.(17) Çp. Hawar, Duhok, şiyata 2003, R.14.

bi qutabxanêve ew jî, ciwan parastin û paqjiya kel û pelên xwandinêye ku deftere.

Erstu Şagirdê Eflatunî bû û gelek bi felsefe û bîr û boçûnên wî karîger bibû, lewa Erstu digel hindê bû ku perwerdekirina zaroyan û berebabên nû divêt pişkeka serekî ya kar û siyaset û sitratîjiyeta hikumeta bît, û nêrîna wî ya wesa bû ku her çaksaziyeka siyasî yan ya civakî heta peydabibît divêt digel wê çaksaziyê perwerdeyek jî hebît û her li berahiyê zaroyan li ser hindê fêrken ku digel sîstemê hukumî biguncît. Lewa bi fer jî zanî ku pêdviye hukumet bi perwerdekirina zaroyan rabît û serperşitiya wan biket, Erstu digel hindê nîne ku bitenê hukumet hêlên giştî û serekî yên perwerdeyê bi danît, nexêr, ew digel hindêye xwe ew tiştê bo zaroyan dihête nivîsîn û danan jî û bi hemî hûratiyanve wekî wan çîrok û helbest û wêne û hemî hunerên din yên bo zaroyan dihêne pêşkêşkirin hukumet serperiştiya wan biket, çunkî bi buçûna Eristuy ev hemî şarezayên kesî dê rengvedana xwe li ser kesatiya wan ket û çu carekê jê naçît.(59)

Belê divêt wê çendê jibîr nekeyn ku nivîserê Edebê Zaroyan di rojnamevaniya zaroyanda ew edîb û hunermende berî ku bibîte kesekê bi karê perwerdeyê rabît, şengisteyê serekî yê edeb û hunerî jî têrkirina xwandevaniye bi wê hezkirin û teşwîqa di karê edebîda hey, anku neya beraqile Edîb û Nivîserên zaroyan tama edebî di berhemê xoda bimrînin jibo hindê ku bi şêweyê aşkera û berçav hinek hizir û binemayên perwerdeyî bigehîne zaroyan. Belê çend Edîb û Nivîserê Zaroyan yê nêzîkî hez û cîhana zaroyan bît ew dê pitir yê serkevtîbit di helbijartina babetên xweda û dê şêt pitir xwe nêzî wan ket.

Lidor vê çendê jî (Joan Aiken – 1924-2004) ku êk ji Romannivîsên Îngilîzane û gelek xelatên giring lidor edebê zaroyan wergrtîne û dibêjît:(

---

58 - Rêbwar Alanî, Ko.Pepûle, J.(35)Silêmanî, Eylûla 2000, R.13.
59 - Fethiye Hesen Silêman, Terbiyet Etifil beynel Mazî Welhazir, S.55.

Çewa mirov xwe ji nexweşiya (Ta'unî) diparêzît, divêt bi heman şêwe mirov xwe ji şêwazê rastewxo û êkser jî biparêzît, demê mirov bo zaroyan yan kesên mezntir û sinêleyan jî dinvîsît, çunkî kesek ji van sopasiya te naken jiberku şîretkirin û çandina rewiştên baş erkê deybabên wane û tu yê wî erkî ji wan werdigrî, ya durust ewe ku ew nivîsîn bi tambin û zaro xweşiyê jê werbigirin.)[60]

## Di Bwarê Rewşenbîriya Gşitîde

Dezgehên ragehandinê mil bi milê xêzanêve rolekê serekî û giring di gêrin jibo avakirina layenê civakî û rewşenbîrî yê kur û kiçan her ji qunaxa zarokîniyê û heta mezin dibin. Her çende li berahiyê Pertûk çavkaniya serekî ya pêzanînan bû bo zaroyî lê nuke Rojname û Kovar û Televzyon û Radyo û Sînema û Entirinêt û gelek dezgehên dîtir yên ragehandinê bi heman erk radibin jibo pêgehandina zaroyan ji aliyê rewşenbîrîve.

Rewşenbîriya zaroyan ya hemî renge û hemî layên kesatiya wî bi xweve di girît mîna: Rewşenbîriya Zanistî û Civakî û Leşî û Hest û Sozî û ... gelekên din. Herwesa rêkên rewşenbîrkirina zaroyan jî gelekin mîna: (Xêzan, Qutabixane, Deybab, Cihên Peristinê, Yane û Hevalên Yariyan û Dezgehên Ragehandinê bi hemî corên xweve), Belê rêk û şêwaza ji hemyan pitir rolê xwe di gêrît dezgehên ragehandinêne ku rojnamevaniya zaroyan jî êk ji wan dezgehane. Giringtirîn armancên rewşenbîrkirina zaroyan bi rêka rojnamevaniya zaroyan û dezgehên din yên ragehandinê di van xalanda komve di bin[61]:

---

60 - Ye'qûb Şarûnî, Edebul Etfal ..finun We 'Îlm, Dîrase Qedemet fî Me'arez El-Şarîqe Lîl-Kîtab, 2013, S.3-4.

61 - Muhemed 'Ebdilrezaq Îbrahîm - Hanî Muhemed Yunis – Wehîd Elseyd hafiz, Seqafet Etifil, S.314-315.

1- Bi rêka hinek şêweyên edebî wek: (Çîrok, Helbest, Pêzanîn, Gotar...) zaro bi kelepor û tureyê miletê xwe û bab û bapîrên xweve dihêne girêdan.
2- Zaro bi wan helwîstên geş û rûdanên karîger û qaremanên mêrxas yên miletê xwe dihêne agehdarkirin, da bo wana bibine çavlêker û rêber.
3- Geşekirina viyana pertûkxanê û şarezayên wê lidev zaroyan, eve jî dê bi rêka girêdan û gehandina zaroyan bît bi pertûk û pertûkxanêve û rênîşadana wan jibo helbijartina xwandina pertûkên bi mifa jibo hindê ku demê wan bê mifa ji wan neçît.
4- Huşyarî û hestyariya zaroyan beranber wan arîşeyên li welat û civakê wanda hey bihête geşekirin, eve jî dê peydabît demê nivîser di hinek nivîsînên xwe yên edebîde amajê bi hinek arîşeyan diken û nehêlin ew arîşe berfireh bibin û bikevine serêk.
5- Bo Zaroyan agehî li ser hinek layên cîhana derdorî xwe peydadibît, eve jî bi rêka nivîsînê li ser jiyana hinek welatên cîhanî û rewişt û tîtalên wan û bajêr û rûdanên wan yên mêjûyî û civakî û gelek pêzanînên din.
6- Zaro li ser wan guhorînan razîdibin yên ji aliyê dînîvh rewayî têde hebît, mîna pêşkevtina teknelocî û bikarînana kompiyoter û gelek tişitên din ku ji aliyê dînîve rewaye bihêne bikarînan.

Kovar û Rojname bo ber destên zaroyan nêzîktirin ji pertûkan, kovar pêngava êkêye ku berê zaroyan didete xwandina pertûkê û hezekê bo wî durust diket ku bizanît ka çi li derdorê wî rûdidet û kovar dibîte pişkeka serekî ji jiyana wî. Jiberku rojname û kovar gelek Çîrok û Sirod û Berîkane û Tirane û Pêzanîn û Qarmanî û Werizş û gelek tşitên din yên zaro têhniyê wane belavedken, lewa rolê van kovaran jî çend carkî zêdetir lêhatiye jibo

hindê ku berê wan bidete çavkaniyên xwandin û rewşenbîriyê, dikarîn egerê vê çendê jî bo çend xalekan vegerînîn û ji wana[62]:

1- Kovar û Rojnameyên zaroyan bi sanahîtirîn rêk û şêwazin ku hez û viyana zaroyan bo tişitan û lipey qunaxên jiyê wan têrbiket.
2- Li salên berahiyê yên jiyê zaroyî xwandin bo wî ne ya bi sanahiye, lewa zaro bi rêya dergehê rojnamevaniyê di çine di nav hez û pêdiviyên xwede.
3- Hezên xwandinê lidev zaroyan pêdviye berdewam ji aliyê xêzan û qutabxane û pertûkxana qutabxanê û pertûkxana giştîve bihên geşekirin, evca rojname û kovarên zaroyan dikevine berdestê wan xwandin lidev wan xweştivî lêdihêt.
4- Hebûna wêne û nexşe û rengan û heme coriya babetên kovarên zaroyan welê diken ku pitir xwe vekêşne bal kovarên taybet bi zaroyanve.
5- Rolê rojnamevaniya zaroyan jibo rewşenbîrkirina zaroyan gelekê giringe, û êk ji cuyên serekî yên rûbarê rewşenbîriya wane, jiber hindê dû xalên serekî di vî babetîde gelek di giringn:
6- Hûrbînî di wê rewşenbîriyê de bihêtekirin eva bo zaroyan dihête pêşkêşkirin û di muxil û bêjînikan bihêtekirin.
7- Geleka giringe ew zaroyên wê rewşenbîriyê werdgirin baş bihêne nasîn ji hemî aliyanve.[63]

Li dor xala êkê: Ya fere bizanîn ku peyv û nivîsînên bo zaroyan di hêne nivîsîn çend bi mu'teqedê zaroyve girêdayî û nêzîk bît, reftar û rewiştekê saxelemtir li dev wî peydadibît û li wî demî dê kaniyên xêr û ciwanî û rewişt û çakî û me'rîfetê di jiyana wîda zên. Bi vê çendê jî, anku bi hebûna : ( Peyv,

62 -'Ebdilrehman Seyd 'Ebdilrezaq, keyfe Tuhebîbînel Qîrae LîTîflîkî, Mewsuet Îqre Lîl-Neşir We- Tewzî' We-Terceme, Qahîre, 2010, S.91-91.
63 - Semer Ruhî Feysel, Edebul Etfal We Seqafetuhum – Qîrae Neqdiye, itîhadul kutab el'ereb, Dîmeşq,1998 S.118.

Mu'ateqed û Bawerî, Reftar û Rewişt) dê sêgoşeya jiyana mirovî ya bextewer durustibît.

Bi vî têgehî bo me baş diyardibît ku ew peyv û nivîsînên di kovarên zaroyande dihêne nivîsîn rolê wan yê serekî ewe ku lipey qunaxên geşekirina wan ya aqlî û derûnî, rewşenbîrî û serbor û şarezayê bidete zaroyan, çunkî eger delîveyê bidene zaroyan ku lipey xerîza xwe ya zaroyê peywendiyê digel derdorên xwe biket û wekî xwe di her tiştekî bigehît li wî demî dê bi şaşî her tiştekî wergirît û dê dinav hinek tesewratên neheqda berzebît, lewa eger edebê durust yê zaroyan bi şêwazekê saxlem û rast bigehîte wan, li wî demî dê medarikên wana geşe û avaken û dê bîte egerê hindê ku serdaçûn û berzebûnê bihête parastin.[64]

Derbarey xala duwê, ku geleka pêdviye nivîserên edebê zaroyan wan zaroyan baş binyasin evên ew bo dinivîsîn, çunkî mijareka serekî di vê dîtnêde heye û di bibêjît : (Eger tu neşêy zaroyan bîniye rayê û kartêkirinê lê bikey, ew rewşenbîriya tu bi rêya nivîsînên xwe pêşkêşî wan dikey nabîte pişkek ji reftar û rewiştên wan û çu core rewşnbîriyek neşêt kartêkirinê li zaroyan biket û wana bînîte rayê eger tam û xweşî û lezzet û teşwîqek di wan nivîsînande nebît ku zaroyan balxweve vekêşin)[65], Ev çende jî di rojnamevanya zaroyan û pertûkande heye, Çunkî ew mebest û hizir û şîreta mezinan divêt bigehîne wan bi rêkeka nerastewxo çu bi rêka wêneyekî bît yan qaremanê çîrokekê yan evsaneykê bît yan helbest û gotarekê bît di gehîne zaroyan, bo nimûne:

Heta ku viyana welatî bigehîte zaroyan û bibîte pişkek ji jiyan û têgehiştina wan geleka bi zehmet bi rêka şîreteka hişk û peyvên dirêj û sade yên mamostayekî yan deybabên zaroyekî ev armance bi destvebihêt, belê

---

64 - Necîb Geylanî, Edebul Tifil fî Zewa El-Îslam,Beyrut, 1996, S.133.
65 -Semer Ruhî Feysel, Edeb El-Etfal We Seqafetuhum – Qîrae Neqdiye,çavkanya berê S.117- 118.

helbestvan (Ehmed Nizurî) şiyaye bi helbesta xwe ya bi nave (Welat)[66] ku di kovara (Zeng û Beng) de belavkiriye û peyvên nazik û ciwan digel wêneyekê Buhara rengîn yê siroştê Kurdistanê û alayê welatî bikarînaye û şiyaye bi wî wêneyî û bi wan peyvan nebitenê viyana welatî lidev wan xoştivî biket, belkî dişêt welatî bikete di dilê wande.

## 4. Taybetmendiyên Rojnamevaniya Zaroyan

Armanc û mebesta serekî ji rojnamevaniya zaroyan têrkirin û mijulkirina zaroyane, peydakirina hest û soza û çalakkirina xeyal û endêşeya wane, fêrkirina zaroyane bi şêwazekê nerastewxo li ser wê çendê ku bişên bi şêweyekê saxlem û durst digel rûdan û kesên derdorê xwe bijîn û li ser reftarên mirovatî yên sivêl bijîn û hest bi berprsatiyê biken û şaşî û rastiyan dinav civakêda jêkcudabiken û gelekên din.

Lê eger pîçek bi hûrî biçîne dinav armanc û mebestên rojnamevaniya zaroyande, ev xal û şengsteyên serekî dê bo me berçavbin:

**1-** Gehandina Deng û Bas û Pêzanînan: Rojnamevaniya zaroyan dişêt deng û basên zaroyan belavebiket û bivê çendê dê zaro bi jîwarê xweve hêne girêdan. Dîsan her bi rêka wan deng û bas û pêzanînan û belavkirin û berçavkirina şarezayî û şiyanên zaroyên gelek zîrek û dahêner dê şarezayên zaroyan dinavbera wande hêne pêkguhartin.[67]

**2-** Perwerde û Fêrkirin: Rojnamevanî bi rolekê serekî yê rewşenbîrkirin û fêrkirina zaroyan radibît, çunkî bi şêweyekê rastewxu yan nerastewxwe zanyariyan di hemî biwarande pêşkêşî wan diket digel rêjeka baş ya wergirtin û têgehişitin û dahênanê, eve hemî jî di çarçoveyê tirane û yarîpêkirinanda. Eve jî di bîte harîkar jibo hindê ku zaro di jîwarî bigehît û ageh ji wan yasa û biryaran hebît yên wî bi rêvedben û da şarezayeka dîtir li

66 - Ehmed Nizurî, Ko.Zeng û Beng, J.(139) Çp. Hawar,Duhok,tebaxa 2015,R.4.
67 - 'Ebdilfetah Ebu Me'al, Edebul Etfal We-Esalîb Terbiyetihim We-Te'lîmîhim We -Tesqîfîhim,

Dar Şiruq, Ç.êkê, Urdin, 2005, S.130.

şarezayên wî zêdebibin. Herwesa rojnamevanî bi rolekê serekî radibît jibo veguhastina keltûrê rewşenbîrî evê radibît bi gehandina pîzanîn û bihayên civakî ji berebabekî bo êkê dî da ev zaroye tûşî hêrşên hizrî û rewşenbîrî nebin.(68)

**3-** Pêkve girêdana zaroyan bi kêşên neteweyî û nîştîmanî: peydakirina hesta bi berpirsatiyê beranberî welatî, ev hizra henê di mêşkê wîda bihête çandin ku welat ew avahiyê serekiye yê ku pêdviye berevanî jê bihêtekirin, û wel zaroyan diken ev core babete bibine babetên balkêş lidev zaroyan.(69)

**4-** Geşekirina Hizrî: Şiyanên zaroyan li ser hizirkirnê hêdî hêdî digel zêdebûna şarezayî û peywendiyên wan û geşekirina wan ya eqlî û zimanî û civakî û derûnî avadibît, bivê çendê diyar dibît ku jîngeha rewşenbîrî ya zaro têde mezndibît kartêkirinê li geşekirina hizra zaroyan diket. (Biyacê) di bênît ku zaro heta jiyê 11-12 salî jî hizirkirina wî hemî li ser wan tiştane yên liber çav û hestên wî di kevin bi taybet wêneyan, anku şirovekirinên wî bara pitir liser dîtin û guhlêbûn û destkirinêye, evca rojnamevaniya zaroyan û bi rêya wêne û nivîsîn û peyvan vê armancê binecih di ket.(70)

**5-** Geşekirina Hesta Ciwankariyê**:** Zanayên perwerdeyî pêdviyên zaroyan diyarkirîne û ji wana: ( Xwarin û Vexwarin, Êmnahî û Aramî, Muxamere û Xeyal, Ciwanî û Ciwanikarî, Pêzanîn û Me'rîfet) evca rojnamevaniya zaroyan van hersê pêdviyên dûmahiyê bo zaroyan dabîn di ket.

Avakirin û geşekirina hesta ciwanî û ciwankariyê û bi taybetî ciwaniya ruhî lidev zaroyan giringtirîn armancên rojnamevaniya zaroyane, û edeb - wekî hunerekê ciwan - eger di rêka xo ya rast û durstira gehişite zaroyan, û ji aliyê roxsar û naverokêve yasa û binemayên ciwaniyê têda

---

68 - Sara Leysî, Ehmiyet Suhuful Etfal fîl Tenşîel Terbewiye Wel-Seqafiye, Malperê Nun Post, 3- 10-2015.
69 -'Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, ESehafel Mutexesîse,çavkaniya berê, S.123-124.
70- Hadî Nu'man Hîtî, Seqafetul Etfal, El-Meclis El-Wetenî LîSeqafe Wel-Funun Wel-Adab, Kwêt, 1978, S.89.

hatine xemlandin iha li wî demî dê wêneyekê ciwan û karîger jî kevîte ber destê xwandevanî ku zaroye û dê bîte egerê hindê ku zaro hez ji hemî tişitê ciwan bi ket û xwe ji hemî tişitê kirêt û xirab dûrbêxît.(71)

**6-** Tirane û Mijulkirin û Demborandin: Gelek ji wan xwandinên li ser kovarên zaroyan hatîne kirin diyarkiriye ku armaca ji hemiya giringtir û serkêşa hemiyan eveye, çunkî êk ji wan xalên giring yên berê zaroyan didene xwandinê mijulaye û dem borandin û tiranene, eve bi rêya wan çîrok û yarî û berîkane û wêneyên karîkaturî û gelek hunerên dîtir da diyardibît. Lewa bivê çendê zaro demên xweş digel kovarên zaroyan di borînin û aramî û xoşiyekê di xwandina wande dibînin. Dibît gelek caran ev xale ji hemî xalên dîtir berçavtirbît di kovarêda, belê ya durust ewe ku hevsengî di babetên kovarêda bihête parastin.

**7-** Çandina Hez û Şarezaya Dahênana Edebî û Hunerî lidev zaroyan: Demê zaro ewan çîrok û helbest û babetên din yên hunerî û edebî evên di kovarên zaroyanda di hêne belavkirin baş di xwînin, divêt ew xwandin bi rengekê wesa ya zelal û safî bît ku bibîte harîkar ji bo zaroyan ku terkîz di zimanê wanda peydabibît, û peywendiyeka mukim digel zimanê daykê peydabibît û hesta şanaziyê bi vî zimanî bo peydabît, û lipey ewan hezên zaroyan heyin hindî nivîsîn û gotar di wan bwaranda bo wan bihêne arastekirin, li wî demî heza edeb û hunerî dê pitir lidev wan zaroyan peydabît. Lewa geleka pêdiviye kovarên zaroyan delîveyeka baş bidene berhemên wan zaroyan yên hez û şiyanên edebî heyn da berhemên xwe belave biken, û di vêt pişitevaniya wan jî bihêtekirin da berdewamiyê bidene dahênanên xwe. Ya ji hemiyan jî giringtir ewe ku ew zaroyên hebûna xwe selmandî û şiyayin berhemekê edebî yê berçav pêşkêş biken, xemeka xem ji wan bihête xwarin.(72)

---

71 - Necîb Geylanî, Edebul Tifl fî Zewa Îslam, Beyrut, 1996, S.151-153. 72 - Malperê: Meqalat Îslam wêb.nêt. (www.islamweb.net) 27-11-2008.

**8-** Armanca Bazirganî: Hindek kovarên zaroyan yên heyin hinek berperên xwe û bi taybet bergî terxanikriye bo rîklamên bazirganî û pitiriya wan rîklaman jî ewin yên girêdayî bi firotina kel û pel û berhemên zaroyanve, yan xwandinge- û baxçe û dayîngehên zaroyan, yan rîklamên helkevtinan bi taybet helkevtên ji daykbûnê.(73)

## 5. Armancên Rojnamevaniya Zaroyan

Rojnamevaniya zaroyan gelek saxelet û taybetmendî hene wê ji corên din yên edebî çi wekî pertûk û şano û televzyon yan corên din yên rojnamevaniyê wekî rojnamevaniya Siyasî yan Aborî yan Civakî û Rewşenbîrî û her corekê din, jiberku ev corê rojnamevaniyê bo texeka hestyar û giring dihête arastekirin û her kêmasî û lawaziyeka têda peyda bît li paşerojê dê şînwarên wê yên nerênî li ser jiyan û rewişt û reftarên zaroyan diyarbin. Dîsan çunkî evê corê rojnamevaniyê mebest û armancên xwe yên taybet û cuda hene lewa ev saxlet û taybetmendiye jî li xwe hembêzkrîne û ji wana:

1- Rewşenbîrkirin û fêrkirina zaroyan: Rojnamevaniya zaroyan rolekê serekî digêrît jibo rewşenbîrkirina zaroyan û avakirina kesatiya wan, û ew ji rêkên kartêker yên rewşenbîrkirina vê texê dihête hijmartin, jiberku mebesta wê mijulkirin û têrkirin û arastekirina zaroyane jibo rewşenbîrkirin û fêrkirina wan û peydakirina rewişt û edetan û rolekê baş digêrît jibo veguhastina hizir û şarezayî û pêzanînên nû ji bo zaroyan. Ya giringtir ewe ku xwandinê liber zaroyan şirîn diket bi rêka çîrok û helbest û goşeyên dîtir.(74)

2- Ev corê rojnamevaniyê giringiyê didete dîtin û bînînê: Di Rojnamevaniya Zaroyande bi rêka peyvên nivîsî û wêneyê rengîn derbirîn ji hizr û rastiyan diket, û bivê çendê zimanê axvtinê yê nivîsî komdiket digel zimanê dîtinê, giringiya vê saxletê jî di wê çendêdaye ku berî her tiştekî zaro

---

73 - Sara Leysî, Ehmiyet Suhuful Etfal fîl Tenşîe ETerbewiye We Seqafiye, 3-10-2015.

74 - Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011. ,S,134.

keseke bi rêka dîtinê û tiştê berçav biriyarê li ser her tiştekî didet, helbet ev corê zimanî jî karîgertire ji zimanê axvtinê bitenê.(75)

3- Heme rengî û dewlemendî: Rojnamevaniya Zaroyan gelek dergeh û stûn û goşeyên heme reng û berîkane û goşeyên hevnasîn û goşeyên aşkrakirina hez û arezûyên zaroyan û wêneyên ciwan û renga û reng yên hevalên wan her yên zaro û deng û basên werzişî û pêzanînan û gelek babet û goşeyên din wê taybetmendiyê didete rojnamevaniya zaroyan lidev yên din nebît ku dibîte egerê dewlemendiya vî corî, û her ev egereye peywendiyeka bi hêz û mukim di navbera zaroyan û van rojname û kovaranda peydadket.(76)

4- Dil birin û Balkêşî: Şêwazê balkêş yê çîrok û helbestê û wêne û rengên ciwan û karîkatur û hebûna berîkaneyan û goşeyên pêzanîn û tirane û berçavkirina berhemên zaroyan û gelek taybetmendiyên din evên ku rojnamevaniya zaroyande hey û li dezgehên dinde nîne bûye egerê wê çendê ku ev cor û şêwazê rojnamevaniyê dibîte cihê balkêşî û pitir pîtepêdana zaroyan û dil û çavên wan bo xwe radkêşn.

5- Diyarkirin û înane pêşa wan kesatiyên zaro hez jêdiken: Pitiriya kovarên zaroyan wan kesatiyan berçav diken yên lidev zaroyan gelek giringiya xwe hey yan bo wana wekî çavlêkerane, û her jiber hindê jî gelek ji heftî nameyên zaroyan xwe navên wan jî her ji wan tiştan hatiye yên ew hez jêdiken, evca çu kesatiyeka mirovî bît yan wekî giyanewer ku zaro pêve hatibine girêdan, mîna navê kovara (Zeng û Beng) navê kesatiya çîroka zaroyane ku her ji zaroyî bo wan di hête gotin, yan navê govara (Sivore) ku corekê giyaneweriye zaroyan gelek hez li ser heye.

6- Peywendîkirin û Hevgehiştin digel xwandevanî "Zaroyan": Kovarên zaroyan berdewam bizav û pêkolan diken ku kenalên gehandin û gehiştinê

---

75 - Sena Celal 'Ebilrehman, Waqî' Sehafetul Etfal We-Dewruha El-Me'rîfî fîl 'Alem El'Erebî – Dîrase Tehlîliye, Muceletul Adab Wel-'Ilum El-Îctîma'iye, S.109.

76 - Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011. ,S.126.

digel zaroyan her hebin, çu bi rêya berîkane û diyariyan çu jî bi vekirina goşeyên taybet bo zaroyên behreyên taybet heyn û kesên dahênerin. Egerê vê jî bo hindê vedigerît ku kovarên zaroyan nebitenê zanyarî û fêrkirinê nîşa wan diden, belkî çunkî zaro gelek tiştan di wan kovarande dibînît digel geşekirin û werara wî diguncin, lewa ew jî berdewam digel wan kovaran dimînît.(77)

7- Rojnamevaniya zaroyan bi sanahî di hête helgirtin û her cihê zaroyan bivêt digel xwe diben, û her gava bivêt ji dikarît li wê kovarê bizivrît û bixûnît.

## BEŞA DUYEM:

## 1. CORÊN ROJNAMEVANIYA ZAROYAN

Eger behsê cor û şêweyên Rojnamevaniya Zaroyan bikeyn, divêt ji herdû layên roxsar û naverokêve behs bikeyn, çunkî her aliyek ji wan taybetmendî û saxletên xwe yên cuda hene, lewa me jî her lipey wan herdû aliyan corên rojnamevaniya zaroyan jêk cudakirîne:

### Ji Aliyê Roxsar û Şêwazîve

Rojnamevaniya Zaroyan ji aliyê roxsarîve li ser van dû corên serekî dihête vavartin:

---

77 - Mîftah Muhemed Diyab, Muqedîme fî Seqafet we Edebul Etfal, Dar El-Dewliye lîl-Neşir wetewzî'a, Misir,1995,S.127.

1-Rojname : Ev core ewin yên rojane derdikevin û pitir giringiyê didene deng û basên rojane yên peywendî bi zaroyanve heyn.[78] Lê ev corê rojnameyan bitenê li welatên biyanî û rojavayî hene û li welatên rojhelat û bi taybet yên 'Arebî û Îslamî jî nînin.[79]

Ev corê rojnamê ne gelekê giringe ku hebît, belkî beranberî vê eger rojnameyên bo mezinan rojane derdiçn bikarin cihekê baş ji rojnameya xwe bo zaroyan terxanbiken dê gelek ya bi mifa bit.[80] Nimûne li ser vê çendê l welatê kwêtê rojnameya (Enba) ku rojane derdikevît nîv berperî didete babetên taybet bo zaroyan.

Rojnameyên navbirî bara pitir bo wan zaroyan derdikevin yên jiyê wan di navbera (12-18) saliyêda, û her jiber hindê xwandina van core rojnameyan rêjeka zêde ya têgehişitin û danayê divêt[81]. Ji nerênî ûkêmasiyên vî corî ewe ku bihayê wan deng û basên têde dihêne belavkirin zû bi serve diçît, anku bi wê rojêve ya grêdaye, yan jî bihayê kirîna wê yê girane û gelek tişt yên têde heyn lewa bo zaroyan nabîte cihê balkêşiyê û xwandevanê wê jî yê kême û pitiriya van rojnameyan jî berdewamiyê nadene derkevtinê û di hêne rawestandin.

2-Kovar: Ew kovarên taybet bi zaroyanve dîsan ji aliyê demîve di bine çend corek, Kovarên Heftiyane ku giringiyê didene wan babetên bi mifa û serdem, û bizavê diken her tiştekê nû lidor zaroyan peydabûy û kartêkirin li ser wan hebît bigehîne wan. Corê din yê kovarên zaroyan Kovarê Mehanene, û babet û naverokên van kovaran ji yên heftiyane pitirin û şêweyê berçavkirin û nîşandana rûdan û pêzanîn û babetan jî cudaye û pitir

---

78 - Mîftah Muhemed Diyab, Muqedîme fî Seqafet we Edebul Etfal, Dar Dewliye lîl-Neşir wetewzî'a, Misir,1995., S.82.
79 - Tariq Bikrî, Mecelatul Etfal we dewruha fî Bîna Eşexsiyel Îslamiye, Nameya Dikturayê, naşirî, 2003.S.118.
80 - 'Ebdilfetah Ebu Me'al, Edebul Etfal -Dîrase We Tetibîq, Dar Şiruq Lîneşir wetewzî'a, ÇP2 ,Urdin, 1988., S.37.
81 - Şu'eyb xebaşî, Sehafetul-Etfal fîl Wetenul 'Erebî, ÇP. Al'alem El'Erebî, Qahîre, 2002., S.53.

dupatiyê li hunerên çîrokan û hekayet û muxameratên xeleke xeleke diket.(82) Corekê dîtir yê kovaran heye ku di Werzîne û lipey werzên salê derdikevin, ev kovare ji aliyê qebareyve mezinin û babetên wan jî hemî rûyên jiyan , pêdviyên zaroyan bi xweve digirin û gelek caran babetên girêdayî deykêve di wan core kovarande dihêne belavkirin. (Civata 'Erebî ya Zaro û Geşepêdanê 2) di xwandinekêde ku li ser wan kovarên li welatên 'Erebî yên dinavbera salên (1989ta 1999) derkevtîn, Di encamda diyar bû ku: Jimareya kovarên Heftiyane û Mehane evên li wan welatan derdikevin bivî rengî bû: (35) Kovarên Heftiyane hebûn, (10) ji wan li Lubnanê derdikevtin û (6) li Sudanê û jimara mayî li ser hemî welatên dîtir yên 'Erebî di hatine belavkirin. Herwesa jimara Kovarên Mehane (52) bûn, (19) ji wan bitenê li Urdin der dikevtin û (7) li Sudanê û yên mayî li hemî welatên dîtir yên 'Erebî.(83)

## Ji Aliyê Naverokêve

Ji vî alîve dîtinên cuda hene jibo diyarkirina corên wê, hinek vekoleran rojnamevaniya zaroyan li pey qunaxên geşekirina jiyê wan belavkiriye, çunkî ew kovarên bo zaroyên (6) salî derdikevin wekî wan nîne yên bo (12) saliyan derdikevin, lewa ew wesa dibînin ku pêdviye rojnamevaniya zaroyan ji aliyê jiyê wanve li ser van sê qunaxan belavebibît(84):

1- Zaroyên jiyê wan dinavbera (3-6) salî, û ev qunaxe bi ( Qunaxa Jîwar û Xeyala Tuxîbdayî) di hête nasîn.

---

82 - Mêrvet Kamil Eterabîşî, Medxel Îla Sehafetul-Etfal,Ç.1, Darul-Fikr El-'Erebî,qahîre,Misir 2003.,S.42.

83 - Huda Ne'met Hemed, Wesaêt Edebul Etfal, Ko.(Edabul Ferahîdî),J(11), xizîrana 2012., S.284.

84 - Hadî Nu'man Hîtî, Edebul Etfal-Felsefetuhu- Finunuhu -Wesaîtuhu, ÇP.Dar Al-Huriye lîltîbae, bexda, 1977.,S.232.

2- Zaroyên jiyê wan dinavbera (6-12) salî, û eve jî di hête nasîn bi (Qunaxa Xeyala Berdayî û Qaremanî).

3- Zaroyên jiyê wan dinavbera (12-18) salî, anku ev qunaxe pitir ya bi jiyê sinêleyanve grêdaye, lewa dibêjne vê qunaxê jî (Qunaxa Nimûneyî û Romantîkiyetê).

Bo zanîn jî çu vavartinên taybet û êkane nînin jibo diyarkirina corên rojnamevaniya zaroyan, belkî hinekan lidov şêwazî û hinekên din lidov jiyê zaroyan û hinek jî li pey babetan hatîne cudakirin. Bo vê çendê me jî corên wê ji aliyê naverokêve li ser van coran belavkirîne:

1- Kovarên Giştî: Ev core ji hemî corên din berbelavtire, û naveroka wan jî geleka berfirehe û hemî renge, û di demekê kurtde zaro ji wî baxçey dê çîte baxçeyekê din dinav berperên kovarêde û dê bîte eger ku perîşanî bo zaroy peydanebit, Çîrokên Rengîn û Qaremanî û babetên Tirane û xwe Mijulkirin û Berîkane û Deng û Bas û Pêzanînên giştî têde di hêne belavkirin.

Raste divan core kovarande babetên heme reng lidor zaroyan dihêne belavkirin, belê eve wê çendê jî nagehînit ku ew babetên di hêne belavkirin çu hevsengî û pêkvegrêdan digel nîne, Nexêr.. ka çewa demê Hunermendekê şêwekarî kevalekê ciwan û lêkdayî çêdiket bi heman şêwe ew babetên di kovarên giştîde jî dihêne belavkirin raste gelek corin, belê derhênaneka Hunerî û Rojnamevanî ya ciwan çine berêk û wekî kevalî yan wêneyekî lêdihêt.[85]

Hemî rengiya van govaran ne bitenê dinaverokêdaye, belkî di roxsar û derhênana hunerî jî daye û gelek caran reng û wêne pîtan jî vedigrît. Dîsan fere amajey bi xaleka din jî bikeyn lidor vî corî ku gelek ji Nivîser û hunermend û Rojnamevan pişikdariyê di derêxistina wanda diken û her êk bi şêwazekî dahênanê têde diket bê ku ji hêla giştî ya govarê derbikevîn.

---

85 - Muhemed 'Ebdilrezaq Îbrahîm, - Hanî Muhemed Yunis - Wehîd Elseyd hafiz, Seqafetul tifil,Ç êkê ÇP.Dar El-Fîkir,Urdin, 2004. , S.233.

Ew kovarên evro li herêma kurdistanê jî derdikevin her ji : (Zeng û Beng, Kepir, Sivore, Pepule, Ciger Koşekan û ... gelekên din) Hemî bi ser vî corî vene, çunkî bi çu qunaxên taybet yên jiyê zaroyanve nînin û çu ruyên taybet jî wekî Werziş yan Qutabxane yan Tirane û Pêkenîn yan Wêne kêşan bi xweve negirtîne. Her ji ber vê çendê jî hemî corên zaroyan wan kovaran di xûnin û tam û xweşiyê jê wer digirin.

2- Kovarên Taybetmend: Her ji navê xwe yê diyare ku biwarên cuda û yên taybet û girêdayî bi derdorên zaroyanve bi xweve digirît û dibîte çend corek û ji wana:

1- Kovarên Deng û Basên Zaroyan: Kovarên navbirî giringiyeka taybet didene deng û basan pitir ji goşeyên din, belê ramana wê çendê nadet ku jibilî deng û basan çu tiştekê dîtir belavenaket, belkî Çîrok û Hekayet û Raport û Wêneyên Karîkaturî û Gotar jî têde dihêne belavekirin. Bi rengekê asayî kovarên deng û basan pîtey bi deng û basên zaroyan û çalakî û yarî û dahênan û hez û arezoyên wan diken li hemî cihan, belê her dîsan zarone ji wê texa mirovane yên gelek giringiyê didene deng û basan çunkî xwe nabînin xwediyên çu kêşeyan, û jiber hindê zaro pitir giringiyê didene wêneyê digel deng û basî pitir ji deng û basî bi xwe. Dibît her deng û basekê hebît bo texek ji texên mirovan yê giring bît, belê çu deng û basekê wesa nîne cihê pîtepêdana hemî kesan bît.[86]

Pitiriya kovarên deng û basan li welatên cîhanî yên wekî Firensa û Brîtaniya û Emirîka derkevtîne, belê her piştî janên giran û nexweş û xebateka berdewam û li dawiyê her kevtine ber rastiyeka te'l ku pêdviye bihêne bin axkirin û rawestandin, her çende gelek ji wan kovaran peyamnêrên jêhatî û xwedî serbor jî bo xwe înan lê her hatine girtin. Ji wan govarên bernyas yên deng û basan kovara (American Newspaper Boys) li

86- Hadî Nu'man Hîtî, Edebul Etfal-Felsefetuhu-Finunuhu-Wesaîtuhu, ÇP.Dar Al-Huriye lîltîbae, bexda, 1977., S.236-237.

sala 1927 hatiye derêxistin û kovareka heyvane bû, bo zaroyên dinavbera jiyê (12-17) salî derdikevt. Dîsan her li Emirîka kovara (American Newspaper and Weekliyi News Review ) li sala 1931 li Waşntun derkevt.[87]

Helbet li herêma kurdistanê çu govarên taybet bi deng û basanve nînin û her wekî berî niha jî me amajepêkrî ku corê here berbelav yê rojnamevaniya zaroyan li kurdistanê kovarên giştî yên zaroyane.

2- Kovarên Werizişî: Zaro gelek hez ji werzişê diken û hez ji qareman û kesên berniyas yên kesatî û qaremanên navdar yên werzişê diken, çunkî werziş lidev zaroyan wekî yariyeka rêkxistî û berdewame lidev wan. Kovarên Werzişî yên zaroyan gelek di kêmin û dezgehên çap û belavkirinê zû bi zû razînabin kovarên werzişî derbêxin, çunkî ew wesa hizir diken ku zaroyan hind pêdvî bi Kovarên Werzişî nîne hindî pêdvî bi werzişê bi xwe hey, nimûne li ser kovarên zaroyan yên Werzişî yên cîhanî, kovara (Sport Junier) ya Firensî û Kovara (Champion) ya Înglîzî. Dîsan ev corê kovaran li Herêma kurdistanê nîne, belkî kovarên zaroyan çend berperên xwe bo goşeya werzişî terxan diken.

3- Kovarên Qutabxaneyan**:** Çalakî û bizaveka qutabxaneyan ya azade di çarçoveya qutabxaneyande dihête encamdan, qutabî bi rolê serekî yê derêxistina wan radibît her ji nivîsîn û derhênan û çapkirin û belavkirinê, serperşitiya wê ji aliyê koma ragehandina perwerdeyî ya qutabxaneyêve dihêtekirin û gotarên wê jî ya arastekriye jibo Qutabiyan bi taybetî û bo Mamosta û Semyanên Qutabiyan bi gişitî û ya pêgîre bi wan yasayên qutabxane li ser dihête bi rêvebrin, qutabî bi azadane derbirînê ji bîr û boçûnên xwe diken û dahênanên qutabiyan têde dihêne berçavkirin.[88]

---

87 - Heman Çavkani, S.239-240.

88 - Macîde Lutfî Seyd, Teqeniyetul-Î'alamu-Terbewî We-Te'lîmî, Dar Usame lîl-Neşir Wel-Tewzî,Urdin,2011.,S.86.

Ev corê kovaran ji kevintirîn û giringtirîn kovarên zaroyane derkevtîn, giringiyeka mezin pê dihêtedan ji aliyê qutabiyanve. Mebest û armancên van core kovaran gelekin û ji wane:

- Başitirîn rêke bo qutabiyan ku derbirînê ji bîr û boçûn û hest û sozên xwe biken.

- Kovarên Qutabxaneyan şiyayna dahênan û dahêneriyê lidev qutabiyan pêşbêxît, çunkî rêvebirina kovarê û nivîsîna babetan û derhênana wê ya hunerî bi xwe corekê dahênanêye li dev wan qutabiyan peydadbît evên derdêxin.

- Rêkeka serkevtiye ji bo peywendiyeka serkevtî dinavbera deybabên qutabiyan û qutabxanêda wekî dezgeheka perwerdeyî.(89) Ji şêwe û corên rojnamevaniya qutabxanê: (Kovarên Helawîstî, Kovarên Kopîkirî, Kovarên dihêne çapkirin li çapxaneyan û hinekên dîtir).

Li welatên 'Erebî û derdorên me jî rojnamevaniya qutabxaneyan berî ya dî serhilda bû mîna: kovara (El-Tilmîz El-'Îraqî) ku li sala 1922 derkevtibû, kovara (Usame) li Suriyê û kovara (Samir) li Lubnanê û gelekên din.(90)

Li qutabxaneyên herêma kurdistanê rojnamevaniya qutabixaneyan yên helawîstî hene ku bi dîwarê qutabxanêve dihête helawîstin, belê di kêmin û gelek di germ û gor nînin û qutabî zû bi zû peywendiyê pêvenaken.

4- Kovarên Tirane û Hinekan yên Wênedar: Kovarên navbiri giringiyê didene hinek û pêkenînan, belê wêneyan digel bikardînin û digel wêneyan nivîsîneka kurt û kême. Ev corê rojnamevaniyê berahiyê li Emrîka peydabibû li 16 şubata sala 1896 demê kovara (World)(91) filmekê kurt yê wênedar belavkirî. Her çende zaro gelek hez ji vî rengê rojnamevaniyê diken û

---

89 - Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011. , S.236-238.

90 - malperê: Rabîtet Udeba El-Şam, 18-Kanûna êkê 2004.

91 - Hadî Nu'man Hîtî, Edebul Etfal-Felsefetuhu-Finunuhu-Wesaîtuhu, ÇP.Dar Al-Huriye lîltîbae, bexda, 1977.,S.234.

hembêz diken, belê ramana wê ew nîne ku ev kovare bo wana di guncayne, çunkî zaroyan şiyanên diyarkirna ziyanên wan nîne. Dîsan çunkî gelek wêne têda dihêne belavkirin dibîte egerê hindê ku hizir û xeyala zaroyan berbelavebît û hizra wan babetan geleka diyar û berçave lewa delîveyê nadete zaroyan ew bi hizir û şiyanên xwe bigehne hinek encaman. Helbet ev corê kovaran li herêma Kurdistanê nîne belku Hinek û Tiraneyên wênedar her di berperên kovarên dîtir yên zaroyande dihêne belavkirin.

5- Kovarên Ayînî û Aydulojî: Kovarên rojnamevanî bara pitir ji aliyê rêkxiraw û dezgeh û partên Îslami û siyasî derdikevin û li Emrîka û Ewrupa dehan kovarên ji vî rengî derdikevin. Jiber giringiya zaroyan hemî tayfên ayînî van core kovaran bo zaroyan derdêxin jibo çandina huşyarî û binemayên ayînî di mêşkê wande, çunkî her wekî dihête gotin mêşkê zaroyan yê valaye, helbet bo van core kovaran jî çu qazanceka darayî nahête daxwazkirin. Cuhî û Kasulîk û Pirotistant çendîn kovaran derdêxin,

ji wan kovarên Ayînî evên li Holenda bo zaroyan derdikevin (Aktie) û kovar (Nos Rowtes) li Belcîka û kovara (Onis Zfug) li Afrîqa[92].

Dîsan me li herêma Kurdistanê çu kovarên Ayînî yên taybet bi zaroyanve nînin, belê kovar hene hinek aliyên Îslamî derdêxin û rêjeka baş ya babetên wan ji Merce'iyet û Felsefeya Îslamî dihête wergirtin, mîna kovara (Zeng û Beng) li bajêrê Duhokê û kovara (Ciger Koşekan) li Hewlêrê (Yekgirtûwa Îslamî ya Kurdistanê) derdêxît û pişitevaniya wê diket.

## 2. HONERÊ ROJNAMEVANIYA ZAROYAN

Gelekên heyn wesa hizir diken ku pêdviye Rojnamevaniya Zaroyan bitenê babetên hinek û Tirane û Wêneyan û Berîkaneyan belavebiken zêdetir ne, belê ev hizr û boçûne neya duruste, bi taybet eger qunaxên jiyê zaroyan li berçav bihêne wergirtin dê baş diyarbît ku zaroyan pêdvî bi

---

92- Tariq Bikrî, Mecelatul Etfal we dewruha fî Bîna Eşexsiyel Îslamiye, Nameya Dikturayê, naşirî, 2003., S.203.

tiştekê heme reng heye û eve jî vedigerît bo jiyê zaroyan, çunkî bi rastî pêdviyên zaroyekê di jiyê 6 saliyêda ne wekî yên zaroyekê di 10 saliyê û 16 saliyêdane.

Jiber hindê Rojnamevaniya Zaroyan hunerên cuda cuda bikardînît jibo hindê ku babet û hizr û kersteyê xwe bigehînîte zaroyan, berçavtirîn hunerên Rojnamevaniya Zaroyan evene yên me di nameya xweda amajepêkirî, her çende hunerên din jî hene belê eve ji hemiya berbelavtirin:

## Çîrok

Heta nuke gelek ji wan Çîrok û Serhatiyên li zaroyîniyê ji aliyê dapîr û bapîran yan deybabên meve bo me hatîne vegêran heta nuke jî gelek ji wan tam û xweşiya xwe di mêşk û bîrhatinên me da hêlaye. Eve jî wê çendê diyar diket ku çîrok û serhatiyan kartêkirineka êkser ya li ser kesatiya zaroyan hey. Her jiber vî egerî jî pitiriya kesên bi karê perwerdeyê rabûyn, di pilanên xweda çîrok bikarînaye ji berku çîrok rêkeka bi sanahî ya perwerdeyî û rewşenbîrî ya serkevtiye jibo gehişitina armancan. Ji Kevidna çîrok lidev hemî miletan hatiye bikarînan jibo perwerdekirina berebabên paşerojê.

Çîrokê gelek girigiya xwe heye bo zaroyan:( Çi bihayekê mezin didete edebê zaroyan, çi umêdeka mezine pêdviye giringî bi wi edebî bihête kirin jibo avakirin û perwerdekirina mirovê nû û taze. Mirovê hêza rasteqîneya îcabî ku dikarît dahtiyekê geş û ron, ku mirov bizavê diket bo dabîn biket.)[93]

Her jiber hindê jî ji kevinde dujminê miletê kurd viyaye bi rêya çîrokên serdemê cudade ku huşyariya zaroyên kurd dagîr biken( dagîrkerani Kurdistan hestiyan be giringî dewrî mindal kirdûe, bûye her zû hewlyan dawe mêşkî mindalanî kurd bişwênin û be core arasteyan biken ke le

93- Îsa Şemasî, Al-Qîse Atifliye fî Surye, Dîrase Tehlîlîey Lîl-Qiyem El-Terbewiye, wezaret el seqafe, Dîmeşq,1996,S 30.

berjewendî siyasetî şovênî xoyanda bê û be pêy tiwana durian bixenewe le bîr û bawer û hestî netewayetî.)[94] Eger têgehê çîroka zaroyan bi deyne diyarkirin dê bêjîn: (Ew hunerê edebiye ewê ji komeka regezên bineret pêkdihêt wekî "Palewan, Rûdan, Helwîst, Hizir" û jibo bercestekirina hunerî penayê dibete ber peyvê, ku van hemî regezan bereb wirjandin û dilînî û helçûna kiriyarên jîrî yên bernyas bibet wekî " Wênedariyê, bîrînanê, Aşopkirinê, Hizirkirinê" lidev zaroy.)[95]

Çîrokên bo zaroyan di hêne nivîsîn û di kovarande dihêne belavkirin, pêdviye û ji çîrokên mezinan bihêne cudakirin, anku ew çîrokinvîsê bo mezinan dinivîsît nabît bi heman şêwaz û peyv û hêma bo zaroyan jî binvîsît, çunkî çîrokên zaroyan taybetmendiyên xwe hene û divêt evan saxletan bi xweve bigirît: (Şêwazekê bi sanahî, zimanekê zelal û balkêş, û di avahiyê xwe yê hunerîde divêt hizireka zelal hebît, rûdan û dem û cihên diyarkirî û kesatiya qaremanî têde hebin).

Dîsan divêt çîrok ji aliyê zimanî û sinûr û ramanên zimanî jî lidov têgehişitin û ferheng û fehimkirina zimanî ya zaroyan bît û sinûrê têgehişitin û ferhenga zaroyan dernekevin. (Ziman le çîroke mindalanda ho û amance,hoye bo le yektirîgeyiştin û amancekatêk zimanêkî suk û rewan bekaribihênrê û mindal bitwanê lasayî bikatewe.)[96]

Di çîrokên zaroyanda risteyan karîgeriya xwe gelek heye, anku hindî riste di kurt û zelal û bê girêk û pêkve grêdayî bin, zaro bi sanahî û bê westiyan têdigehin. Saxleteka dîtir û giring ya çîroka zaroyan ewe ku qaremanê çîrokê di çarçoveyê giyanewerande berceste diken û bi taybet

---

94- Edulsemed Îslam Taha Doskî, Rengdanewey Edeb le Govarî Haw arda 1932-1943, Namey Master, kolîjî adab, Zankoy Selahddîn- Hewlêr, 2001.

95 - Muhsin 'Arif Salih, Çîroka Zarokan li Devera Behdînan (1980-2004),R.15.

96 - Xalîde Qadir Ferec, Çîrokî Mindalan le Edebî Kurdîda, 1970-1990, Nameyi Macistêr, R.94.

wan giyanewerên zaro hez jêdiken wekî[97]: (Dîkil û Hesp û Rîvî û Kîvrîşk ûBalinde û kîsele...).

Çîroka (Hindil Ho)[98] ku di kovara (Pepûle) de hatiye belavkirin, qaremanê wê çîrokê (Kurê Darsitanê)ye û hevalê wî (Gambo) ku giyanewereke, û her qunaxeka çîrokê wênekê rengîn digel heye û risteyên wê di kurtin. Zaro hez ji van çîrokan diken çunkî rûdan li darstanê rûdiden û dû kesatiyên çîrokê jî giyanewerin û peyvên zelal hatîne bikarînan.

Dîsan çîroka( Mêş û Mîrole)de[99] babetê giringiya karî bo jiyana mirovan hatiye berçavkirin, belê li ser zarê dû giyanewran, anku qareman herdû giyanewerin (Mêş) û (Mêrole) bi şêwazekê sanahî hatiyî darêjtin û nivîserî dû giyanewer bikarînayine ku nêzîkî jiyara zaroyane. Her çende peyveka wekî (Mîkrob) hatiye bikarînan ku di bît bo hemî zaroyan ya bi sanahî nebît ramana wê bizanin, belê divêt peyvên nû jî li ferhenga zaroyan bihêne zêdekirin.

derbareyi corên çîrokên zaroyan, bi rastî li ser gelek coran hatîne belavkirin mîna[100]:

1- Çîrokên Folklorî (Hekyet): Ew çîrok û metelên rast û heqîqne yên li ser zarê xelkî hatîne veguhastin heta gehiştîne me, xudanê van çîrokan ne didiyarin û yên bûyne mulkê miletî, kesatî û qaremanên van çîrokan mirov û giyanewer û dar û dirext û tiştên dîtir yên siroşitîne. Mîna çîroka (Zeng û Beng) ê. (Kemal Xembar) wesa dibînît ku gelek ji çîrokên zaroyan di folklorê miletê me de pêdvî darêjtineka dîtire û dibêjît: (Êmey kurd ger awirêk le samanî netewayetîman bideyn, debînîn gencîneyekî lebin nehatwî çîrokman heye, be taybetî çîrokî mindalan her çende natwanîn hemûy be yek çaw

---

97 - Fazil 'Ebbas Ke'bî, El Medaxil Eterbewiyh We Murtekezat Etecanus El-Me'rîfî fî Seqafet El- Etfal, Bexda, El-Teb'e 1, 1999, S.186-187.
98 - Wer bi Destkarî Erselan Hesen, Ko.(Pepûle), j(43) maysa 2001,R.10. 99 - Wer Cîhan 'Umer, Ko.(Cigerkoşekan), j(64) kanûna 1,2000,R.4.

100-www.Hawpshti.com, 11-4-2015.

helsengênîn û pesendyan bikeyn, çunke babetî way têdaye legel giyanî emroy û berjewendî waqî' û helsûkewtî jiyanî berew pêşewe çû naguncê. bûye bûman heye çîrokî folklorî be şêwazîkî tir darêjînewe û bergêkî nwêxwazaney le berda bikeyin.)[101]

2-Çîrokên Evsaneyî û Sêrbendî: Ev core di xeyalî û evsaneyîne, li dor:(Ejdeha û Sîmerx û Hespê bi Per û Marê heft Ser û ...) Zaro bixwe xudanên xeyaleka tîjin lewa gelek dil li ser van core çîrokan heye. Ev core çîrokê ji wan corên çîrokan bû yên bo mezinan dihatine arastekirin û dihête gotin ku ev tuxmê edebî ji bo hindê dihate bikarînan ku wan dab û rewişt û tîtalan biparêzin yên di rewşenbîriyên serdemde kevtine ber hêrişên nemanê.[102]

3-Çîrokên Tirane û Hinekan: Bi rastî çîrokên tirane û hinek û nukteyan ne bi tenê zaroyan mijul diken, belkî têkçûn û hesteka mezin jîbo durst diken, û hizra zaroyan di azrînin . Zanayê derûnnasî (Mekducal)[103] diyardiket kupeywendî dinavbera kenî û hestibaziyê û pişkdariya wijdanê heye, jiberku hesta nerm û nazk kartêkirinê li derûnî diket. çîrokê (Cuhay) hemî nimûnene li ser vî corê çîrokê û di kovarên zaroyande gelek dihêne belavkirin.

4-Çîrokên Giyaneweran: (Serhatyên kurtin mebest pê ewe ku ramaneka rewiştî yan fêrkirnê yan hêkmetekê yan mebsteka edebî bi gehînît, kesatiyên serekî yên vî core çîrokê behra pitir giyanewer yan dar û barek yan bê giyneke, ev kesatiye saxletên mirovan heldigirin û wekî mirovan kardiken.)[104]

---

101 - Kemal Xembar, Çîrok bo Mindalan – le 'Erebiyewe Kirdûyetî be Kurdî, Çp.hezare, Bexda 1980, R4.
102- Kîmbirlî Rînoldiz, T. Yasir Hesen, Edeb El-Etfal, Hindawî Lîl-Telîm Welseqafe, Misir, 2012, S.90-91.
103 - Muhemed 'Ebdilrezaq Îbrahîm, - Hanî Muhemed Yunis - Wehîd Elseyd hafiz, Seqafetul tifil, Ç êkê ÇP.Dar El-Fîkir, Urdin, 2004., S.348.
104 - Bin Mesad Qedur, Edebul Atfal-Dîrasetun fîl-Mezamîn Ecemaliye, Rîsalet Diktora, Kuliyet Adab-Qisim E-Luxel Erebiye, Cezaîr, 2-15-2016., S.64.

Kesatî û qaremanên van çîrokan giyanewer û balinde û dar û dirextin, bi taybetî jî ew giyanewer têda di hêne bikarînan yên li derdorên zaroyan di jîn bi taybet yên kehî mina: (Mirîşk, Ga, Hesp û ....) di edebê cîhanîde çîrokên (lavontîn) nimûne li ser vî corî, dîsan çîrokên (Kilîle û Dumne).

5-Çîrokên Qaremanî û Muxameratan: Zîrekî û qaremanî û rûdanên bi metirsî yên kes û qareman pê radibin naveroka van çîrokane. Hinek ji van çîrokan jîwarîne û hinek jî di xeyalîne, wekî çîrokên polîsî evên lipey dizan digerin, gelek ji van çîrokan zîrekî û xoragriyê li dev zaroyan peyda diken lê hinek caran rûdanên bi tirs û kuştinê di navde hene lewa bi xirabî kartêkirinê li zaroyan di ken.

5-Çîrokên Xeyala Zanistî: Şêwazê van çîrokan li ser çend teweran radwestît: (Xeyala zanistî ya Fêrkirinê) ku mebest pê gehandina pêzanînêye bi şêwekê dilrakêş. (Xeyala dîtir ya Zanistî ya Efsaney) çu mifayekî nagehînîte zaroyan. (Xeyala dî ya zanistî ya fintaziye ku lser hinek fereziyatên xeyalî radiwestît mîna hebûna hinek giyandarên dîtir li extereka dî. (xeyala zanistî ya dahatî) bo zaroyan ji hemiya bi mifatire.[105]

6-Çîrokên Mêjûyî: Rûdana van çîrokan vegêrana wan serhatiyane yên ji jiywarê mirovatiyê dihêne wergirtin, qaremanên wan jî her ji kesatî û qaremanên nîşitmanî yên welatîne ku rolekê baş hebûye di mêjûa miletê xweda. Mebest bi van çîrokan danenyasîna kes û qaremanên miletî û jiyan û serhatiyên civakiye bo zaroyan, lê zaro gelek hez ji vî corî naken çunkî xeyal têda nahête bikarînan wekî pêdivî. wekî mînak lser êk ji corên van çîrokan (çîroka hevalên şkeftê)[106] ku êk ji çîrokên mêjûye û di qurana pîrozda jî hatiye vegêran û serhatiya çîrokê bi vî rengiye:

(Çîroka Hevalên Şkeftê)

---

105 - Fazil 'Ebbasul Ke'bî, El-Medaxiul Terbewiye We Murtekezat E-Tecanus El-Me'rîfî fî Seqafetul-Etfal,Çp.1, Bexda,1999., S.204-205.

106-'Umer Duhokî , Ko.Zeng û Beng, J(150) Çp. Hawar,Duhok,Tîrmeha (2016),R.3.

('Umer Duhokî)

( Di ser demê kevinda paşayekê romanî hebû gelekê zordar bû, hemî rojan ji heftiyê xelk kom dibûn û methên vî paşayî dikirin, carekê demê vî paşayî xelk komkirî û her êkê hatî methên paşayî kirîn, dora gencekî hat û ewî gencî rastiya wî paşayî diyarkir û gotê: Tu yê zordarî û divêt tu baweriyê bi xudê mezin bînî û şeş gencên dî jî digel vî gencî ev daxwaziye kir. paşayî biryarda evan kesan zîndan biket û bi her rengekê hebît evan kesan pîlanek dana û xwe ji zîndanê rizgarkir û bereb şkeftêve çûn ew şkefte di nukeda li welatê (Urdinê)ye. Mane di şkeftêve û birsî bûn, lê xudayê mezin xewek bi serda îna û nêzîkî (360) salan mane nivistî û piştî ew sal borîn ji wê xewa dirêj hişyarbûn û her êkî pirsyar ji êkê dî di kir û gotê: Eve çende em nivistîn? Gotin: Eve rojeke yan danekê rojêye. Belê zaroyên xoştivî eve wê nîşa me didet ku jiyan ya kurte û bila em guhdarbîn bû fermanên xudê û ji kesê netirsîn ji bilî xudê çunkî tirsa xudê êmnahî û xoşiye bo mirovî..)

## Gotar

Hunerekê edebiye, di rojnamevaniyêda bi şêweyekê giştî dihête bikarînan, anku di rojnamevaniya mezin û zaroyanda dihête bikarînan. Belê ew gotara ji aliyê zaroyanve dihête nivîsîn û her bo zaroyan jî dihête arastekirin ya cudaye ji wê ya bo mezinan dihête nivîsîn.

Gotara Zaroyan: ( Qalibekê diyarkirî yê derbrînêye, çu roxsarekê dest nîşankirî yê edebî jî nîne, wekî heval digel hevalên xo daxvît û bi rengekê aram û bilez hizirê yan pêzanînê di gehînîte wan û wesa didete diyarkirin her wekî peywendiyeka germ û gor ya kevin nivîserî û zaroyan pêkve girêdidet.)[107]

Gotar divêt bi berahiyeka wesa dest pêbiket ku hestên xwandevanî bereb xweve rabikêşît, ji xefleta wî hişyar biket da digel nivîserî pişikdariyê

---

107 -'Umer Dihokî, Çîroka (Hevalên Şkeftê), Ko.Zeng û Beng, j(150) Çp.Hawar, Duhok, Tîrmeha 2016, R3.

di şarezayên wîda biket, belkî digel xwe di cîhana xeyalanda bigêrînît, yan jî dibît ew û xwandevan herdû pêkve li rolê hîkmê bigerin, belê bi çu rengekê hebît nabît nivîserê gotarê xwandevanî bi azirînît.)[108] Şêwazê gotarê yê bi sanahî û bê girêke, (Dîfu) ku êk ji wan nivîserên gotarê bû yên zaroyan gelek gotarên wî di xwandin dibêjît: ( Eger kesek pirsyara şêwazê min biket yê ez pê dinivîsim, dê bêjme wan eger ez bi wî şêwazê xwe digel pênç hizar kesan yên hêza wan ya aqlî jêkcudabît – Yên şêt tênebin – baxvim hemî dê di min gehin ka ez çi dibêjmê wan.)[109]

Hunerê gotarê dibîte çend corên cuda, gotar heye bi navê (Gotarên Danpêdanê) naveroka wana rûdan û Xewatir û Suhbetin ku lidev zaroyan di giringn. Gotar jî hene bi navê (Gotarên Rexneyî) û bi Karîkaturan jî dihêne niyasîn û têgehên diyarkirî bercste diket û ji saxletên vî corê gotarê ewe ku dil rakêş û lezgîn û mijulyêye. Herwesa (Gotara Zanistî) heye û kersteyê wê ji zanistên cuda cuda dihête wergirtin, divan gotarande zaro wan hizir û rastiyan dibînin yên zanîn û şarezayên wan yên zanistî û jiyanê zêde diken.

Gotarên Edebî jî hene ku hemî corên cuda yên edebê zaroyan çareser diket, harîkar û piştevane ku xeyala zaroy geşeyê bêxîte têde û hêza têbîniy û dahênanê jî lidev zaroyan bi hêzbêxît.

(Pêdviyên Leşî)[110] **g**otareka zanistiye di kovara (Pepûle) ya zaroyande hatiye belavkirin û bi vî rengiye:

(Herwekî ka çewa Firoke û tirumbêl û Papor û gelek tiştên dîtir, heta ku karibiken pêdvî bi benzîn û gazwaylê heye, iha bi wî rengî mirovî jî rojane pêdvî bi (425) şeşpaloyên heway û çend lîtrên avê heye. Herwesa pêdvî bi xwarinên cora û cor heye ku rêja pêdvî ji fîtamînan û keristên kanzî wekî:

---

108 - Muhemed 'Ebdilrezaq Îbrahîm, - Hanî Muhemed Yunis - Wehîd Elseyd hafiz, Seqafetul tifil, Ç êkê ÇP.Dar El-Fîkir, Urdin, 2004., S.135.
109 - Îbrahîm Îmam, Dîrasatun fîl Fen Esuhufî, , Mektebet Înclu El-Msirye, Qahîre,1971,S.185. 110 - Hadî Nu'man Hîtî, Edebul Etfal-Felsefetuhu- Finunuhu -Wesaîtuhu, ÇP.Dar Al-Huriye lîltîbae, bexda, 1977., S.257-258.

Fisfor, Asin, Kalsiyom, Naytrocîn û Haydrocîn têda bît. Eve û jbilî wê divêt rojane xwê û pêkhatên wê bi hêne xwarin.. Eger hat û rojane ew xwarin kêm hatine xwarin, li wî demî dê leş tûşî bêhêziyê bît û paşî dê tûşî nexoşiyan bît.. Jiber hindê divêt rojane rêja timam û pêdvî ya xwarnê bixoyn û oksicîna paqij helbikêşîn da saxlemiya me ya başbît.)

Belê hinekên dî corên gotarê bi vî rengî rêzkrîne(111): Gotarên serekiyan di bêjnê (Sergotar) ku ev corê gotarê bara pitir ji aliyê Ssernivîser yan xwediyê kovarêve dihête nivîsîn û hizirek yan boçûneke divêt bigehînîte xwandevanê kovara xwe. Corekê dî jî heye dibêjnê (Bîrhatinên Rojane) zaro hez ji gotarên ji vî rengî jî diken çunkî serborên cuda û bi rûdanên cudave guh lêdibin.

## Berîkane û Pêşbirki

Berîkane êk ji giringtirîn û karîgertirîn rêk û mîkanizme ku nivîserên kovarên zaroyan bikardînin jibo rakêşana hez û viyan û dilê zaroyan bo kovara xwe. Helbet di gelek kovaranda û bi taybet evên ji aliyê kompaniyên bazirganîve dihêne vekirin van core berîkaneyan bi harîkarî û siponseriya hinek kompaniyan vediken û mebesta wan encamdana rîklamêye bo wê kompaniyê anku mifayekê bazirganiye, ya dîtir jî xwandevanî bo kovara xwe, mîna kovara (Zeng û Beng) (112) bi sponseriya kompaniya (Space toon- Duhok) berîkanek li ser bergê dawyê yê kovara xwe vekr bû û nivîsiye: (Berîkana Hijmarê – kîşk çiyayê kurdistanêye navê wî di Qurananêde hatî? bersivê firêken bo vê jimarê- jimar telefunê- sê serkevtî dê hêne xelatkirin ji aliyê kompaniya spêstûn ve).

---

111 - Ko.Pepûle, J(48), Çp.Ufêstî Dilêr, Silêmanî, Çiriya êkê, sala 2001, R12.
112 - Şu'eyb xebaşî, Sehafetul-Etfal fîl Wetenul'Erebî, ÇP. Al'alem El'Erebî, Qahîre, 2002. , S.286-300.

## Helbest

( Alînûr Farciyun) di pênaseya helbestêde dibêjît: (Helbest ne gule, belkî bêhna gulêye. Ne Deryaye, belkî dengê Deryaye)[113]. Zaro bi fîtireta xwe hez ji awaz û îqa'a diken, diber awazên stiranên deykên xwera dinivin, her dengekî bikevte ber guhên wan bizavê diken wekî awazekî wergirin û tam û xweşiyekê jê wergirin.[114] herdîsan di vêt bizanîn ku ew awaz û îqa'a di helbest û sirodan de hey û di gel (Reng, Ronahî, Deng, Bizavê)[115] pênc pêkhatên ciwanyêne yên perwerdeya zaroyan bi cîhanêve grêdiden.

Helbesta zaroyan: (Rengeke ji rengên edebî, xweşî û mijûlî û keyfê bo zaroyên xwandevan peyda diket, şarezayî û serborên perwerdeyî yên guncayî bixweve digrît û digel wan layên siroştî evên digel hezên zaroyan rêk dikevît mîna livîn û çalakiyên bi îqa' û muzîk û awaz têde hebin di guncît û di bîte helbesta çîrokî û şanoyî û zarvekirinê.)[116]

Helbestên zaroyan pişkek ji pêdviyên leşî û hestan yên zaroyan dabîndiket, zêdebarî ku harîkar û piştevane jibo geşekirina wan ya edebî û derûnî û civakî û rewiştî û aqlî. Kesên taybetmend di vî bwarîde mîna (Necîb Geylanî)[117] hinek saxlet û taybetmendî diyarkirîne ku divêt di sirod û helbestên zaroyanda hebin heta kartêkirina xwe bi ket û zaro hest bi xweşî û tama wê biken:

- Divêt Helbestvan yê huşyarî zimanê helbesta xwe bît ji aliyê peyv û riste û wêneyanve.
- Giringiyê bi wan behrên helbestê bidet yên bo zaroyan dilrakêş û xweş bin.
- Raman û Hizirên helbestê bi sanahî bin û girêk têde nebît.

---

113 -Farûq Sellum, Aşî`rwel-Atfal, Ko.Aseqafel Ecnebiye, J.3, 1985, R.63-64. 114 - Ko.Zeng û Beng, j(138) Çp. Hawar, Duhok, Temmuza 2015, B.dûmahiyê.
115 -'Ebdilfetah Ebu Me'al, Edebul Etfal -Dîrase We Tetibîq, Dar Şiruq Lîneşir wetewzî'a, ÇP2 ,Urdin, 1988., S.99.
116 -Wefa Îbrahîm, El-We'î Ecemalî 'Înde Etifil, Mektebet Îskenderiye, Misir, 1997, S.21 117 - Hesen Şehate, Edeb Etifl 'Erebî – Dîrasat we Buhus, S.221-222.

- Ji hunerê rewanbêjiyê dûr bikevît.

- Babetekê guncayî zaroyan hel bijêrît.

- Ew biha û rewiştên di helbestêda heyn divêt digel bîr û bawer û 'Eqîdeya zaroyan biguncît.

- Dîtin û berêxwedanek bo arîşeyên rewiştî û derûnî û perwerdeyî yên zaroyan hebît.

- Êk serwa û qafiyh hebît, kartêkirineka kûr li derûn û wijdana zaroyan biket.

Dîsa (Muhemed Reşîd Fetah)[118] wesa dibînît ku pêdviye helbesta zaroyan: (Wişekanî sadebin û ristekan rewan bin, ta mindal bitwanêt le berîbikat, pêwîste kêşeyekî kurt û awazedar bêt, çunke kêşey dirêj ebête hoy henase swarbûnî minal û ebêt her dêre le helbesteke lengerî taybetî xoy ciyabêt, weta le twanada bêt nawerok û mebestî helbest bekemtirîn dêr bidrêt be destewe.)

Wekî mînak li ser helbestên zaroyan yên di kovarên zaroyande li herêma kurdistanê belavebûyn helbesta (Daholl – Helamet)[119]

(Dahol)

(Awat Nesreddîn)

Eyi daholî naw bîstan
Pasewanî bê ziyan
Nehêllî ballindekan
Ziyan den le cutyaran
***
Pel biculêne .. adey
Xo azarî kes nadey Ba
baldarekan raken
Genim û cokan ballaken
***

118 - Necîb Geylanî, Edeb Etifil fî Zewa El-Îslam, S.89-90.

119 - Muhemed Reşîd Fetah, Edebî Minalan û Nimune Lêkolînewe le Edebî Minalanî Kurd, , ÇP.Raperîn, Silêmanî, 1974, R.22.

Cesteyekî bê giyanî
Sûd bexş û bê ziyanî
Bo xawen xele û xerman
Başitirîn pasewanî

Di helbesta serîda serwayeka bi sanahî hatiye bikarînan, peyvên wê ewin yên bo zaroyan dibernyas, rewanbêjî û alozî têda nehatiye bikarînan, û hizireka ron û aşkera têdaheye ku (Dahol)helamet derametî ji balindeyan diparêzît. Dîsan pişkeke ji kelturê miletê kurd ew jî bikarînana helametan bû li nav rez û bîstanan.

Di serbora helbestên zaroyande li herêma kurdistanê û bi taybetî li parêzgeha dihukê dû helbestvan berçav dibin ku xudanên berhemekê zor yê helbestên zaroyane û gelek ji helbestên wan hatîne belavkirin di rojname û kovarande û hinek jî di dîwanên taybetda hatîne belavkirin.

Helbestvan (Muhemed Salih Hecî)[120] bernyas bi (Babê Şilovê) êkem helbesta xwe ya taybet bi zaroyanve bi navê ( zaroyê zîrek)[121] belavkriye, helbesteka wê bi navê (zimanê kurdî) di pertûka ziman û edebê kurdî ya pula çarê bineretî li parêzgeha duhokê hatiye bikarînn)[122]. Eve jî helbesta wî ya êkê ya zaroyane:

Zaroyê Zîrek
Bo te ji nik min silavan Di
gel hindek gulavan
Zaroyê zîx û hişyar
Van şîretan bike kar
Xwandingeha zanînê
Fere hemi biçînê

---

120 - Helbestvan ( Muhemmed Salih Hecî sala (1962) ji Daykbûye li Parêzgeha Duhokê, Nuke dû dîwanên helbestên zaroyan çapkirîne, (Awazên Pişkojan -1) li sala 2010, û (Awazên Bilbilan – 2) li sala 2016 hatiye çapkirin.
121 - Ro.Resen, J(50)Çp.Xanî,Duhok, dûşembî 24-11-1997,R.8.
122 - Didareka Taybet di digel helbestvan (Mihemed Salih Hecî) li Roja Sê Şembi 16-8-2017.

Zanîn rê û ronahiye

Nezanîn her tariye

Çi bi çînî dê her helînî

Başiyê bike dê bînî

Here mirovê gunehkar

Dê guneh bo bine yar

Helbestvanê duwê ku berhemekê diyar û mezin di biwarê helbesta zaroyande nivîsiye û pêşkêşî zaroyên kurdistanê kiriye, helbestvan (Muhemed Emîn Fetah)e [(123)] berniyase bi ( Muhemed Emîn Doskî).

Êkem helbesta xwe ya taybet û berniyas bi zaroyanev bi navê (Çîçka Serê Darê)[(124)] nivîsiye ku heta çend salekan jî piştî nivîsîna wê ev helbeste li ser ezmanê mezin û biçûkan bû, eve jî helbesta wî ya êkêye:

(Çîçka Serê Darê)

Çîçka serê darê

Bixîne evê carê Bo

evîna welatî Tu

roja nî helatî

Welatê min ciwane

Navê wê kurdistane

Ez zarokê kurdanim

Bo welatî bi viyanim

Şev û roja dixînim

---

123 -Helbestvan (Muhemed Emîn Doskî) ji daykbûyê sala (1957) ye li parêzgeha Duhokê, Sê Dîwanên Helbestên Zaroyan Çapkrîne, (Stiranêt kulîlkan) li sala 2004, dîwana (Awazêt Bilbilan) û (stêrîn) Çapkrîne.

124 - Di dîdareka Taybetda li roja Pênç Şembî (17-8-2017) di gel Helbestvan ( Muhemmed Emîn Doskî) diyarkir ku eve êkem helbesta wî ya zaroyane nivîsî, belê piştrast nekir ka bi durstî kengî nivîsiye û bitenê gotî li sala 1998 hatiye nivîsîn û li televzyona Duhok bûye stiran û hatibû wênekirin.

Da azadiyê bibînim

Welatî rizgarbikem

Ala xo bilindbikem

## Dan û Standinên Rojnamevanî

Mirovan bi şêweyekê giştî gelek hez li ser hindê heye ku tiştekî ji jiyan û serubera wan kesan bizanît yên lidev wî di giring yan gelek hez jêdiket, zaroyan pitirî mezinan ev heze heye. Herdem hezdiken tiştekî ji wan bizanin yên wekî çavlêker bo xwe jêgirtîn, her jiber heza aşkerakirin û zanînê gelek caran zaroyan guhên xwe yên dayne dergeh û dîwaran yan di kunên pençer û dergehanra viyaye tşitekî bizanin.

Hunerê (Dan û Standina Rojnamvanî) li çerxê 19 di mêjuwa rojnamevanî de derkevtiye û li çerxê 20 bi rengekê berfireh hatiye bikarînan.

Dihête nasîn ku: (Hunereke ji hunerên rojnamevanî, nivîser daxwaza çavpêkevtinekê digel kesatiyeka giring diket jibo bi destveînana hinek pêzanînan lidor babetek ji babetan yan nasîna kesatiyekê û ka çu core çalakiyan encam didet.)[125] yan jî dibêjnê : ( Dan û Standineke dinavbera dû kesan yan pitir de jibo hindê ku bi gehne çend rastiyekan lidor babetekê destnîşankirî.)

Mebest ji Dan û Standinê ewe ku rêk û mîkanîzimeke ji gelek mîkanîzmên dîtir Jibo çareserkirina arîşe û aloziyane dinavbera kesên di jîngehêkêde kardiken, yan li êk cih kardiken û mebest û xemên wan êkin, yan jî mebest pê danenyasîna kesên navdar û dahêner û xudan şiyane jibo zaroyan da li paşerojê çav lêbiken. Herwesa perwerdekirin û çandin û belavkirina rewişt û binemayên çakî û başiyê li dev zaroyan êk ji armancên here giringe yên Dan û Standina rojnamevanî bi taybet demê digel rêber û

---

125 -Awat Nesreddîn, Ko.Pepûle, j(48) Çp. Ufêstî, Dilêr, Silêmani, Çiriyaêkê, sala 2001.R.10.

berniyasên miletî dihêne kirin. Dan û standina serkevtî û balkêş bo xwandevanan ewe eva germ û gur bît, yan bêjîn hizrên nû têde hebin û ji pend û şîretên rastewxo bihên vavartin, bi şêweyekê wênedar derbirîn ji kesatiyê bi hêtekirin her wekî zaroyê xwandevan yê xwe beranberî axvtinikerî dibînît.

Dîsan eve jî hinek ji regezên dan û standina rojnamevanî ya serkevtîne mîna:

1- Bi şêwazê xwe yê taybet divêt nivîser kartêkirinê li wî kesî biket yê dan û standinê digel diket.

2- Nivîser xwe bidanît cihê xwandevanî û ji nû pirsyaran arastey wî biket da bizanît xwandevanan çu jêdivêt.

3- Bila wan pirsyaran biket yên giring û bila arasteya dan û standinê neguhurît.

4- Berî dan û standinê biket, fere wî kesî bi bînît û agehdarî cor û şêweyê pirsyaran bît.

5- Xwe berhevkirina berwext bo dan û standinê ji hemî aliyekêve.

Corên dan û standina rojnamevanî di kovarên zaroyanda: 1-

Dan û standinên helkevtan:

2- Dan û standinên kesî:

3- dan wstandinên pêzanînan:

4- Dan û standinên rastî û deng û basan: 5-

Dan û standinên komî:

6- Dan û standinên Tirane û Mijulyan. 7-

Dan û standinên kungireyan:

## Alugorî Di Gel Xwandevanan

Bi hêztirîn xala kovara yan her dezgehekê dîtir yê ragehandinê ewe demê dikarît peywendiyeka berdewam û bê veqetiyan dinavbera xwe û

xwandevanên xweda peydadiken. Lipey teknelojiya evro mîna (Feysbûk, Mesincer, Cîmayl û Îmêl ..) û gelekên dîtir peydabûyn, rêkên gehandin û gehiştin û peywendiyê jî bi sanahî kevtîne, xwandevanên kovarên zaroyan jî evro gelek bi sanahî dikarin peywendiyê bi kovarên xwere biken û bîr û boçûn û berhem û daxwazî û pişkdariyên xwe bi gehîne wan cihan.

Name û berhemên xwandevanan deynamoyê kovarane, wekî wê avêye eva dar û baran av didet û şîn diket, û ka çewa eger av li ser dar û dirextan bihête girtin dê hişkbin, bi heman şêwe eger name û berhemên xwandevanan negehne kovarê ew kovar dê rawestît.

(Zaro hemî nihêniyên xwe digel kovarên xwe derdêxin û hemî babetan digel gengeşe diken mina: Babetên ayînî û perwerdeyî û peywendiyên dinavbera mezin û zaroyande heyn, her çewa bît ew xwandevanên di berhevbin wê zehmetê biben û nameyan bo kovarên xwe binvîsin, eve belgeye li ser wê çendê ku ewan zaroyan heza aşkrakirin û duvçûn û pirsyarkirinê heye.)[126]

Bo nimûne di govara (Sivore)[127] de goşek hebû bi navê (Berhemên Zaroyan) di vê goşeyêda ew berhemên zaro dinivîsin bo kovarê bi rêka nameyan yan êmêl û cêmêlan dihinêrin dihêne belavkirin, û her êk ji wan jî navê wan li beranberî berhemê wan di hête danan. Li serê wî berperî kovarê nivîsiye: (Zarokên xoştivî…car car dê berperekê kovara sivore terxankeyn bo berhemên hewe ji: parçe hozan, û pexşan û nivîsînan….).

Dîsan her heman kovar goşek bi navê (Hevnasîn) heye û li ser bergê berî dûmahîkêye û wêneyên zaroyan tê de di hêne belavkirin û di her jimarekêde çend wênekên rengîn yên zaroyan di hêne belavkirin.

---

126 - Macîde Lutfî El-Seyd, Teqeniyat El-Î'lam Eterbewî we Te'lîmî, S.228. 127- Ko.Sivore, j(30)Çp.Xanî, Duhok, kanûna dwê, sala 2001, R.11.

Navên cuda cuda bo vê goşeyê di kovaranda hatîne bikarînan mîna: (Hevalên Kovarê, Ji Hewe bo Hewe, Ji Pênivîsên Hewe, Nameyên Xwandevanan û ....).

Di gelek kovarên zaroyande goşa hevnasînê heye û zaro nav û wêne û edrês û hez û arezûyên xwe bo kovaran di hinêrin û her zaroyekê bi vêt û li her welatekê hebît dikarît pişkdariyê têda biket û mebest pê ewe da hevnasîn di navbera zaroyanda peyda bibît her wekî berî niha me behskirî.[128]

Çend zaro pişkdarî û peywendiyê bi kovar û rojnameyên xweve bi ken, pitir delîve bo wan peyda dibît ku derbrînê ji hez û hîvî û daxwaziyên xwe biken, û her ji ber vê çendê jî û ji ber giringiya van core goşeyan ji aliyê perwerdeyî û edebî û hunerîve geleka fere hinek rojname û kovar hebin ku her ji aliyê zaroyan bi xweve derbiçn, mina welatê Urdinê ku li sala 1994 êkem kovara zaroyan li ser astê welatên 'Erebî ku ji aliyê zaroyan bi xweve bi navê ( El Katib El Sexîr- Nivîserê Biçûk) derêxistî û serinvîserê wê ( muhemed xuşe - 22salî) bû û nivîserên dîtir jî zaro bûn û harîkariya wî dikir.

## Wêne û Resim

Dema zaro berperê her rojname û kovarekê vediden, tiştê ji hemiyan berçavtir û serinc rakêşitir bo wana wêne û wêneyên karîkaturî û resmin, lewa hemî kovar gelek li ser hindê di hişyarin ku li hemî jimarên xwe wêne û karîkatur û resman belavebiken.

Milêcî wesa dibînît ku: Resim derbirînê ji naxê zaroyan diket li qonaxên cuda cuda yên jiyê wan, belê pitirya wan xwandinên li ser resmên zaroyan hatîne kirin wesa di dene diyarkirin ku demê zaro resman çêdiken di kevne di hinek şaşyanda. Mewahib Ebad di bêjît: Ew xwandin û vekolînên li ser resmên zaroyan hatînekirin wesa xweyakiriye ku resmên

128 - Fîlîb Buşar, Cimhur El-Etfal, Tr. Muhemed Enwer El-Henawî, S.35.

zaroyên jiyê wan dibin (4) salyêda geleka bi zehmete bihêne şirovekirin, belê yên jiyê wan di ser 4 salî û 9 salyêde resmên wan bi sanahî di hêne xwndin û ji hîma û nîşanên zarokîniyê dihete hijmartin.[129]

Wêne bitenê jibo hindê nahête bikarînan da derhênana hunerî ya wê kovarê durstibît, nexêr.. Wêne bi xwe babetekê rojnamevanî yê zîndiye û bihayekê mezin yê ciwaniyê û rewşenbîriyeka berkevtî heye.[130]

Her wêneyekê bihête belavkirin pêdivî bi çend peyivekan heye digel bihêne nivîsîn, çunkî nivîsîn digel wêneyî mifayekê baş digehînîte zaroyan û ew hizir û ramana zaro neşyayi ji wêneyi werbigirît ji peyivan werdgrît û peyv û nivîsîn herdû pêkve zimanekê nû pîkdînin û di bîte şêwazek ji şêwazên derbrînê, bivê çendê jî wêne û dil û çavên zaroyan bo layê xwe radikêşn û ramanên perwerdeyî û geşekirina xeyalî têde heye, û piştevaniya zaroyan diket jibo hizirkirin û dahênanê di qunaxên cuda yên jiyê zaroyande.

## Duvçûna Rojnamevanî

Êk ji saxletên siroştî yên zaroyan pirsyarkirine li ser gelek ji wan rûdanên di nav civakê û derdorên wande rûdiden, û her rûdaneka wan guh lêdibît, yan bibînin her dûmahiyî pirsiyaran li ser diken. Evca jiyana mirovan jî ya pirî rûdane, belê gelek ruyên wan rûdanan li cem zaroyan di berze û veşartîne, yan jî di alozin û bo zaroyan bi zehmete têbigehin. Peyrew û programên qutabxaneyan jî wesa di dewlemend û giştgîr nînin ku bersiva wan hemî pirsyarên wan bi den, lewa duvçuna rojnamevanî wekî êk ji rengên şirovekirina rûdanan û egerên peydabûna wan rûdanan û kesên pişkdarî têda kirî di rojnamevaniya zaroyanda derkevt.

---

129 - Ainud Seaîd Salih, Faaliyet Îstîxdam Qîsesul Etfal kemesder Lîteabîrul Fenî fî Tenmiyet Meharatu Tefkîrul Îbdaî leda Tifil qeblel Medrese, Nameya Mastrê, zanîngeha Umul Qura, Saudiye,2007, R.63.

130 - Muhemed El-Hedîdî, Îstixdamat Mecelatull-Etfal, Dîrase Cam'eye, 1977.

Anku duvçûna rojnamevanî: (Ravekirineka civakiye bo rûdanan û şirovekirneka derûniye bo wan kesên pişkdarî di rûdanêda kirî yan rûdan çêkirî yan dîtî.)(131)

Dû corên serekî yên duvçûna rojnamevanî hene:

1- Duvçûna rojnamevanî ya bi hurî, şengsteyê wê peyvên nivîsîne, û ji nû kersteyê wênedar (Wêne û Resim û nexşeyên Ronkirnê) harîkariya wê nivîsînê diken.

2- Duvçûna rojnamevanî ya wênedar, eve berovajî ya êkêye û kerstê wê yê serekî wêneye û ji nû nivîsîn harîkariya wê diket.

Ji saxletên duvçûna rojnamevanî ya serkevtî:

1- Eger hevber bikeyin digel hunerên dîtir yên rojnamevaniya zaroyan, duvçûna rojnamevanî pitir cihî li ser berperî di girît, û pitir dem jî bi berhevkirina wêve diçît.

2- Pêdivî pitir şiyanên diraviye, çunkî wesa serederî digel dihêtekirin ku hunerkê berkevtiye.

3- Şarazatirîn nivîser bi berhevkirin û duvçûna rojnamevanî radibin, çunkî berhevkirina duvçûneka serkevtî ji aloztirîn çarçoveya nivîsîna rojnamevaniye.(132)

4- Divêt gelek wêneyên zelal wekî belge digel duvçûna rojnamevanî hebin.

5- Dupatî li kêşeyên mirovatî bihête kirin.

6- Giringîdan bi jîwarî û dûrkevtin ji xeyalê hindî şiyan hebin.(133)

---

131 - Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011. ,S.139.

132 - Macîde Lutfî Seyd, Teqeniyetul-Î'alamu-Terbewî We-Te'lîmî, Dar Usame lîl-Neşir Wel-Tewzî,Urdin,2011., S.228., S 218.

133 - Macîde Lutfî Seyd, Teqeniyetul-Î'alamu-Terbewî We-Te'lîmî, Dar Usame lîl-Neşir Wel-Tewzî,Urdin,2011.226.

## 3. Asteng û Aloziyên Rojnamevaniya Zaroyan

1- Pitiriya wan rojname û kovarên zaroyan evên li welatên derdorên me derdikevin wekî yên welatên Îslamî û 'Erebî yan jî evên li Herêma Kurdistanê bixwe jî derdikevin li ser bergê wan nehatiye nivîsîn ka eve bo zaroyên kîş qunaxêye. Mîna: kovara (Svore) li ser hatiye nivîsîn ( Kovareka Zarokan ya Heyivaneye), li ser bergê kovara (Pepûle) hatiye nivîsîn (Kovarêkî Roşinbîrî- Perwerdeyî Mindalane), di kovara (Zeng û Beng)de hatiye nivîsîn (kovareka Heyvane ya Zarokane), di kovara (Cigerkoşekan)de hatiye nivîsîn ( Kovarêkî Perwerdeyî Manganeyi Mindalane).

2- Kêmiya ewan kesên şareza û bispor, û kêmiya dezgehên taybetmend bi zaroyanve evên bişên lipey hinek pirenisîbên perwerdeyî kovaran derbêxin.

3- Rojnamevaniya taybetmend yan bi êkcarî nîne yan jî eger hebît geleka kême, û bi taybet li herêma kurdistanê ev corê rojnamevaniyê her diyarnabît, anku pitiriya rojnamevaniya zaroyan ya giştiye.

4- Lawazî û sistiya kenalên belavkirina van rojname û kovaran bi taybet bo cihên derveyi bajêran.

5- Hevsengî di belavkirina babetanda nîne, cara hey çîrok yan helbest yan gotar ya zalbûye li ser berperên kovaran eve jî dibîte egerê peydabûna perîşanî û xaviyê bo zaroyan.

6- Lawaziya astê derhênana hunerî bi taybetî li wan kovarên arîşên darayî hey.

7- Wekî çavlêkirin li hinek kovarên biyanî gelek ji kovarên me yên zaroyan hinek babet û kersteyan belave diken ku digel rewişt û bihayên civakî û ayînî yê zaroyên me naguncît.

8- Dîsan ji berku kovar yan rojname ji aliyê kesan yan dezgehekê bisporve dernakevît, bûye egerê hindê ji aliyê zimanî û rênvîsêve jî

lawazî û sistî kevtibîtê, û nebûna zimanekê êkgirtî mezintirîn lawaziye.

9- Kêmiya daneyên jimarên dihêne çapkirin û belavkirin, egerê vê jî bo gelek ji wan egerên me li ser diyarkirîn dizivrît.

## 4.DERHÊNANA HONERÎ DI ROJNAMEVANIYA ZAROYANDE

Her çende Rojnamevanî bi şêweyekê giştî berî sê çar çerxan derkevtiye, lê regezê derhênana hunerî di rojnamevaniyêd gelek ji mêje nîne peydabûy, anku berî çerxekî serhildaye. Berahiyê rojname û kovarên derdikevtin bitenê wekî hinek belavokên bazirganî bûn û bo texeka diyarkrî dihate arastekirin û ew kesên bi derêxistina wan rojname û kovaran radibûn bitenê mebesta wan belavkirina keresteyê nivîsînê bû liser berperan bê ku giringiya wê nivîsînê û armanc ji her nvîsînekê bizanin. Mebesta wan kesan bitenê ewbû nivîsînê li ser berperan belavebiken û çu valatî nemînît, belê li dawiya çerxê hevdê û destpêka çerxê hejdê û di gel pêşkevtina amîrên çapkirin û kaxez û hubrî û wêneyan û teknelojiya veguhastinê û amîrên derhênan û kumpiyoterî û çêkirina kahrebê û amîrên mîkanîkî û elîktirunî van hemiyan rojnamevanî veguhaste di qunaxeka dîtir û xwandevanê wê zêdetir lêkir û armanc û mebestên derkevtina wan rojname û kovaran jî hatine guhartin.(134)

Ew kesê karê derhênana hunerî ya rojname û kovaran radibît dibêjnê (Derhênerê Rojnamevanî) yan (Derhênerê Hunerî) û ev keseye yê keresteyê nivîsînê yê hişk û nelivok, livîn û balkêşiyê didetê û berperên rojname û kovaran wekî kevalekê ciwan û bi raman û xudan kesatî lêdket.(135)

### Têgeh û Pênaseya Derhênana Hunerî

---

134 - Malpera: Mewsû'et Ete'lîm Wetedrîb, Muna Se'dî, 2-12-2009. 135- Hadî Nu'man Hîtî, Çavkaniya berk, S.261.

Derhênana hunerî dihête niyasîn bi: (Hunerê berçavkirin û pêşkêşkirina keristeyê nivîsinê bi rengekê wesa ku di êk demda herdû mebestên ciwaniyê û erkî bicihbînît, çunkî ew bizavê diket ku xwandevanî ber bi wî keristeyê nivîsînê bi şêweyekê sanahî û bi tam û bi rengekê ciwan û balkêş dikêşêt, anku em dikarîn bêjîn kakilka erkê derhênana hunerî di rojnamevaniyêde bi sanahîkirina nivîsînê û rakêşana çavên xwandevaniye bo ewê nivîsîna li ser berperên rojname û kovaran hey.)(136)

Dîsan hatiye pênasekirin ku: ( Nexşekêşaneke jibo berperên her rojname yan kovarekê û belavkirina keristeyê wêye, anku bi ramaneka dîtir derhênana hunerî.. berçavkirina wî keristeye yê bo wê rojnameyê yan kovarê bi şêwazekê êklayî û dawî hatiye berhevkirin digel berçav wergirtina binema û şengisteyên rojnamevanî û hunerî yên xwandevanî dikene armanca xwe ya serekî û xwandinê bo bi sanahî di êxît û naverokê bo ron û aşkera diket.)(137)

Herwesa hatiye niyasîn ku : ( Derhênana hunerî “layowt” zanist û hunere. û ya taybete bi veguhastina keristeyê nivîsî bo kersteyekê çapkirî yê berhevkirî bo xwandinê û wî erkî binecihbiket yê derhênerî mebest pê hey, yan bi rengekê dîtir bêjîn: Derhênana hunerî taybetmende bi belavkirina yekeyên çapkirî "Taypographic Units" ( Pît, Manşêt, Têkst û Wêne û Resim û Nexşe) û rêkxistina wan yekeyan li ser berperên rojnamê yan kovarê û helbijartina rengên wan yekeyan bi rengekê wesa ku xwandevanî bo layê xwe rabikêşît û berê wî bidete naveroka wê.)(138)

## Armanc û Mebestên Derhênana Hunerî

1-Derhênana hunerî çu di rojnamevaniya zaroyanda bit yan mezinan mebest û taybetmendiyên xwe hene, belê di rojnamevaniya zaroyanda tam

---

136 -Malperê: Ko.El-Zewra, J(6597), Bexda. 19 Tîrmeha 2017.
137 -Malperê: Munteda El-Î'lam El-Terbewî, Pênç Şembî 8-12-2011. 138 -Malpera: Mewsû'et Ete'lîm Wetedrîb, Muna Se'dî, 2-12-2009.

û taybetmendiyeka cuda heye çunkî texa bo dihête arastekirin jî taybetmendiya xwe ya 'Eqlî û 'Emrî jî heye. Her çewa bît armanc û mebestên derhênana hunerî di rojnamevaniya zaroyanda dû aliyan bi xweve di girît[139]:

1- Aliyê Ciwaniyê: Di vî biwarîda bizavê diket serinca zaroyan rabikêşît jibo xwandina kovarê, û eger derhênana hunerî ya kovarekê serkevtîtir û serincrakêştir bit zaro dê wê kovarê helbijêrît li ser hisaba êka dî. Dîsan piştî serinca zaroyan radkêşît dê agehiya wî jî azirînît û dê ewan babetên di kovarêda hatîne belavkirin bo zaroyan bi sanahî êxît jbo xwandina wan.

2- Aliyê Erk û Karî: Mebest pê ewe li demê xwandinê berê zaroy bidete pitiriya babetan, dîsan bikarît belavkirina regezên tîbografî bi şêwazekê ciwan belavebiket û livîna fisiyolocî ya çavên zaroyan li demê xwandinê bizanît.

## Binema û Şengisteyên Derhênana Hunerî

Derhênana hunerî ya her rojnamekê yan kovarekê li ser hinek binema û şengsteyên serekî radiwestît û ji wan binemayan jî:

1- Binemayên Derûnî: Peywendî bi wê çendêve heye ku raya giştî û 'Eqliyeta cemawerî û hezên xwandinê li cem cemawerî û rewşitên wan yên xwandinê bizanin, bo nimûne: Gencan hez li ser wê derhênanê heye ya azirandin têde hebît û mirovên mezin û dan'emir jî hez li ser derhênana bê deng û aram heye û zaroyan jî jiberku têgehiştina wan ya savaye û ji nû digehît lewa ew pitir hez ji wê derhênanê diken ya pitir rengên geş û vebûyî û wêneyên mezin têda hey.[140]

2- Binemayên Rojnamevanî: Mebest bi vî binemayî ewe ku demê derhênerê hunerî nexşeyekî yan dîzaynekê bo hinek babetan heldibijêrît li berahiyê hizrê di wê armanc û mebestêde diket eva bi wê nivîsînê yan

---

139 - 'Ebidlrezaq Hîtî, ESehafel Mutexesîse, Çavkaniya berê, S.143-144. 140 - Malperê: Munteda El-Î'lam El-Terbewî, Pênç Şembî 8-12-2011.

keristeyi hey û her jiber hindê jî derhênerên hunerî difna xwe dikene di nav kûratiya keristeyê nivîsî û berhevkrîde bi tenê jibo hindê ka çu tamek jêdihêt û ji nû da bizanît ka dê çu qalbekê endazeyî û reng û wêneyan bo helbijêrît.[141]

3- Binemayên Fisyolocî: Peywendî bi yasayên dîtinê û livîna çavanve heye, mîna qebareyê guncayî yê Pîtan û Reng û Manşêt û valatiya li ser berperan hey ku digel şiyanên hizirkirin û hest pêkirina zaroyan guncayî bît û ji wan hestpêkirnan jî hesta çavane.

4- Binemayên Hunerî: Bizavê diket ku hevsengî û zelalî û bi sanahîkirina xwandinê û peydakirina balkêşî û ciwaniyê li ser berperên rojname û kovaran peydabiket.[142]

Bi peydakirin û binecihkirina van her çar binema û şengisteyên serekî di derhênana hunerî ya rojnamevaniya zaroyande, derhênerê hunerî dikarît yekeyeka hunerî ya guncayî bo şiyanên zaroyan peydabiket ku bikarît çavên xwe bi karibînît û xwandinê li ber wî bi sanahî bêxît û geşeyê bêxîte şiyanên wî ji bo tamkirina hunerî û li dûmahiyê wêneyekê xeyalî yê erênî li cem zaroyan peydabiket.

141 - Hadî Nu'man Hîtî, Çavkaniya berê, S.261

142 - Malperê: Ko.El-Zewra, J(6597),Bexda, 19 Tîrmeha 2017.

## BEŞA SÊYEM

## 1.KOVARA KEPIR DI ÇEND PIRSEKANDE

### Boçî Me Kovara Kepir Helbijard?

Kovara kepir êk ji wan kovarane yên jimareka diyarkirî jê derkevtî ku (75) jimarebûn, anku dinavbera salên (2003-2009) derkevtiye, eve jî dibîte egerekê harîkar bo vekolerî ku bikarît pitir kuntirolî li peyçûn û goşeyên wê kovarê biket. Eve ji aliyekîve, ji alê din Kovara Kepir êkem kovar bû li ser astê Herêma Kurdistanê bi vî roxsarê rêk û pêk û balkêş û bi vê naveroka heme reng û bi hêz derkevtî, belku dikarîn bêjîn hindî kovara navbirî derkevtî ya bê rikaber û hevrik bû li Herêma Kurdistanê.

Dîsan êkem kovare ku jimara berperên wê û bi wî roxsarê rengaw reng û lêkdayî bigehîte (50) berperan.[143] eve bixwe jî dewlemendiyek bû di bwarê rojnamevaniya zaroyande, çunkî çend berperên kovarê pitir bin dikarît pitir babetên giring û bimifa bo zaroyan pêşkêş biket.

Kovara kepir di kariye bibîte kovara mezinan berî bibîte ya zaroyan, çunkî gelek ji deybabên zaroyan demê kovara navbirî dikirî berî danaba ber destê zaroyê xwe ewan di xwand û xwe jê têrdikir, çunkî kovara kepir ne bitenê bo zaroyan bû belkî gelek babet têde hebûn mîna: ( Navdarên kurd,

---

143 - Ko.Kepir,J(68)Çp.Hecî Haşim,Hewlêr, Şubata 2009.

NavdarênCîhanî,DiHembêzasiroşitîde,LeşûTendurostî,vîWelatînasbike û .... ) meznan jî mifa ji van babetan werdgirtin.

Jiber dîzayin û derhênana wê ya hunerî ya ciwan û bi rêk û pêk ('Elî Mendelawî) hunermendê Karîkaturvan - wêne û karîkatur bo herdû kovarên zaroyan yên 'Îraqî (Muceletî, Al-Mîzimar) çêdikirin - çîrokên şeşjmareyên kovara kepir - pştî hatîne wergêran bo zimanê 'Arebî – bi heman wêneyên kovarêve bi girêbesetekê di kovara (Al-'Arbî Elsexîr) ya kwêtî ya zaroyanda belavkrîne.(144)

## Daneniyasîna Kovara kepir

Kovara kepir:(kovareka heyvaneye bo zarokan.. Dezgeha Sipîrêz bi harîkariya herdû pirojeyên Diyakoniya, Zêwe û Çareserkirina derûnî li duhokê derdiket.)(145)

Dîsan bivî rengî jî hatiye naskirin : ( Kepir.. Kovareka heyvane ya zarokan bû, şa'ir " Mueyed Teyib" ya damezirand û serinvîseriya wê dikir û piraniya babetên wê dinvîsîn. herwesa hunermend "necmedidîn bîrî" dîzayn dikir û nîgarên wê di kêşan).(146)

Jimara (1ta 45) bi harîkariya rêkxirawa Diyakoniya derkevtiye, ji jimare (1) heta (42) xudana imtiyazê (Çinar 'Alî) bû, jimare (43) heta (75) Dezgeha Spîrêz xudana imtiyazê bû û sernivîserê wê her (Mueyed Teyib) bû. (Necmedidîn Bîrî) nîgarkêş bû, û derhênerên wê yên hunerî (Nizar Reşad) u (Beyar Cemîl) bûn, li jimare (43) derhênana wê ya hunerî ji aliyê (Beyar Cemîl û Necmedidîn Bîrî )ve dihête encamdan û li jimare (49 ta 75) bi tenê ji aliyê (Necmedidîn Bîrî )ve derhênan û dîzayna wê dihatekirin.

Kovara kepir li çend çapxaneyekên cuda hatiye çapkirin mîna: J.(1-32) li Çapxaneya wezareta perwerdê li Hewlêrê, J.(33) LI Çapxaneya Xebat li

---

144 - Dîdareka Taybet digel (Mueyed Teyib) Sernivîserê Ko.Kepir li roja Şembî 19-8-2017. 145 - Ko.Kepir, J(1), ÇP.Wezaretî perwerde, Hewlêr,Tîrmeha 2003.

146 - Ko.Kepir, J(67-75), B(6), ÇP. Çp.Hecî Haşim, Hewlêr, 2012.

Hewlêrê, J.(34-57) li Çapxaneya Xanî li Duhokê, J.(58-66) li Çapxaneya Aras li Hewlêrê, J.(67-73) li Çapxaneya Hecî Haşim li Hewlêrê, J.(74-75) li Çapxaneya Spîrêz li Duhokê hatîne çapkirin( eve hijmara dûêye ji keprê li Çapxaneya Spîrêz çap dibît û eger çapxaneya me nekevtiba karî dûrnebû dernekevtba).(147)

Pitiriya babetên kovara Kepir ji aliyê sernivîserê wê ( Mueyed Teyib) ive hatîne nivîsîn çi navê wî li ser bît yan li ser nebît û bê nav hatibine belavkirin yan wergêran û ev çende jî bi têbînî li ser bergê Kovara Kepir hatibû belavkirin : ( her nivîsareka di keprê de hatiye belavkirin û navê nivîskarî li ser nebît ew ji ni vîsîn yan wergêran yan amadekirina serinvîser " Mueyed Teyib"e).(148)

Jimara êkê ji kovara kepir bi (16) rûpelan ji van goşeyan: (Navdarên Kurd, Stiran û Helbest, Digel Xalixaloka Keprê, Berîkane, Tendrustî, Sînariyu û Çîrok , Dîdara Keprê, Fêrkirina Zimanê îngilîzî, kulîlkên kepr) pêk dihat, dgel hijmareka babetên cuda cuda û hemî reng, û (1000) dane jê dihatine çapkirin. li jmare (2) bû (20) rûpel, û jimare (10) bû (24) rûpel û li jimara (13) bi (2500) dane jê hatine çapkirin û jimare (36) bû (32) rûpel.(149)

Helbijartina navî bo kovar yan rojname û pertûkên zaroyan geleka giringe û divêt peywendiyeka ji nêzîk bi zaroyanve hebît ku kartêkirina xwe ya derûnî ya êkser li zaroyan biket û her jber hndê jî ptiriya wan kovarên li herêma kurdistanê derkevtîn navê wan yê di wê jîngehêda hey eva li derdorên zaroyan hey û wekî aşnayekê digel jiyana zaroyan hey mîna kovara: ( Sivore, Pepûle, Xende, Zeng û Beng, Heng ..) lewa helbijartina navê kovara (Kepir) jî ji çu valatiyan nehatiye belkî peywendiyeka jîwarî û derûnî digel êk heye jiberku di kevinda li bajêrê duhokê û Gundên ser bi vî bajêrîve demê xelk di çû ser karên xwe yên rojane û bi taybet li werzê Buhar

147 - Ko Kepir, J(75),ÇP.Spîrêz,Duhok,Îluna 2009.
148 - Ko Kepir, J.(1-18), B(1), ÇP. Wezaretî perwerde, Hewlêr, 2012.

149 - Ko Kepir, J.(36), ÇP.Xanî, Duhok, Xizîrana 2006, R.19.

û Havînê zaroyên xwe hêlane dibin kepranve û ji nû derdi kevtin, û bi vê çendê zaro li bin kepran di nivistin û yarî di kirin û komve di bûn û xwe li ser demê duhoka nû jî her malekê keprek di hewşa xweda çêdikr û Mêwek di dana ser yan Çulî li ser bû, evca wekî hevalînyekê bo wan zaroyan digel KeprandE drust dibû, anku zaroyên vî Bajêrî ji kevinda peywendiyeka Saykolojî û Suşyolojî di gel Kepran heye.[150]

Dawî jimara Kepir (75)e li Îlûna (2009) bi (44) rûpelên navxoyî û (4) ên bergî derkevtiye. Dîsan dawî jimare ji van goşeyan pêkdihat : ( Silava keprê, Navdarên Cîhanî, Di Hembêza Siroştîde, Leş û Tendrustî di pirsyar û bersivande, Çîrok, vî Welatî nasbike, Werziş, Geleriya Keprê, Sirod û Helbest, Zarok çi dibêjn, Pirsyar û bersiv, Postê Keprê, Zanist û Jiyan, Bigirnije, Em Kîne, Tiştê mino tşito!, Mijulahiyên Keprê, Seyre lê Raste, Kulîlkên Keprê) anku (20) goşeyên berdewam hebûn û eve bi xwe jî dewlemendiyeka mezne bo kovarê çunkî hemî rengî û hemî layeniya babetan bi xweve girtiye.

Her (75) jimarên kovara Kepir di (6) bergande ji aliyê Dezgeha Spîrêz ya çap û weşanê li sala (2012) hatîne komvekirin û bi vî rengî:

- Bergê êkê jimare (1- 18).
- Bergê dwê jimare (19-30).
- Bergê sêyê jimare (31-42).
- Bergê çarê jimare (43-54).
- Bergê pêncê jImare (55- 66).
- Bergê şeşê jimare (67-75).

## Armanc û Felsefeya Derkevtina Kovara Kepir

---

150 - Dîdareka Taybet di gel (Mueyed Teyib) Sernivîserê Ko.kepir li roja Şembî 19-8-2017.

Her wekî di pişka êkê tewerê çarêda me behsê armancên rojnamevaniya zaroyan kirî ku her rojnamek yan kovareka derdikevît hinek armanc û mebest li pêşiya wê hene divêt binecih biket, û ev çende jî li ser wî alî radwestît yê bi derêxistina wan çapemeniyan radbit. Rojnamevaniya zaroyan rolekê serekî heye jbo avakirina kesatiya zaroyan û avakirina wan ya derûnî û civakî û geşekirina hişiyariya wan ya rewşenbîrî û netweyî û peydakirina heza xwandinê ldev wan û eve bixwe jî dbîte ji giringtirîn armanc û mebestên derkevtina rojname û kovarên zaroyan.

Zana û şarezayên zanistê perwerdeyî wesa dibînin ku zaroyan bi hemî qunaxên jiyê xweve çend pêdviyekên serekî hene mîna pêdviyên: (Xwarin û Vexwarinê, Êmnahî û Tenahiyê, Endêşe û Heza Aşkrakirin û Muxamerê, Ciwanî, Pêzanîn û Zaniyarî) evca ew pêdviyên ji aliyê Rojnamevaniya Zaroyanve bo zaroyan dihêne binecihkirin hersê pêdiviyên dawyêne, anku pêdviyên : (Endêşe û Heza Aşkarakirin û Muxamerê, Ciwanî, Pêzanîn û Zaniyarî) ne.[151]

Kovara Kepir jî wekî hemî kovarên din yên zaroyan armanc û mebestên xwe yên taybet hebûn û felsefeyeka aşkera û berçav hebû ji bo xizimetkirina zaroyên kurdistanê û bi taybet yên bajêrê Duhokê, eve jî her di naveroka wan babetande diyardi bû yên têde dihatine belavkirin, lê demê li sala (1986) Sernivîserê Kovarê (Mueyed Teyib) li Swîdê akincî bûy dest bi karê mamostayê kir wekî mamostayê Zimanê Kurdî û dîsan harîkariya wan qutabiyan dikir yên swîdî nedzanî û her li wêrê têkeliya wî digel zaroyan destpêkir û bizavkir ku xwe di Edebiyatên Zaroyande şarezabiket û her li wî demî ew hizir bo wî peydabû ku demê ji welatê xerîbiyan vedgerîteve ew dê bizav û pêkolan ket ku kovarekê bo zaroyên kurdan derêxît, demê Sernivîser vegeryaye welatî û li sala (2002) Dezgeha Spîrêz ya çap û weşanê damezrandî dîsan hizir di hindêde kir ku kovareka zaroyan ya heyvane

---

151 -Malperê: Nun Post, Sara Al-Leysî, Ehmiyet Suhuf El-Etfal fî El-Tenşîe El-Îctîma'eye Wel-

Seqafiye, 3-10-2015.

derbêxît ew bû li Tîrmeha sala (2003) dest bi weşana Kovara Kepir kir û mebest û felsefeya derêxistina wê di van xalanda berçav dibû:[152]

1- Mebest pê fêrkirina zaroyên Kurdane bi Zimanê Kurdî (Şêweyê Badînî) û rênvîseka durst, çunkî li berahiyê zaroyên me Kurdan li qutabxaneyan bi Zimanê 'Arebî di xwand û paşî bi Zimanê Kurdî (Şêweyê Kirmanciya Xwarê) di xwand. Her di jimara êkê ya Kovara navbrîde Sernvîserî giringî û viyana Zimanê Daykê bo zaroyên me Kurdan daye diyarkirin û her êk ji mebestên serekî yên derêxistina wê jî ji bo saxkirin û dewlemendkirina Zimanê Kurdî bû: ( Gelek ziman jî hene ji zimanê me pêşkevtîtir û dewlemendtirin û ji zimanê me pitir Kitêb û Kovar pê derdikevin û pitir Film û Stiran pê dihêne çêkirin û gotin lê çi Ziman ji Zimanê me şrîntir nînin ji ber ew yekemîn Zimane me guh lê bûy û yekemîn Zimane em pê diaxvîn...)[153]

Dîsan her di ijmara êkêde Sernivîser di dete diyarkirin ku wan ev kovare wekî sîwanekê bo zaroyan peydakiriye da zanîn û xweşiya xwe jê wergirin û di bêjît: (Eve hijmara êkêye ji Kovara Kepir. Ev Kepre me ya avakirî da hûn li ber sîbera wê demekê xweş û bi sûd bi borînin û Ziman û Zanîna xwe dewlemendtir lê biken.)[154]

2- Armanc û mebesta wan pê ew bû Zimanê Kurdî di mêşkê zaroyên Kurdande bilind û pir biha rabigirin, ew jî bi rêka roxsarekê ciwan û renga û reng yê Kovarê ku li wî demî çu kovareka zaroyan li kurdistanê bi wî rengê cwan û rengîn dernedikevt.

3- Pertûkxaneya Zaroyan li Kurdistanê bi giştî û li bajêrê duhokê bi taybetî gelek lawaz bû, mebesta wan ew bû ku bikarin Kovara Kepir wekî însîklopîdyayekê lê bihêt bo Zaroyên Kurdan ku di wêrêda: (Helbest û Çîrok

---

152 - Dîdareka Taybet di gel(Mueyed Teyib) sernivîserê Ko.Kepir.
153- Sernivîser, Peyva Keprê, J(1), ÇP.Wezaretî Perwerde, Hewlêr,Tîrmeha 2003, R.1. 154 - Ç.b.n.

û Pêzanînên Dîrokî û Cugrafî û Hemî Reng û Zanist û ...) her tiştekê wan bivêt têde bibînin.

4- Avakirin û Perwerdekirina Zaroyekî ku bi erênî berê xwe bidete yê beranberî xwe û bawerî bi pêkvejiyanê û hevalînî û dostîniyê hebît û kesekê avaker û erênî bît dinav civakêde.

5- Avakirina Zaroyekê Neteweperwer û dûr ji Regezperêsiyê û bo vê çendê dikarîne dîroka Kurdan û her tiştekê bi nav û cihê wanve girêdayî bo Zaroyên Kurd bi şêwazekê ciwan û sivik û bi sanahî bi çend goşeyekên wekî (Navdarên Kurdan, Bajêrên kurdan) û gelekên din berçav biken.

## Girift û Aloziyê Kovara Kepir

Her kovareka dest bi derkevtin û weşanê biket ya bê girift û alozî nabît, bi taybetî li welatên taze pêgehiştî û ji nû geşeyê diken wekî Îraqê û derdorên wê û her ji egerê van alozî û giriftan gelek ji rojname û kovaran yan yên daneyên jimarên xwe kêm diken yan roxsar û kaxeza çapê ji başî di guhurin bo lawaz û xirab yan jî gelek ji rojname û kovaran û ji egerê giriftên darayî dihêne rawestandin.

girift û aloziyên pitiriya Kovarên Zaroyan li ser çar teweran dabeş dibin:(155)

1- Girift û aloziyên stafê nivîsînê: Eve jî pêkdihêt ji kêmiya ewan kesên taybetmend yên bi şarezayî û serbor di bwarên zaroyande dinivîsin û ev girifte di hemî Kovarên Zaroyande heye, lê bi şêweyekê rêjeyî. Dîsan hebûna Wênekêş û Nîgarkêşên taybet bi zaroyanve ew jî aloziyeke dibwarê nivîsînêde çunkî kovarên zaroyan gelek pişt bi wêneyan dibestin.
2- Girift û aloziyên naverokê: Pitiriya Rojnamevaniya Zaroyan neya taybetmende bi qunaxeka diyarkirî ya jiyê zaroyanve, anku

---

155 - Sare Xalid Leysî, Sehafetul -Etfal (Mefhum-Neşe-Enwa'e- Wezaîf- Tehrîr -Îxrac),Zankoya Seyût, Kuliyet EL-Adab-Qisimul-Îalam ,Misir,2011,2011.

taybetmendî nîne, û eve jî dibîte egerê hindê ku hemî zaro xwe di wê Kovarê yan Rojnameyêde nebînin ku derbrînê ji hez û pêdviyên wan biket. Di gelek Kovarên Zaroyande Tirane û Pêkenîn û dem borandin biser hemî babetên dîtir de zaldibît, eve jî neya durste.

3- Girift û aloziyên çapê: Lawaziya şiyanên darayî û nebûna çapxaneyeka taybet bi wî alîve yê bi derêxistina Kovara Zaroyan radibît û dibîte egerê hindê ku kovar ya berdewam nebît bi derkevtinê, yan jî dibîte egerê hindê ku kovar bi roxsar û berg û wêneyên ciwan û zelal û balkêş dernekevît.

4- Girift û aloziyên belavkirinê : Negehişitina kovarê bo hemî cih û gund û deveran û kêmiya dahatê zaroyan bi taybet li deverên hejar dîsan giriftan peydadiket, digel xaleka dîtir ya giring jiberku ew pareyê li kovarê dihête mezaxtin ji firotina wê dernakevît, lewa gelek kovar kêm daneyan çap diken û eve jî dibîte egerê hindê ku li gelek cihan nehête belavkirin.

Kovara Kepr jî wekî hemî kovarên din girift û aloziyên xwe hebûyne û rawestandina wê ji weşanê belgeyekê diyare li ser vê çendê, lê dibît ew girift û aloziyên giştî yên me berî nuke amajepêkrî hemî li dev Kovara Kepir peydanebibin û bitenê hinek ji wan hebin û diyartirîn asteng û aloziyên Kovara Kepir em di karîn di van xalên serekîde kombikeyn:

1- Kêmiya staf û nivîserên taybetmend bi nivîsîn û edebiyat û babetên zaroyanve, û berperên kovarê bi xwe jî belge ne li ser vê rastiyê û jimareya Kovara Kepir hebûye ku babetên wê hemî bitenê ji aliyê Sernivîserê kovarê bi xwe û digel nîgarkêş (Necmeddîn Bîrî) hatîne berhevkirin.[156] Hêjayî hindêye bihête behskirin ku Rojnamevaniya Zaroyan li Kurdistanê hemî gazndeyê ji vê girift û aloziyê diket, çunkî pitiriya wan kovarên derkevtîn yan ta nuke berdewam derdikevin ji aliyê kes û layenên taybetmendve

156 - Dîdareka Taybet di gel (Mueyed Teyib) Serinvîserê Ko.kepr.

dernekevtîne, belku partên siyasî yan dezgeh û rêkxirawên hikumî yan kertê taybet derêxistîne û bi şêweyekê pêdvî berhevî bo nehatîne kirin. Divêt wê jî bizanîn ku Rojnamevaniya Zaroyan tuxmekê edebî yê tazeye li Herêma Kurdistanê serhilday û çu serbor û ezmûneka kevin û bihêz nebûye.

2- Aloziyeka din ya berçav di Kovara Kepirda aloziya daraye, çunkî bitenê heta jimare (45) rêxrawa diyakonya ya Swîdî pşitevaniya wê ya darayî kiriye û egerê rawestandina wê bi xwe jî baraptir bi aliyê darayîve girêdayî bû her wekî Sernivîserî bi xwe ji amajepêkrî û gotî : ( Eger çapxaneya me nekevtiba karî dûr nebû dernekevtba ji berku eve demeke rewşa me ya darayî alozbûye)[157] anku li vêrê bi rûnî diyardibît ku Kovara Kepir ya tûşî qeyraneka darayî bûy. Her dîsan Sernivîserî amaje bi wê çendê jî kir ku her jiber girifta darayî ewan çapkirina jimareya daneyên Kovara Kepir kêmkiriye û beranberî vê çendê bihayê firotinê yê her jimarekê jî girantirlêkr:( Me 4000 dane ji keprê çapdikirin û bi xusaretî di firotin da ku hemî zarok bi şên bikirin û bixwînin. Lê rewşa me ya nuke dest nadet em berdewambîn, û jiber hindê hem me tîraja Keprê kêmkir û hem jî bihayê wê zêdekr.)[158] Helbet eve jî dibîte egerê hindê ku kovar bi hijmareka kêmtir bikevîte ber destê xwandevanan û dîsan şiyanên zaroyan ji bo kirîna wê kêmtir lê bihên.

3- Sernivîserê kovarê têkelî bandora siyasî dibît li Herêma Kurdistanê û dihête kandîdkirin bo civata nîştimanî ya Îraqê û êdî ew delîve namînît ku bi derêxistina Kovara Kepir rabît, çunkî her wekî berî nukî me amaje bi axvtineka wî bixwe kirî ku gelek jimareyên kovara navbrî bitenê ji aliyê wî û hunermend (Necmeddîn Bîrî) ve hatîne derêxistin evca mijulbûna wî bi karê siyasîve ewî ji karê nivîsîn û rojnamevaniyê dûr dêxît û eve jî dibîte egerekê din yê harîkar jibo rawestandina weşana Kovara Kepir.

## 2. GIRINGIYA KOVARA KEPIR JI ALIYÊ:

---

157- Sernivîser, Ko.Kepir, J.(75), Duhok, ÇP.Spîrêz, îluna 2009 R4. 158 -
Ç.B.N

## Neteweyi

Komeka bihayên pir giring di Rojnamevaniya Zaroyande dihêne belavkirin mîna bihayên: (Civakî, Rewiştî, Zanîn û Zaniyarî, Dilvekirin û Bêhnvedanê, Neteweyî û Nîştîman Perwerî û ...) anku êk ji wan bihayên here giring yên Edebê Zaroyan bi giştî û Rojnamevaniya Zaroyan bi taybetî mebest pê hey pêvegrêdana zaroyane bi dîrok û ax û welat û netewe û keleporê wanve. Peydakirina hesta azadî û serbixwya welatî û êkrêzî û êkgirtina miletiye li dev zaroyan.[159]

Bo vê mebestê jî her li jimara êkê ya kovarê goşeyeka taybet li jêr navê (Navdarên kurd)[160] hatiye belavkirin û divê goşeyêda jîn û kar û kiya û berhemên (30) Navdarên Kurd her ji helbestvan û dîrokinvîs û nivîser û edîb û çîroknvîsan mîna: (Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Qenatê Kurdu, Mela Mehmûdê Bayezîdî, Feqiyê Teyran, Salim, Haciyê Cundî, mehwî, Mîqdad Methet Bedirxan w... gelekên din) li seraniserî cîhanê û bê cudahî hatîne behskirin, anku di jimare (1 ta 30) hatîne belavkirin.

Zêdebarî vê û di jimara (31 ta 42) ji Kovara Kepir goşeyeka din ya berdewam bi navê ( Serkirdeyên Siyasî)[161] dîsan jiyana (12) Serkirdeyên siyasî yên Kurdan li seraniserî cîhanê hatîne belavkirin mîna: ( Mela Mistefa Barizanî, Şêx 'Ubeydulayê Nehrî, Bedirxan Begê Mîrê Botan, Şêx 'Ebidlselamê Barizanî, Şêx Mehmûdê Berzincî, Şêx Se'îdê Pîran, Şehîd Seyd Rezayê Dêrsimî, Simkoyê Şkak, Qazî Mihemed, Ceneral Şerîf Paşa, Ceneral Îhsan Norî Paşa, Îdrîs Barzanî). Bi behskirina van navdar û serkrdeyan kovarê di viya eve serkrde bo wan bibine çavlêker û da bibîte nameyek bo her zaroyekê Kurdan û li her cihekê hebît ku ew jî di karît bibîte êk ji van

---

159 - Semer Ruhî Feysel, Edebul Etfal We Seqafetuhum- Qîrae Neqdiye, , Îtîhadul-Kutab El-'Ereb, Dîmeşq,1998., S.15-16.

160 - Ko.Kepir, J.(1 ta 30), ÇP., Hewlêr, Salên 2003–2005.

161 - Ko.Kepir,J.(31 ta 42), ÇP. Wezaretî Perwerde, Çp.Xanî, Hewlêr 2006.

navdaran yan serkirdeyan eger hat û bibîte xudan xewn û armanc û hîvî û berdewam kar û xizimetê bo wan armancên xwe biket.

Herwesa Kovara Kepir goşeyeka din ya berdewam belavkriye bi navê (Balindeyek ji Kurdistanê)[162] ku dikarîne nav û wêneyê (32) balindeyên li Çiya û Dol û Nihalên Kurdistanê dijîn belavbiket û zaroyên Kurd ku pitiriya wan ew balinde nedîtîne li wana aşna biket dîsan eve jî her dibîte hoyekê dîtir jibo girêdana zaroyan bi welatê wanve. Herweha Kovara Kepir çendîn babetên cuda li ser cejnên neteweyî û babetên din ku morka neteweyî pêve diyarbît belavkirîne ku zaroyên Kurd bi ax û siroşt û welatê wanve girêbidet. Bi şêweyekê din, dikarîn bêjîn ku Kovara Kepir dikariye dîroka kurdistanê her ji kevinda û heta nuke û serdemên nû bi şêwazekê sivik û sanahî bo zaroyên Kurdistanê berçavbiket eve jî jibo hindê ku zaroyên Kurd niştîman perwerbin û hez ji Kurdistanê biken. Belkî dikariye armanceka din jî binecihbiket ew jî peydakirina Hesta Mirovatiye lidev Zaroyên Kurd û bo vê yekê jî babet li ser netewe û miletên û ayinên din jî çu ewbin yên li Kurdistanê hey yan li welatên din belavkrîne eve hemî ji bo hindê ka çewa Zaroyên Kurdan hez ji neteweya xwe di ken hez ji milet û ayinên din jî biken û nebine kesên neteweperês.[163]

## Perwerdeyî û Fêrkirinê

Rêjeya here mezin ya tuxmên edebî yên bo zaroyan dihêne nivîsîn û arastekirin giringiyeka êkcar mezin heye jibo perwerde û fêrkirina zaroyan, Rojnamevaniya Zaroyan jî û birêka belavkirina wan hunerên rojnamevanî yên dinav berperên wêda dihêne hembêzkirin mîna: (Çîrok û Helbest û Sirod û Gotar û Pêzanîn û Berîkane û..) di karît bi erkê perwerde û fêrkirina zaroyan rabît û bihayên rewiştî û fêrkirinê di mêşk û kesatiya wande pitir ji peyrew û pirogramên xwandinê biçînît, çunkî pirogramên xwandinê

162 - Îsmaîl Taha Şahîn, Ko.Kepir, J.(10 ta 42).
163 - Dîdareka Taybet di gel (Mueyed Teyib) Sernivîserê Ko.Kepir.

babetekê hişke û dûre ji balkêşî û asanî û wêne û rêkên bi sanahî yên wergirtinê ji aliyê zaroyanve, belê rojnamevanî û bi rêka hunerên xwe yên balkêş di karît gelek biha û rewşitan lidev zaroyan peydabiket û fêrî gelek tşitan jî biket.

Her jiber giringiya hunerên edebî jibo çandin û binecihkirina binemayên rewştî û îmanî û perwerdeyî di nax û kesatiya mirovande, qurana pîroz jî rûberekê mezin daye bikarînana serhatî û çîrokan. Zana û Bisporên perwerdeyî dibînin ya baştir ewe ku heta ew bikarin çakî bihayên perwerdeyî û fêrkirinê yên li dev deybab û civakê di pesend û pêdvî mîna : ( Çakî û Rastî û Rastgoyî û Emanet û Destpakî û Zanîn w...) gelek bihayên din, pêdiviye van bihayan di kesatiyên wan qareman û kesande peydabiken yên di nav çîrok û hunerên din yên rojnamevanîda hey, çunkî zaro çav li wan kes û qaremanan di ken yên di çîrok û serhatiyanda dhêne bikarînan û dbine jêderê balkêşî û heza zaroyan.[164]

Her li ser vî binemayî Kovara Kepir hijmareka zor ya babetên perwerdeyî û fêrkirinê di qalibên cuda cuda yên edebîda û bi şêwazekî ciwan û bi sanahî bo zaroyan bikarînayine. Dibwarê fêrkirinêde kovara navbrî pêngaveka baş havêtiye û bi taybet bo fêrkirina zimanên biyanî mîna zimanê Înglîzî û bo vê çendê jî her ji jimare (1 ta 19)[165] û li dumahiya kovarê û di goşekêde (3) berper taybet kirbûn bo zaroyan da fêrî Zimanê Înglîzî bibin, belê evê goşeyê çu navekê diyarkrî nebû cara hey wekî çîrokê bû mîna: (Montî, Kitî, Tînî, Hirço, Hembî, Dolfî, Dobî, û ...) û car jî wekî pêzanîn li ser hinek biwarên jiyanê mîna : (Dîku û Mirê, Şorê, Zerê û ..) dihatine belavkirin, sercemê wan berperên bo fêrkirina Zimanê Înglîzî hatîne bikarînan (59) berperbûn û her ristek û peyveka Îngilîzî beranberî wê bi Kurdî jî dihate nivîsîn.

---

164-Muna Se'dî, Malpera: Mewsû'et El-Te'lîm Weltedrîb, 2-9-2009.
165- Ko.kepir, J.(1 ta 19), ÇP. Wezaretî Perwerde, Hewlêr,(2003, 2004, 2005).

Herwesa bi rêka babetên din mîna Çîrok û Helbestan û Gotaran çendîn bihayên perwerdeyî û rewşitî û çakiyê belavkrîne mîna çîroka: ( Hirça Cigarkêş)[166] çîrokeka wênedare zaroyan fêrê hindê diket ku xwe j cigarekêşanê dûrbêxin çunkî ziyanên mezin jê peydadibin bi taybet demê cigara hirçê bûye egerê sûtina darstanê û mal û hêlînên giyaneweran û hemî giyanwer û hevalên hirçê jê turebûn.

Di helbestekêde û bi navê (Mêrûya Çeleng)[167] bihayê karkirinê ûrijdiya li ser karî bo zaroyan di dete diyarkirin ka çewa mêriyeka wesa biçûk û rojane kardiket û hest bi mandîbûn û bê hîvîbûnê naket û ew bixwe qûtê xwe bo zivistanê komve diket. Li jimara (69)[168] û li berperê (30-31) dîsan babetek dî ya fêrkirinê bi navê ('Elaeddîn û Çirayê wî yê nû) belavkiriye û zaroyan fêrî hinek bikarînanên amîrê Kompiyoterî diket.

Bi şêweyekê giştî dikarîn bêjîn ku Kovara Kepir di vî biwarîda xizmeteka baş nebitenê pêşkêşî zaroyan kriye, belkî pêşkêşî mezinan û deybabên zaroyan jî kiriye, çunkî gelek ji wan babetên perwerdeyî deybaban mifa jê wergrtiye jibo hindê ku bikarin serederyeka ciwantir û bi mifatir digel zaroyên xwe bikarbînin û berperên Kovara Kepir baştirîn belgene li ser vê çendê.

## Rewşenbîriya Giştîve

Gelek ji wan xwandin û vekolînên hatîne encamdan wesa xweya diken ku ew egerên kesekî ji kesekê din cuda diken, bi pileya êkê egerên rewşenbîrîne, û ji berku hinek caran rewşenbîrî wesa dihête pênasekirin ku şêwaz û rêkeka jiyarêye û mirov bi xwe jî berhemê jîwarê xwe yê

---

166- Sernivîser, Ko.kepir, J.(21), ÇP.Wezaretî Perwerde, Hewlêr, Adara 2005, R.20-21. 167 - Sabir Sindî, Ko.Kepir, J.(75), ÇP.Spîrêz,Duhok, Îlûna 2009, R.25.

168 - D. Macid El-Heydem – Wer. Îsma'îl Taha Şahîn, Ko.Kepir, J. (69), ÇP.Hecî Haşim, Hewlêr, 2009, R. 30-31.

rewşenbîriye, lewa giringîdan bi rewşenbîrkirina zaroyan dibîte egerekê harîkar ku ew zaro bi şêwazekê baştir jiyara xwe bi rêvebiben.[169]

Bi vê çendê diyardibît ku Rojnamevaniya Zaroyan bi rolekê mezin û karîger radibît jibo rewşenbîrkirina zaroyan û çekdrarkirina wan bi zanyarî û rewşenbîryên cuda cuda û agehdarkirina wan her li tiştekê nû di cîhana hizir û rewşenbîrî û hunerî û edebîde. Dîsan Rojnamevaniya Zaroyan giringiyeka mezin heye jibo hindê ku zaro digel civakê têkel û alodebin û digel hemî texên wê kara û ektîv bin û pişikdariyeka erênî di hemî biwarên jiyana civakîde biken, zêdebarî ku ev corê rojnamevaniyê nasnameya rewşenbîrî li dev zaroyan mukim diket û binemayê hevkarî û pişikdariyê jibo dahênan û çalakî û şarezayî û serboran mezin û berçavdiket.

Ji ber vê giringiyê rûberê here mezin yê Kovara Kepir bixweve girtî û di berperên xweda hembêzkirî, babetên rewşenbîriya giştîne û bo vê mebestê jî çendîn goşeyên hemî reng belavkrîne, lewa giringiya Kovara Kepir divî bwarîde ji herdû biwarên din pitir diyar û berçav dibît. Kesatiya zaroyan pêdvî bi pêzanîn û rewşenbîriyeka hemî renge, çunkî pêdviyên zaroyan jî di hemî rengin û hemî aliyan bixweve digirin mîna pêdviyên : ( Saxlemî û Leşî, Tirane û Pêkenîn û Xwe Mijulkirin, Naskirna welat û cihên cîhanî û herêmî û navxweyî, naskirina siroşt û giyaneweran, pêzanînên gişitî, pêzanînên werzişî û ...).

Ji wan goşeyên pêzanînên gişitî belavkirîn goşeya ( Berîkane) bû ku her ji jimare (1 ta 75) goşeya navbirî ya berdewam bû û pirsyarên giştî û hemî reng têde hatîne belavkirin mîna pirsyarên: ( Edebî, Zanistî, Hizrî, Civakî, Mêşkî ...). di berîkana jimara êkêda ev pêzanîne bi şêweyê pirsyaran hatîne arastekirin:

---

169 - Dr. Mîrvet Muhemmed kamil Terabîşî, Medxel Îla Sehafetul Etfal, Dar El-Fîkir El-'Erebî, Qahîre, 2003, S.57.

1-" Mem û Zîn" navê dastaneka ş'rî ye, şa'rekê Kurd berî pitir ji 300 salan dahênaye, ew şa'er kiye? ( Melayê Cizîrî , Nalî , Exmedê Xanî , Feqiyê Teyran.)

2- Amêdiyê paytextê Mîrnişîneka Kurdan bû, navê wê Mîrnişînê çi bû? (

Hekarî , Behdînan , Erdelan , Botan )

3- Êkemîn Qaremaniya cama cîhanî ya Fûtbolê li sala (1930) li welatê Orgway li Emrîka Jêrî hate rêkxistin. tîma kîj welatî ji van çar welatan cama wê Qaremaniyê bi destveînabû?

(Berazîl , Ferensa , Orgway , Îtaliya)

4- Kurdistan welatekê çiyaye û gelek çiyayên bilind lê hene. kîj ji van çiyayan bilindtirîn çiyayê Kurdistanêye?

( Metîn , Hindrîn , Sîpan , Agrî )

5- Di cîhana me ya rengîn de, gelek reng hene, lê rengên serekî sêne. kîj ji van rengan ewin?

(Sûr û Zer û Şîn, Kesk û Reş û Sûr, Spî û Reş û Zer, Şîn û Reş û Spî)

Herwesa goşeyeka din ya berdewam her ji jimare (1 ta 19) ya berdewam bû bi navê ( Digel Xalxaloka Keprê) hebû û ew jî ji çend beşan pêkdihat mîna: ( Seyre lê Raste! , Vê jî bizane!, Xaçe Rêz, Boçî? , Mamk û .. ) û Divê goşeyêda komeka zor ya pêzanînên giştî û hemî reng têde dihatine belavkirin.

Goşeyeka dîtir ya mijulî û hizirî û dem borandinê jî hatiye vekirin bi navê (Tiştê Mino Tşito)[170], ev goşeye her ji jimare (7 ta 14) ji aliyê Sernivîserê kovarê bixwe dihate berhevkirin û ji jimare (15 ta 75) ji aliyê Hozanvan (Muhemed Emîn Doskî) ve hatiye berhevkirin, anku Kovara Kepir
(69) pirsyarên hemî reng û giştî bi rêya hizrî û balkêş û edebî û bi şêweyê

170 - Ko. Kepir, J.(7 – 75), salên ( 2004-2009).

kêş û serwayê û biwênevh pêşkêşî zaroyan kirîne, anku pirsyar bi şêweyê (Helbestê) eve bixwe jî zengînyeke bo kovarê û pitir zaroyan bi balxweve vedikêşît, mîna jimare (75) da ev pirsyare arasteyi zaroyan kiriye:

Tşitê mino tşito! (171)
Tşitîkê mino û teye
Gelek kesan jê heye
Huh didinê û di axvin
Wek kesê amadeye
Tomardiket ew dengan
Wênediket gişt rengan Dê
şêytêda'umbarkey Wêne û
name û ahengan Poste çiye
gelek jîr
Peywendî naçin ji bîr
Di gavêda digehînît
Kesê nêzîk û yê dûr
Mobîle yan radyoye
Yangotinadgelxoe?

Digel çendîn goşeyên dî yên berdewam ku di Kovara Kepir da hatîne belavkirin û xizîneka pêzanînên hemî reng pêşkêşî zaroyên Kurd kirîne û dikarîne rewşenbîriyeka dewlemend bo wana peydabiket, û bibîte egerekê harîkar bo avakirina kesatiya zaroyan ji hemî aliyekîve.

## 3. HUNERÊN ROJNAMEVANÎ YÊN KOVARA KEPIR

### Gotar

Rêjeya mezin ya pêkhateya Rojname û Kovarên giştî û yên zaroyan jî gotare, çunkî vî hunerê rojnamevanî wekî Çîrokê yan Helbest û Sirodê çi

---

171 - Ko.Kepir, J.(75),Çp. Spîrêz, Duhok, Îluna (2009), R 41.

qalib û şêwaz û roxsarekê taybet nîne ku nivîser pêve bihête girêdan.[172] Lêgotar jî li ser çend coran dihête dabeşkirin mîna gotarên: (Edebî, Mêjûyî, Siyasî, Zanistî, Ayînî, WerzIşî, Hunerî û ....)

Pitiriya babet û goşeyên Kovara Kepirê her di çarçoveyê hunerê Gotarêde bûn, jibilî gotarên cuda cuda yên di berperên kovarêde hatîne belavkirin, çendîn goşeyên taybet û bo mebestên cuda hatbûne belavkirin û ji wana:

A-Sergotara Sernivîserê keprê ku bi dû navan hatbû navkirin, her ji jimare (1 ta 61) bi navê (Peyva Keprê) bû, ji jimare (62 ta 75) bi navê (Silava Keprê) dihate nivîsîn. Di vê goşeyêda Sernivîserê Keprê (75) gotar di rûpelên keprêde nivîsîne, ev gotarên Sernivîserî taybet bûn bi Keprê û xwandevan û nivîser û pişikdarên wê ji zaro û mezinan û gelek caran bi şêweyê şîret û daxwaziyan nivîsîne û cara hey jî li ser helkevtinan û bi taybet evên peywendî bi zaroyanve hey dihate nivîsîn.

B-Goşeya (Navdarên Kurd): ev goşeye her ji jimare (1 ta 30) ya berdewam bû, bi şêweyê gotarê jiyan û kar û berhemên (30) Navdarên Kurd ji ( Helbestvan û Nivîser û Rexnegir û Dîroknivîs û Rojnamevanan û ..) belavkIrîne, mîna ( Ehmedê Xanî, Feqê Teyran, Mela Mehmûdê Bayezîdî, D.Kamîran Bedirxan, Sadiq Behaeddîn Amêdî, Enwer Mayî, Qenatê Kurdo û ...). evan gotaran şêweyê babetî (Mewzu'î) bixove girtîne.

C-Goşeya (Serkirdeyên kurd): bi şêweyê gotarê, jiyana (12) serkirdeyên siyasî yên Kurdan li hemî cîhanê hatiye nivîsîn, û her ji jimare (31 ta 42) ya berdewam bû. Ji wan siyasiyên hatîne berçavkirin: ( Qazî Muhemed, Mela mistefayê Barzanî, Ceneral Şerîf Paşa, Şêx 'Ubeydulayê Nehrî, Şêx Mehmûdê BerzIncî û ....).

172 -Hadî Nu'man Hîtî,Çavkaniya berê, S.256.

D-Goşeya (Navdarên Cîhanî): ji jimare (43 ta 75) Sernivîserê kovarê û bi şêwazekê sivik û asan jiyana (33) Navdarên Cîhanî di biwarê Civakî û Hunerî û Zanistî û Dahênananda mîna: ( Mehatma Gandî, Liyunardo Dafinşî, Bêthovin, Tomas Edîsun, Yohan Gotênbêrg, Elîksender Giraham Bêl û ...) bi şêweyê gotarê nvîsîne.

E-Goşeya (Vî Welatî Nasbike): Sernivîserê kovarê (64) welat bo xwandevanan û zaroyan bi şêweyê gotarê û her ji jimare (10 ta 75) dayne niyasîn, di jimare (10,11,12) de ku destpêka nivîsîna vê goşeyê bû (Kurdistan) wekî welatek bo zaroyên Kurd ji aliyê cugrafî û siyasî û îdarîve daye niyasîn û her ji jimare (13 ta 75) her carê welatekê cîhanî daye naskirin mîna: ( Emrîka, Danîmark, Swîd, Rosya, Nerwîc, Riwanda, Tayland .....) digel van gotaran wêneyên wan welatan jî hene.

F- Goşeya (Çîroka Jiyanê): ev goşe di sê jimareyanda (43-44-45) hatiye belavkirin, nivîserî bi şêweyê gotarê behsê çîroka jiyanê kiriye li dîroka kevin ya Kurdistanêde û paşî navê goşeyê guhorî bo (Çîroka Şaristaniyê) ew jî di (9) jimareyanda her ji jimare ( 46 ta 54) ya berdewam bû û nivîserê wê ku (Mueyed Teyib)e behsê destpêk û çewaniya şarstaniya cîhanî kiriye.

G- Goşeya (Geleriya Keprê): ev corê gotarê bi gotara Hunerî û Edebî dihête niyasîn û her ji jimare (43 ta 46) da Hunerê Şêwekarî û corên wê daye niyasîn û (12) wêneyên şêwekarî yên cîhanî yên navdar berçavkrîne. Di jimare (47 ta 54) da Sernivîserî jiyan û berhemên (8) Hunermendên Şêwekarî yên cîhanî yên navdar di çarçoveyê gotarêde bo xwandevanê Keprê dayne naskirin mîna hunermend: ( Van Kox). Her ji jimare (67 ta 75) jiyan û berhemên (9) Hunermendên Şêwekarên Kurd li ser astê cîhanê bi şêweyê gotarê ji aliyê (Fehmî Balayî) hatîne nivîsîn mîna: ('Ebidlrehman Kelhu, Behram Hacu, Welîd Sitî, Kurdayi ...)

H- Goşeya (Dîroka Îraqê ya Hevçerx): Sernivîserê Keprê bi (15) zincîreyan, anku di jimare (56 ta 70) bi şêweyê Gotarên Dîrokî, dîroka Kurdistanê û

peywendî û şoreşên wê digel hikumetên Îraqî yên gor bi gor nivîsîne. Mebest jî pê ewe da zaroyên Kurdan agehî ji dîroka xwe hebît û bizanît çu di navbera herêma kurdistanê û hikumetên cuda cuda yên Îraqêda rûdaye.

I- Goşeya (Werziş): goşeya navbirî ji aliyê Rojnamevanê Werzişî (Îhsan Hesen)ve ji jimare (43 ta 75) bi şêweyê gotarê hatiye berhevkirin, (33)Z jê hatîne belavkirin, goşeya navbirî ji çend stûnan pêkdihat mîna:

- Dîdara Keprê (27)Z.
- Yaryên Werzişî (16)Z.
- Yaneyên Kurdistanî û Cîhanî (27) Z.
- Yaryên Werzişî (16)Z.

Helbet zaroyan gelek dil li ser van core gotaran heye, çunkî zaro hez ji yarîkeran diken û dîsan hez ji yaryên werzişî diken, lewa gelek duvçûna deng û bas û suhbetên werzişî diken. Bi zêdekirina goşeya werzişî bo kovarê hez û daxwaziyên zaroyan jî pitir hatine binecihkirin çunkî werziş beşeke ji pêdviyên leşê zaroyan.

J- Goşeya (Tendurustî): (42) gotarên tendurustî ji aliyê (D.'Arif Hîtu)î hatîne nivîsîn û bi şêweyekê kurt û asan (42) babetên saxlemî bo zaroyan nivîsîne, anku her ji jimare (1 ta 42) ji aliyê (D.'Arif Hîtu) dihate berhevkirin û ji jimare (43 ta 75) ê jî ya berdewam bû belê ji aliyê kovarê bixove dihate berhevkirin, nimûnek li ser gotarên Kovara Kepir ji goşeya (Navdarên Kurd) li jêr navê:

(Nivîskarê Mezin : Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799- 1867)(173)

(Edebiyat bi şêweyekê giştî dû beşn: Helbest û Pexşan, Pexşan jî jibilî helbestê hemî corên dî yên nivîsînê bixove digirît. Mela Mehmûdê Bayezîdî yekem Çîroknivîsê Kurde ew li sala 1799 zayînî li devera Bayezîdê li

173 -Sernivîser, Ko.Kepir,J.(4), Çp. Wezaretî Perwerde, Hewlêr, Çirya Pêşiyê 2003, R.3.

Kurdistana Turkya ji daykbûye. Li gelek bajêran xwandiye û paşî bûye rêveberê qutabxana bajêrê xo. Mela Mehmûdê Bayezîdî yek ji zanayên serdemê xobûye, bi hevkarî digel Rojhelatnasê Ros (Eliksender Japa) gelek babet ji edebiyata fulklorê Kurdî tomarkrîne û parastîne. Mela Mehmûdê Bayezîdî gelek şakarên edebî yên giranbiha li paş xo hêlayine ji wan:

1- Çîroka Mem û Zîn.

2- Çîroka Leyl û Mecnûn. 3-

Çil Çîrok û Serhatî.

4- Siyamend û Şemsê. 5-

'Adat û Risumname.

Bayezîdî li sala (1867) zayînî çûye ber dilovaniya xudê.)

Her çende ev gotare baraptir bo wan zaroyan hatîne arastekirin yên jiyê wan diser (12) salyêda, çunkî zaroyên dibin jiyê (12) salyêda negehiştîne wê qunaxa jiyê xo van pêzanan werbigrin û têbigehin, lê şêwazê evan gotaran bi şêweyekê gişitî yê bi sanahî û kurte û peyv û zaravên wesa têde hatîne bikarînan ku zaro bi sanahî têbigehin.

## Helbest û Sirod

Jiber hebûna kêş û serwayê di Helbest û Sirodande ku awazeka xoş jê peydadibît û ramanên mezin têde hene jibo perwerdekirina derûnên zaroyan û germ û goriyekê di hest û nestên wande peydadiket, çu rojnamek yan kovareka zaroyan dernakevît eger Helbest yan Sirod têde nebin.

Berbelavtirîn goşeya rojnamevanî jî di Kovara Keprêda her goşeya Helbest û Sirodan bû, Helbest û Sirodên terr û nazik û pirî raman bi pênivîsên Helbestvanên navdar yên parêzgeha duhokê û bajêrên din yên Kurdistanê di vê kovarêde hatîne belavkirin. Her ji jimare (1 ta 75) goşeyeka

taybet bi navê (Stiran û Helbest) yan (Sirod û Helbest) hatiye belavkirin, anku (75) Z ji vê goşeyê hatîne belavkirin.

Sercemê wan Helbest û Sirodan yên di vê goşeyêda hatîne belavkirin (107) Helbest û Sirod bûn û bi vi rengî:

(32) Helbest yên Helbestvan (Muhemed Emîn Doskî).

(20) Helbest yên nivîsî û (2) yên wergêrayî yên Helbestvan (Mueyed Teyib).

(10) Helbest yên Helbestvan ( Remezan Îsma'îl Gereguhî).

(3) helbest yên helbestvanê kurdê mezn mamosta (Cigerxwîn).

(2) Helbest jî ji fulklorê Kurdî hatbûne wergirtin.

(38) Helbast yên helbestvanên cuda cuda bûn.

Babetên van helbestan (Neteweyî, Perwerdeyî, Helkevtin, Fêrkirin, Şîret û Huşyarî, Arastekirina Zaroyan w...) gelek babetên din bixweve girtîne, mîna vê helbestê:

(Qencî )[174]

Muhemed Emîn Doskî

Rojekê mêryeka zer Ji
malaxoçûbûder
Gehabû rex rîbarî
Bizav dikir li karî
Jiber lez û bizavê
Tehsî kevte avê
Pêla jî da dîv pêla
Dinavavêdahêla
Kutirekê dît û lezand

174 -Muhemmed Emîn Doskî, Ko.Kepir, J.(27), Çp. Wezaretî Perwerde, Hewlêr, Îlona (2005), R.13.

Çûyê û ji avê heland
Di nave ser kinarî
Paşî firda aqarî
Piştî borî heyamek
Mêryê dît nêçîrvanek
Yê hatiye wê dirê
Da bikujît wê kutrê
Dema tivenk dagirtî Li
kutirkê ragirtî
Mêryê kir xar û bezî
Gehiştê û pê wî gezî
Gava ew lê zivrî
Kutrê pê zanî û firî
Husa şîna qenciyê
Qencî kir wê mêryê

Babetê helbesta navbirî her ji navê wê bixwe diyare ku zaroyan fêrî rewiştekê çak û baş diket ewjî qenciye, anku dema kesek qenciyekê li kesekê din diket divêt ew kes jî beranberî wê başî û qenciyê her qenciyê biket, anku babtekê perwerdeye.

## Dîdar û Dan û Standina Rojnamevanî

Dan û Standina Rojnamevanî di çerxê 19 hatiye niyasîn, belê bi şêweyekê berçav û aşkera li destpêka çerxê 20 hatiye bikarînan, vî hunerî mebestên (Fêrkirin, Rewşenbîrkirin, Huşiyarkirin, Arastekirin, Ragehandin)ê hene.[175] Ev hunerê rojnamevanî biha û sengeka zêdetir di dete kovarê û zaroyan pitir bo aliyê xo radikêşît bi taybet demê dîdarên rojnamevanî di

175 -D.Macîde Lutfî Seyîd, Çavkaniya berê, S.227- 231.

gel wan kesatiyan bin yên ew gelek hez jêdiken û wekî çavlêker û pêşeng bo xwe dihijmêrin.

Her ji ber vê giringiyê Kovara Kepir jî ev hunere bikarînaye û goşeyeka taybet bi navê (Dîdara Keprê) vekir bû, (31) Z jê hatîne belavkirin, anku her ji jimare (1 ta 31) ya berdewam bû û her carê Dîdar û Dan û Standin digel kesatiyekê dikir. Kesatiyên dihatine helbijartin jî bara pitir yan zaroyên behremend û jîr û xudan Şiyan û şarezayî bûn, yan jî ew kesatî bûn yên mezin belê nêzî zaroyan bûn. wekî mînak li ser vî hunerê rojnamevanî ew dîdara digel ( Şehyan Tehsîn)[176] bêjera kenalê (K.TV) yê esmanî bi navê ( Şehyan Tehsîn .. Bêjereka Zîrek û Qutabyeka Serkevtî)[177] hatiye kirin, eve jî parçeke ji wê dan û standinê:

( Kulîlk li Buhara di pişkivin û behre jî di azadyê de û ew azadiya serhildanê berî dwazde salan gel xo înayi zemîne bo gelek behreyên resen xoşkir ku rêka xo veken û dahênanê di warên cuda cuda da biken. Yek ji wan behreyên eve çend salekin digel programên zarokan hatîne pêş û birastî bûye pêşkêşkereka dahêner û xudan şêwazekê taybet "Şehyane" ya ku di temenê dwazde saliya xoda dest bi pêşkêşkirina pirograman di televziyona setelayta kurdistanêda kirî û her ji roja êkê wek rojnamevaneka şareza û rehwan hate pêş, Şehyan Tehsîn li sala 1988 li Duhokê ji daykbûye. Li sala (2000) ê dest bi pêşkêşkirina pirograman di(K.TV) setelaytêde kiriye. Nuke qutabiyeka zîreke li pula çarê amadeyî û xewnên mezin hene ji bo paşerojê em hîvîdarîn hemî xewnên wê bi cihbihên. Ji bo ku em û hîn Şehyanê baştir nasbikeyn me ev dîdare digel kir.........)

## Alogurî Digel Xwandevanan

Kovara serkevtî ewe ku bikarît peywendiyeka baş û bihêz digel xwandevanên xwe peydabiket, û xwandevan bikarin hez û boçûn û hîvî û

---

176 - Nuke Bêjere li kenalê Rudaw yê Esmanî li Hewlêrê.

177- Ko.Kepir, J(3),ÇP. Wezaretî Perwerde. Hewlêr,Îluna sala (2003),R.11.

umêdên xwe bi rêka vê goşeyê derbibrin[178], lewa bo vê çendê Kovara Kepir çendîn goşe bi navên cuda terxanikrîne û êkem goşe belavkirî bi navê ( Postê Keprê)[179] bû û bivê nivîsînê destpêkirbû: ( Ev rûpele dê yê terxankirî bît ji bo ku em û hîn Dan û Standinê digel hev bikeyn û bersiva name û pirsyar û têbînyên we bideyn. Her di vî rûpelîde, dê cihê hindê jî hebît hînên hêja hizir û bîrên xo li ser kovarê û babetên dî yên girêdayî cîhana zaroka bin, belav biken, Kepir li benda name û pişikdaryên weye.)[180]

Ew jimareyên ku ev goşe têde hatiye belavkirin pêkhatîne ji jimarh (2 ta 6) û (57 ta 66) - bitenê jimare (61) têde nehatibû belavkirin – û jimare (67 ta 75), anku (23) Z vê goşeyê di kovara navbrîde hatîne belavkirin û jimareya wan xwandevanên pişikdarî têde kirî her ji zaroyan û mezinan jî bivî rengî bû: (169) babet, (62) Nîgar, (12) Futu. sercemê giştî yê hemî pişikdaryan divê goşeyêda dibine (243) pişikdar, eve bixwe jî jimareyeka başe bo goşekê bitenê. Êk ji wan postên Kovara Kepir di jimare (6)[181] de belavkrîn bi vî rengî hatbû xwar:

(Hevala hêja " Nîda Bîrî" di nameyeka ciwan û nazik de dibêjît: " Kovara Kepir cihê xo di dilê mezin û zarokan de kiriye û ew bo van çend hijmaran, şiyaye dilê hemî zarokan bi destxove bînit û hîvîdarîn ew çu caran nehête rawestandin jiber wê valahiyeka mezin pirkiriye di jiyana rewşenbîriya zarokên meda. Herwesa Kepir harîkareka mezine ji bo perwerde û fêrkirina zarokan ji bilî wê xoşiya zarok jê dibînin" Her di gel nameya xo ev helbesta ciwan û nazik jî kiriye diyarî):

kepra me
Ez dê rabim lezînim

---

178 - Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011. , S.138.

179 - Ko.Kepir, J.(2), ÇP. Wezaretî Perwerde, Hewlêr, Tebaxa 2003, R.17.

180 - Çbn.

181 - Ko.kepir, J.(6), ÇP. Wezaretî Perwerde. Hewlêr, Kanûna Biçûk (2003), R.17.

Gul û rîhana çînim
Hozanekê vehênm
Kepraxo pê xemlînim
Keprame ya hwane
Huner, zanist,zimane
Ew evîna dilane
Hevala zarokane
Bi jî bi jî kepra me Ewe
vîn û sebra me

Goşeya din ya Kovara Kepir ku bi rêka wê xwandevanên wê pişikdarî di gel kovarê di kir bi navê (Min Divêt – Di viya) bû. Di jimare (2 ta 31) ya berdewam bû, şêweyê vê goşeyê yê wesa bû ka zaroyan divêt li paşerojê bi bine çu? û mezinan jî ka di viya bibine çu? her jimarekê (4) zaro û (4) mezinan pişikdarî di vê goşeyêda di kir.

Paşî goşeyeka din bi navê( Zaro çi Di bêjin)(182) vebû, ev goşe di jimare (32 ta 42) û (66 ta 75) de ya berdewam bû, anku (21) Z jê hatîne belavkirin, di wan zincîreyande (166) zaroyan pişikdarî têde kiriye. şêweyê vê goşeyê yê wesa bû ku kovarê babetek wek prsiyar bo zaroyan pêşkêş dikr û zaroyan boçûna xwe li ser wî babetî diyardkr û babetên wê jî hemî reng bûn, wekî mînak:

Di jmare (40) ya goşeya (Zaro Çi Dibêjn)(183) ev babete bo zaroyan hatiye pêşkêşkirin ku babetekê perwerdeyî û rewşitiye:

182 - Ko.Kepir,J(32-42), sala(2006), J.(66-75), sala (2008-2009).
183 - Ko Kepir,J.(40), ÇP.Xnî, Duhok, Çirya Biçûk (2006), R 16.

( Eger tu Cuzdankeka tijî pare li ser rêka xo bibînî, dê çi key?) bersiv û pişikdaryên zaroyan jî bivî rengî bûn:

- Hêlan Serdar, 4 salî : ( Dê li xudanî wê gerim û eger min nedît dê demef êkê ji xo mezintir)

- Henan Ce'fer, 5 salî : ( Dê bo helgirim û paşî dê li xudanê wê gerim û parêt wî di deme vê. Eger min nedît dê bo helgirim heta dibînm.)

- Aras Hemîd, 8 salî : ( Dê li xudanê wê gerim û eger ne got ya mine, dê helgirim heta ku xudanî dibînim.)

- Nijyar Nêçîrvan, 10 salî : ( Dê hêlime li wêrê çunkî neya mine.)

- Cêgir Xisro, 11 salî : ( Dê helgirim û bime bingehekê Pulîsan.)

Herwesa goşeyeka din ya giring her di bwarê alogoriyê digel xwandevananda goşeya ( Nivîskarên Paşerojê) bû, 13 Z ji vê goşeyê di jimareyên (43 ta 56) da hatîne belavkirin – jimareya 49 têde nehatbû belavkirin – di vê goşeyêde ( 66 Babet, 19 Nîgar, 13 Foto) hatîne belavkirin û sercemê wan hemî pişikdariyên têde hatîne belavkirin (98) pişikdrî bûn û di zincîreya êkêda ku di jimare (43)de hatiye belavkirin kovarê ev têbîniye li serê rûpelî nivîsiye:

( Eve ji mêjeye, gelek xwandevanên me gaznda diken ku me çu cih di keprêda nedaye zarokan ku berhem û nivîsînên xo têde belavbiken. Bi rastî jî, gazndên wan di cihê xodane. Lewa me biryar da em van herdû rûpelên Keprê ji nivîsîn û dahênanên wanre bihêlîn hem wek handanek ji bo behreyên wan û hem jî ji bo dewlemendkirina Keprê. Kepir li benda berhem û nivîsînên weye û tikaye nav û temen – eger we bvêt – wêneyekê xo jî bikene di gelda û bigehîne me li Dezgeha Spîrêz.)[184]

êk ji pişikdaryên bo vê goşeyê hatîn ev babete bû:

---

184 - Ko.Kepir,J.(43), ÇP.Xanî, Kanûna Mezina sala 2007, R.26-27.

( Mirovî çend Komelêt Xînê hene?)[185]

1- Komela "A": Helgirê vî corî dişêt xîna komela "A", "O" werbigirît. 2- Komela "B": Helgirê vî corî dişêt xîna komela "B", "O" werbigrît.

3- Komela "AB": Helgirê vî corî di şêt xwîna komela "AB" û hemî komelêt dî werbigrît.

4- Komela "O": helgirê vî corî dikarît bitenê xîna komela "O" werbigrît.

Goşeyeka din bi navê ( Nivîsînên zarokên senterê Rewşen) û (Zarokên senterê Rewşen) di jimareyên (45 ta 56) de û her êk ji wan di (12) zincîreyande hatîne belavkirin û pêkdihat ji : (96 Babetan, 70 Nîgaran, 75 Fotuyan) û sercemê wan dibîte (241) pişikdarî.

Bergê berî dawiyê yê Kovara Kepir goşeyeka dî ya renga û reng û berdewam bi navê (Kulîlkên Keprê) hebû û her ji jimare ( 1 ta 75) ya berdewam bû û ya terxankirî bû ji bo wêneyên zaroyan û nav û temenê wan sercemê wan wêneyên têde hatîne belavkirin (1488) bûn û bvî rengî : Jimare (1-3) her jimarekê (16) wêne belavkribûn û jimare (4–75) her jimarekê (20) wêneyên zaroyan têde hatîne belavkirin.

Eger sercemê wan hemî babet û nivîsîn û nîgar û wêne û postên di van hemî goşeyên me li serî behskrîn kombikeyin dê bîte ( 2334) pişikdar, bi rastî eve bixwe jî jimareka mezine ku bitenê di (75) jimareyên kovarekêda û bi tenê di goşeya (Alogoryê digel Xwandevanan) de ev jimara pişikdaran hebît.

Bi rastî jî egerê serekî yê berbelavbûn û hêza Kovara Kepir her di van goşeyandane, çunkî ew dikarî pireka bihêz di navbera xwe û xwandevanên xweda durustbiket û bibîte egerê hindê ku xwandevan kovara navbrî bi kovara xwe nasbiken û bîr û boçûn û xewn û hîvyên xwe di wêrêda bibînin.

---

185 - Hîvî Îslam, Ç.b.n. R.26.

Her wekî me berî nuke jî amaje pêkirî ku êk ji egerên serekî yên helbijartina me bo vê kovarê wekî piraktîk di vê nameyêda her ev dewlemendiya wê bû.

## Berîkane û Pêşbazî

Her li destpêka derkevtina Kovara Kepir goşeyeka taybet bo berîkane û pêşbaziyê vekirbû, çunkî giringiya vî core hunerî di rojnamevaniya zaroyanda gelek giringiya xwe heye bo zaroyan, ji aliyekîve zaroyan bi kovarêve grêdidet û ji aliyekê dinve germ û goryekê dêxîte dinav zaroyande û ji aliyekê din pêzanîn û rewşenbîriyeka hemî layenî bo zaroyan dursutdiket her jiber vê yekê Kovara Kepir li jimara êkê û li berperê (12) goşeyek bi navê (Berîkane) ji berhevkirina ('Ebidlixaliq Sultan) vekir û bi vî rengî destpêkrbû: ( Berîkana keprê dê goşeyeka berdewam bît di kovara me de û her car dê me pênç pirsyar hebin û her pirsyarekê dê çar bersiv li jêr hêne nivîsîn ku êk ji wan ya duruste.)[186] Goşeya navbirî her ji jimare (1 ta 42) ya berdewam bû û xelatekê (15000) Dînarî bo serkevtyan dihate terxankirin, (42) Z jê hatîne belavkirin û di van zincîreyanda (174) pirsyarên giştî û hemî reng ( Edebî, Zanistî, Perwerdeyî, Hizrî, Cugrafî, Mêjûyî, Rewşenbîrya Giştî) têde hatîne belavkirin. Jimara dawiyê ku ev goşeye têde belavbûY jimare (42)[187] bû, pirsyarên berîkanê bi vî rengî bûn:

1- Êkemîn welat bi berhemînana Muzan kîjke? ( Îkwador, Wîlayetên Êkgirtî yên Emrîkî)

2- Dakar paytextê kîj dewletêye? ( Senîgal , Kamîrun)

3- Çend xîn di leşê mirovîda heye? ( Nêzîkî 5 lîtiran , Nêzîkî 10 lîtiran) 4- Çend mirov, heta nuke çûyne ser heyvê? ( 21 Mirov , 3 Mirov )

---

186 - Ko.Kepir, J.(1), ÇP. Wezaretî Perwerde, Hewlêr, Tîrmeha (2003), R.12.
187 - Ko Kepir, J.(4), ÇP. Wezaretî Perwerde, Hewlêr, Kanûna Biçûka sala 2006, R 18.

Zêdebarî goşeya (Berîkane) Kovara Kepir goşeyeka din jî bo heman mebest di rûpelên xweda bo zaroyan vekirbû bi navê ( Tiştê mino Tşto)[188] .Ev goşe her ji jimare (7 ta 75) ya berdewam bû, anku ( 69) Z jê derkevtîne û her carê pirsyarek bi şêweyekê edebî û ciwan û balkêş û bi serwa bo zaroyan hatiye arastekirin û li dawyê pirsyarê çend bersivek bo zaroyan helbijartîne û êk di nav wanda ya durust bû, mîna:

(Tiştê MinoTişto)[189]
Tiştîkê min tiştane
Berane û ne berane yê
spiye yan yê sore
Li ber destê hemyane
Yê bê şaxo û bê hirî Yê
bê deste û bê kurî
Gava wî serjê bikey Bi
her dû çava dê girî
Çi lê bêt wî nîne deng
Xîna wî jî nîne reng
Ey zarok bêje çiye
Hêşta nebûye direng
Berane yan jî qaze
Kulinde yan pîvaze

Her wekî berî nuke jî me xweyakirî evê goşeyê hem xweşî û hem pêzanîn bo zaroyan peydakirîne, çunkî pêşkêşkirina pêzanînan bi vî rengê asan û sivik û balkêş wel zaroyan diket ku vî şêwazî bo xwe bi xweştir û balkêştir ji peyrew û pertûkên qutabxaneyê û mamostayan bizanin, belkî

188 - Coreke ji Edebê Fulklorî yê kurdî û dihête naskirin bi (Mamik), Pirsyarên Hizrîne û bi Serwa dihêne gotin.
189 - Muhemmed Emîn Doskî, Ko.Kepir,J.(57),Çp. Xanî. Duhok, Adara (2008), R23.

mezinan jî mifa bo xwe jê wergirtiye. her prsiyareka vê goşeyê xelatekê (15000) dînarî bo serkevtiyê êkê dhate pêşkêş kirin.

## Çîrok

( Çîroka Vegêrayî): Ewe eva bara pitir nivîsîn bît û kêm wêne digelda dihêne danan. (Çîroka Wênedar): Ewe eva ku bara pitir wênebît û nivîsîneka kêm digelda bît van herdû corên çîrokê gelek kartêkirina xwe li ser zaroyan heye, çunkî bara pitir ew kesatî û qaremanên di çîrokanda dihêne bikarînan pêşeng û çavlêkerin bo zaroyan bi taybet ew çîrokên rûdan û babetên wan di dilrakêş û balkêş bin, dîsan Çîroka Wênedar hêşta karîgeryeka mezintir heye li ser zaroyan çunkî xoşiyê diêxîte dilê zaroyan û gelek pêdvî westyan û xwandinê naket, çunkî nivîsîn ya kême û barapitir wêneye û dibîte sînaryoyeka dilrakêş. Kovara Kepir rêjeyeka hejî di rûpelên xuda bo çîrokê terxankiriye mîna çîroka ( Folklorî – Biyanî û Xomalî, Wênedar , Wergêrayî, Çîroka Kevin ..) serhatiyan terxankiriye û bi vî rengî :

1- sercemê wan çîrokên di rûpelên (75) jmareyên keprêda hatîne belavkirin (165) çîrok bûn.

2- jvan çîrokan (57) çîrok di wênedar bûn, aniku nvîsîna kêm û wêneyên zor yan bi sînariyo û gelek ji wan çîrokan (2 ta 4) rûpel bixweve dgirtin , û (108) çîrok jî ewbûn yên ptir bi nvîsîn û kêm wêne dgelda û bara ptir rûpelek bixweve dgrt.

3-(52( Çîrok ji fulklorê biyanî ( Çînî, Hindî, Meksîkî, 'Umanî, Îranî, Swîdî...) hatîne wergirtin û wergêran,(113) çîrok ji nvîsînên nivîserên diyarkrî bûn mîna: (Liyonardo Davinşî, Liyo Tulistoî, Çibran Xelîl Cibran û ...).

4-(124( Çîrok ji aliyê Sernivîserê govarê (Mueyed Teyib) ve hatîne wergêran, (41) çîrokên din ji aliyê nivîserên din mîna : (Nizar Muhemed Se'îd, Hekîm 'Ebidlla, Evraz Hsên, Lulav Hirorî, Îsma'îl 'Elî, 'Ezzet Yûsuf û ......) hatîne wergêran.

Helbet jiber şêwaz û peyv û wêneyên rengîn û ciwan yên van çîrokan, kartêkirneka mezin li zaroyan kirîne û çav û dilên wan bo xwe rakêşayne û birîne di hizr û Xeyalên Aşopîda û di wan hizr û xeyalande zarok bûyne qareman û kesatyên çîrokan û tam xoşiyeka êkcar mezin jê wergirtiye. Ji çîrokên vegêrayî û têr nivîsîn û kêm wêne yên Kovara Keprê, çîroka:

( Çav )[190]

(Rojekê çavî gote hevalên xo, hestewerên dî: "Ez li pişt van dol û nehalan çyayekê bi mij û moranê dapoşî dibînm. Çend çyayekê ciwane!" Guhî, guhê xo dayê û paşî gotê: " Ka ew çyayê tu dibînî panê min guh lênîne!" Paşî destî got:" Hindî ez lê digerim, destê min vê nakevît û çu çiya li wêrê nînin!" Difnê jî gotê:" Ez tênagehim çewa çiyayek li wêrê hebît û ez neşêm bêhn bikemê, çu çiya li wêrê nînin" Hindî çav bû berê xo ji wan wergêra û didilê xoda kire kenî, hindî hestewerên dî jî bûn, kombûnek lidor vî babetî girêdan û piştî vekolîneka hûr bi tevaya dengan gotin:" Hebît nebît çav yê dîn bûy!")

## Pêkenîn û Mijulahiyên Keprê

Ji berku zaro hemî bi siroştê xwe hez ji tirane û pêkenîn û yaryan diken, lewa hemî rojname û govarên zaroyan û her çapemeniyeka peywendî bi zaroyanve hebît tirane û pêkenîn û girnijîn û mijûlahiyan di rûpelên xweda hembêzkrîne û her êkê jî navên cuda cuda bikarînanîne bo van goşeyan.[191]

Dîsan divêt wê jî bizanîn ku her kovareka hebît divêt hinek babetên hemî reng û xoş û dilveker têde hebin ku demê zaro kovarê di xînin, hinek goşe lê hebin bo wan bibne cihê bênvedanê û girnijîn bikevîte ser dev û

190 - Cubran Xelîl Cubran – Wer. Sernivîser, Ko. Kepir, J. (64) ÇP. Aras, Hewlêr, Çirya Biçûka (2008), R.28.

191 - Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, Esehafel Mutexesîse, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011, R.137.


lêvên wan, çend babetên van core goşeyan zêdetir bin zaro dilxoştir lê dihên.

Her bo vê merem û mebestê jî Kovara Keprê her di jimare (1 ta 75) de zaro û xwandevanên xwe ji girnijîn û pêkenîn û mijulahiyan bê behr nekirîne û goşeyên taybet û pirî pêzanîn û pêkenîn û mijulahî bo wan vekirîne û ji diyartirîn goşeyên vî hunerê rojnamevanî ku di Kovara Keprêda hatîne belavkirin bi vî rengî bûn:

- Girnijîn û Pêkenîn (244).
- Xaçe Rêz (53).
- Peyva Berze (24).
- Mijulahî (86).
- Em kîne?(198).
- Babetên hemî reng û cuda cuda (273).

Anku sercemê van babetan yên me amaje bi navê goşeya wan kirî digehîte (878) babetan.

## WÊNEYÊ ÇEND KOVAREKÊN ZAROYAN EVÊN PIŞTÎ SERHILDANA 1991 LI HERÊMA KURDISTANÊ DERKEVTÎN




KOVARA (ZENG Û BENG)




KOVARA (SIVORE)




**KOVARA (CIGERKOŞEKAN**)




**KOVARA (PEPÛLE)**




**KOVARA( XENDE)**




**KOVARA(KEPIR)**

# Encam

1- Têgeh û pênaseyeka êkgirtî û hevpişk ta nuke bo rojnamevaniya zaroyan nehatiye danan, belku her kesekê pênase kirî li pey taybetmendî û ew tiştê giring li dev wî pênasekiriye.

2- Destpêkirina derkevtina rojnamevaniya zaroyan li firensa bû û di navbera salên(1747-1791) de û paşî ji nû li emirîka û li welatên dîtir yên ewropî derkevt.

3- Li welatên derdurê herêma kurdistanê û bi taybetî yên 'Erebî bo cara êkê li sala 1870 li Misrê peydabûye û li 'Îraqê li sala 1922 derkevtiye û li kurdistanê jî li sala 1946 bi navê (girugalî mindalanî kurd) bû.

4- Pitiriya ewan kovarên li welatên derdorên kurdistanê derkevtîn giştî bûn û taybetmendî têda nebû û pitiriya wan jî rawestiyan.

5- Kawdanên siyasî kartêkirineka mezin hebû li ser bizava rojnamevaniya zaroyan li kurdistanê, belge li ser vê çendê rêjeya derkevtina wan kovarane evên li berî serhildana 1991 derkevtîn û piştî serhildanê.

6- Hunerên rojnamevaniya zaroyan bi taybetî: Çîrok, Wêne, Helbest û Sirod û Berîkane û Tirane û Dan û Standinên Rojnamevanî û Hunerên dîtir giringiyeka zêde li ser perwerde û rewşenbîrkirina zaroyan heye.

7- Kovara Kepir rolekê berçav hebû ji bû çandina hesta netewayetî li dev zaroyên kurd bi taybetî li bajêrê dihukê.

8- Kêmiya kesên taybetmend û bispor êk ji arîşeyên kovara kepir û kovarên dîtir yên kurdistanê bûn.

9- Kêşe û şiyanên diravî yên dezgehên ragehandinê egerekê serekî bûye ji bo rawestandina gelek kovarên zaroyan û kovara kepir jî êk ji wana bû

10- Ji aliyê hunerî û roxsarîve kovara kepir ya bê rikaber bû li herêma kurdisanê, û bi dîzayneka ciwan derkevt bû.

11- Kovara Kepir naveroeka hemi reng hebû û pitirya honerên rojnamevanî di rûpelên xweda hembêz kirîne mina: ( Gotar, Çîrok, Sirod û Helbest, Dîdar û Dan û Standin, Berîkane ….).

# LÎSTA ÇAVKANIYAN

A- PIRTÛK

'Ebdilfetah Ebu Me'al, Edebul Etfal -Dîrase We Tetibîq, Dar Şiruq Lîneşir wetewzî'a, ÇP2 ,Urdin, 1988.

'Ebdilfetah Ebu Me'al, Edebul-Etfal-Wesaîl Terbiyetîhîm We Te'lîmîhim We Tesqîfîhim, Dar Şiruq,Urdin 2005.

'Ebdilrehman Esseyd 'Ebdirezzaq, *Keyfe Tuhebibinel-Qîrae LîTiflîkî*, Mweseset Îqre Lînneşir We-Tewzî' We-Terceme, Qahîre, 2010.

Ebdilrezaq 'Elî Hîtî, *Esehafel Mutexesîse*, Dar Usame lînneşir we-Tewzî', 'Uman, Urdin 2011.

Ehmed Seyîd 'Elî Berizincî, *Edebî Mindalan le Kovarî Gelawêjda*, Raman j:17, Dezgayi Roşnbîrî û Rageyandinî Gulan, Hewlêr, 1997.

Ehmedê Xanî, heqeqehu we elleqe eleyhî weqeddeme lehu Hemdî Ebdilmecîd Selefî, *Nubihara Biçûkan* Ç.1,Çp Reşîd, Bexdad,1990,R-11.

'Eumer Ehmed Talib, *Edebul-Etfal fîl 'Îraq*, Dar Seqafetul-Etfal, Sîlsîlet Dîrasat,Bexdad,1989.

Fazil 'Ebbasul Ke'bî, *El-Medaxiul Terbewiye We Murtekezat E-Tecanus El-Me'rîfî fî Seqafetul-Etfal*,Çp.1, Bexda,1999.

Fethiye Hesen Silêman, *Terbiyetul Tifil Beynel-Mazî wel-Hazir*,ÇP.Dar -Şiruq, Qahîre,1979.

Fîlîb Buşar, *Cimhurul-Etfal*, T.Muhemed Enwer Henawî, Dar El-Kîtab,Misir,1953.

Hadî Nu'man Hîtî, *Edebul Etfal-Felsefetuhu- Finunuhu -Wesaîtuhu*, ÇP.Dar Al-Huriye lîltîbae, bexda, 1977.

Heme Kerîm Hewramî, Edebî Mindalanî Kurd diway Raperîn – Lêkolînewe –Nirxandin- Mîkanîzimekan, Çp.Dezgayi Aras,B.Duwem, Hewlêr, 2007.

Heme Salih Ferhadî, *Le Barey Rojnamenûsî Kurdiyewe*, Ç.êkê ,ÇP rojhelat , Hewlêr,2011.

Hesen Şehate, Edebul-Tifilil -'Erebî – Dîrasat We Buhus,. Dar El-Misriye Lubnaniye, ÇP- elfeniye, Qahîre, 1994.

Îbrahîm Îmam, *Dîrasatun fîl-Feni Suhufî*, Mektebet Înclu El-Misriye, Qahîre,1971.

Îsa Aşemmasî, *El-Qîsel tifliye Fî Surye, Wezaret Eseqafe*, Dîmeşq,1996.

Îsma'îl Îbrahîm Se'îd, *Edebî Rojnamenûsî Kurdî*, Bexda 1970-1974.

Kemal Xembar, *Çîrok bo Mindalan – le 'Erebiyewe krdûyetî be Kurdî*, Çp.hezare, Bexda,1980.

Kîmbirlî Rînoldiz, T.Yasir Hesen, *Edebul Etfal*, Hindawî Lîl-Telîm Welseqafe,Misir,2012.

Kovan Ehmed, *Bîblografiya Ko.Zeng û Beng*, J.(1-100), ÇP. Azadî, duhok,2011.

Macîde Lutfî Seyd, *Teqeniyetul-Î'alamu-Terbewî We-Te'lîmî*, Dar Usame lîl-Neşir Wel-Tewzî,Urdin,2011.

Mêrvet Kamil Eterabîşî, *Medxel Îla Sehafetul-Etfal*,Ç.1, Darul-Fikr El-'Erebî,qahîre,Misir 2003.

Mîftah Muhemed Diyab, *Muqedîme fî Seqafet we Edebul Etfal*, Dar El-Dewliye lîl-Neşir wel-tewzî'a, Misir,1995.

Muhemed 'Ebdilrezaq Îbrahîm, - Hanî Muhemed Yunis - Wehîd Elseyd hafiz, *Seqafetul tifil*,Ç êkê ÇP.Dar El-Fîkir,Urdin, 2004.

Muhemed El-Hedîdî, *Îstixdamat Mecelatull-Etfal, Dîrase Cam'eye*, 1977.

Muhemed Reşîd Fetah, *Edebî Minalan û Nimune lêkolînewe le Edebî Minalanî Kurd*,ÇP. Raperîn, Silêmanî.1974.

Musedeq Tovî, *Çend Berperek ji Dîroka Rojnamevaniya Kurdî*, ÇP. Kulîja Şerî'ê, duhok,1999.

Necîb Geylanî, *Edebul-Atfal fî Zewîl-Îslam*, Mweseset El-Rîsale, Beyrut,1996.

Sare Xalid Leysî, *Sehafetul -Etfal (Mefhum-Neşe-Enwa'e- Wezaîf- Tehrîr -Îxrac)*,Zankoya Seyût, Kuliyet EL-Adab-Qisimul-Îalam ,Misir,2011.

Semer Ruhî Feysel, *Edebul Etfal We Seqafetuhum- Qîrae Neqdiye*, , Îtîhadul-Kutab El-'Ereb, Dîmeşq,1998.

Şu'eyb xebaşî, *Sehafetul-Etfal fîl Wetenul 'Erebî*, ÇP. Al'alem El'Erebî, Al-Qahîre, 2002.

Wefa Îbrahîm, *El-We'îl-Cemalî 'Înde Tifil*, Mektebet Iskenderiye, Misir,1997.

Ye'qûb Eşarûnî, *Edebul-Etfal, Finun We 'îlim*, Dîrase qudîmet fî Me'rez Şarîqe lîl-Kîtab, 2013.

B- Teze:

Ainud Seaîd Salih, *Faaliyet Îstîxdam Qîsesul Etfal kemesder Lîteabîrul Fenî fî Tenmiyet Meharatu Tefkîrul Îbdaî leda Tifil qeblel Medrese*, Nameya Mastrê, zanîngeha Umul Qura, Saudiye,2007

Bin Mesad Qedur, *Edebul Atfal-Dîrasetun fîl-Mezamîn Ecemaliye*, Rîsalet Diktora,Kuliyet Adab-Qisim E-Luxel Erebiye, Cezaîr, 2-15-2016.

Edulsemed Îslam Taha Doskî, *Rengdanewey Edeb le Govarî Hawar da 1932-1943*, Namey Master, Kolîjî Edab, Zankoy Selahddîn- Hewlêr, 2001.

Îdrîs 'Ebdula Mistefa, *Rojnamegerî Mindalan be zimanî kurdî*,ÇP-1, Çp-Roşinbîrî,Hewlêr,2004.

Muhsin 'Arif Salih, *Çîroka Zarokan Li Devera Behdînan(1980-2004)*,Nameya Masterê, Kulîja Edabê, Zanîngeha duhokê, Duhok,2007,bp139.

Tariq El-Bikrî, *Mecelatul Etfal we dewruha fî Bîna Eşexsiyel Îslamiye*, Nameya Dikturayê, naşirî, 2003.

Xalîde Qadir Ferec, *Çîrokî Mindalan le Edebî Kurdîda,1970-1990*,Namey Macistêr,2012.

Zehra Xirnawt, *Suret Etifil fîl Qîsel Qesîrel Cezaîriyel Mu'asîre (1980-2010)*- nameya masterê, 2012-2013.

**E- KOVAR**

Ko.Kepir, J.(1- 75), Çp.Wezaretî Perwerde,Hewlêr,Sala(2003 - 2009).

Huda Ne'met Hemed, *Wesaêt Edebul Etfal*, Ko.(Edabul Ferahîdî),J(11), xizîrana 2012.

Ehmed Seyîd 'Elî Berizincî, *Edebî Mindalan le Ko.Gelawêjda*,j:17, Dezgayi roşnbîrî

Ko. *Rojnamenûs*, J(2) Hewlêr, sala 2004.

Ko. *Pepûle*, J(25)Çp.Ufêstî Dilêr,Silêmanî, Çiriya dwê,1999.

Ko. *Ciger Koşekan*, ,J(41) ÇP.Wezaretî Perwerde, Silêmanî, Kanûna dwê, sala 1999.

Ko. Xende, J (2), Silêmanî, Adara 2002.
Ko. Zeng û Beng, J.(1),Çp. Wezaretî Perwerde. Hewlêr,Îluna 2001.
Ko. (Zeng û Beng), J(163),Çp.Hwar, Duhok ,Aba 2017.
Leyla Hesen, Ko.Zeng û Beng, J.(138), Çp.Hwar, Duhok ,Tîrmeha 2015.
'Ebdî Muhemed 'Elî, Ko.Sivure, J.(30),Çp.Xanî,Duhok,Kanûna duwê,sala 2001.
Bawan 'Elî, Ko .Zeng û Beng, J.(17), Çp. Wezaretî Perwerde.Hewlêr, Şubata 2003.
Rêbwar Alanî, Ko .Pepûle, J.(35),Çp. Ufêstî Dlêr, Silêmanî, Eylûla 2000.
Ehmed Nizurî, Ko.Zeng û Beng,jimara (139),Çp.Hwar,Duhok,Tebaxa 2015.
Wr. bi Destkarî-Erselan Hesen, Ko.(Pepûle), j(43) Çp.Ufêstî Dlêr,Silêmanî ,maysa 2001.
Wr.Cîhan 'Umer, Ko.(Cigerkoşekan), j(64) Silêmanî, kanûna êkê, 2000.
'Umer Duhokî,Çîroka (Hevalên Şkeftê),Ko.(Zeng û Beng),j(150), Çp.Hwar,Duhok Tîrmeha 2016.
Ko.(Pepûle),J.(48), Çp.Ufêstî Dlêr, Silêmanî,Çirya êkê sala 2001.
Awat Nesreddîn, Ko.(Pepûle), j(48), Çp.Ufêstî Dlêr, Silêmanî, Çiriya êkê, sala 2001.
Îdrîs Ebdulla, Girugalî Minalanî kurd,Pêşenge kovarî Dinyay rojnamegerî mindalan, Govarî Rojnamenûs, j 11-12, Hewlêr 2003.
Refîq Salih Ehmed, E.Z, Raberî Rojnamenûsî Kurdî, Ko.Rojnamenûs, J 11-12, Hewlêr 2003.
Ro.Resen, j.(50) Çp. Xebat, Duhok,Dûşembî 24-11-1997.
Rafid Salim Serhan, Edeb Eletifal fî El-'Alem El-'Erebî- Mefhumehu- .Neşetehu- Enwa'ehu We Tetewirehu, Mecelet Elteqenî, B.26, J.6 ,sala 2013.
Sena Celal 'Ebilrehman, *Waqî' Sehafet El-Etifal we Dewruha El-Me'rîfî fî El-'Alem El-'Erebî* – Dîrase Tehlîliye, Mucelet El- Adab Wel-'Alum elîctîma'iye.
Farûq Sellum,*Alşîar wel Atfal*, Ko Al Seqafe Al Ecnebiye, J.3, 1985.
Ko.El-Zewra, J(6597)Bexdad,19 Tîrmeha 2017.

## C- MALPERÊN ENTIRNÊTÊ


Malpera:Dîwan 'Ereb,*Cemîl Hemdawî*, Edebul Etfal fîl 'Îraq,dîroka rageheştinê 26/8/2009.

Malpera:Dîwanul-'Ereb, *Hemîd Tulist*, Sehafet Esîxar eletî yuherîruhal kîbar , 3-6-2013.

www.hawpshti.com, dîroka rageheştinê 11-4-2015.

Malpera: Masress.com, dîroka rageheştinê 27-11-2011.

Malpera: Muntedeyat star taymz, dîroka rageheştinê 12-1-2010.

Malpera: Meqalat Îslam wêb.nêt. (www.islamweb.net) dîroka rageheştinê 27-11-2008.

Malpera:Muntedel-Î'lam Eterbewî, dîroka rageheştinê 13-9-2011

Malpera: Mewsû'et Ete'lîm Wetedrîb, Muna Se'dî, dîroka rageheştinê 2-12-2009.

Malpera:Nun Post, *Sara Leysî*, Ehimiyet Suhuful-Etfal fîl Tenşiye Eterbewiye Weseqafiye, Gotarên, dîroka rageheştinê 3-10-2015.

Malpera: Rabîtet Udeba Eşam,18-Kanûna êkê, dîroka rageheştinê 2004.


## ***D- Didar û Çavpêkevtin:***


Dîdareka Taybet digel (*Dr.Dîwalî Hacî*),Êkem Sernivîserê Ko.Zeng û Beng li roja duşembî 5-6-2017.

Dîdareka Taybet di gel (Dilvîn 'Ebdlixaliq) SernIvîsera niha ya Ko.zeng wbeng li roja pênc şembi 15-6-2017.

Didareka Taybet digel Helbestvan (Mihemed Salih Hecî) li Roja Sêşembi 16- 8-2017.

Dîdareka Taybet digel Helbestvan (Mihemed Emîn Doskî) li Roja Pênç Şembî (17-8-2017).